

**K.T.**  
**ZANÎNGEHA BÎNGOLÊ**  
**ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ**  
**ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Ê EDEBIYATA KURDÎ**



**(TEZA MASTERÊ)**

**ÎMAJ DI ŞI'RA FÊRÎKÊ ÊSIV DA**

**Mem ARTEMÊT**

**171302101**

**Şewirmendê Tezê**

**Doç. Dr. M. Zahir Ertekin**

**ÇEWLÎG-2020**

**T.C.**  
**BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ**  
**YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ**  
**KÜRT DİLİ VE EDEBİYATI ANABİLİM DALI**



**(YÜKSEK LİSANS TEZİ)**

**FÊRÎKÊ ÛSIV'IN ŞİİRLERİNDE İMAJ**

**Mem ARTEMÊT**

**171302101**

**Tez Danışmanı**

**Doç. Dr. M. Zahir ERTEKİN**

**BİNGÖL-2020**

**BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ**  
**YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE**


*Mem ARTEMÊT* tarafından hazırlanan *Îmaj di Şi'ra Fêrikê Ûsiv da (Fêrikê ÛSIV'ın Şiirlerinde Îmaj)* başlıklı bu çalışma, 24.02.2020 tarihinde yapılan tez savunma sınavı sonucunda [oybirliği ile/ oy çokluğu ile] başarılı/başarısız bulunarak jürimiz tarafından [Kürt Dili ve Edebiyatı] Anabilim Dalı'nda Yüksek Lisans tezi olarak kabul edilmiştir.

**Tez Jürisi Üveleri (Unvanı, Adı ve Soyadı)**

**Başkan** : Doç. Dr. Mustafa ASLAN  
**Danışman** : Doç. Dr. Mehmet Zahir ERTEKİN  
**Üye** : Dr. Öğr. Üyesi Hemin OMAR AHMAD

İmza: 

İmza: 

İmza: 

**ONAY**

Bu Tez, Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Yönetim Kurulunun ...../...../ 2020 tarih ve ..... sayılı oturumunda belirlenen jüri tarafından kabul edilmiştir.

Doç. Dr. Abdulnasır SÛT  
Enstitü Müdürü

## KURTEBÊJE

**C.** : cild

**Çev.** : çeviren

**H.b.** : heman berhem

**Hwd.** : her wekî din

**J.** : jimar

**R.** : rûpel

**Wer.** : wergêr

## KURTE

Helbest ji hestên însanan pêk tê ku ji kevneserdeman heta îro hukmî cîhana me ya edebî dike. Di edebîyatê da jî meriv dikare helbestê weke perçeyê herî heyatî yê vê qadê bihesibîne. Îmaj ew têgeh e ku rism an jî tabloya ku di hişê me da disêwire bi telaşeka estetîk li ser mehsûlekê teşe bigire. Îmaj di edebîyatê da zêdetir bi rêya helbestê hebûnekê bi dest dixe. Di pêkhatina îmajê da raçavîyên helbestvan ên cîhana derveyî, hestîyarîya wî ya hunermendî, cehda wî ya bedewkar, hêza wî ya xîyalî, nasnameya wî ya edebî û xalên bi vî rengî hukmê dikan.

Fêrîkê Ûsiv helbestvanekî kurd ê edebîyata modern a Kafkasyayê ye ku berhemên baş tevî parta edebîyata kurdî kirîye û helbestên wî ji hêla îmajê va serkeftî ne ku bûye mijara teza me. Me jî di vê xebatê da hewl da ku pêwendîya xurt a îmaj û helbestê nîşan bidin û analîz û şîroveya helbestên Fêrîkê Ûsiv bikin.

**Miftepeyv:** Îmaj, Helbest, Fêrîkê Ûsiv, Edebîyata Kurdî ya Modern, Kafkasya, Kurdî

## ÖZET

Şiir ilk çağlardan bugüne değin edebi dünyamıza hükmeden insan duygularının aynasıdır. Edebiyatta da şiiri bu alanın en hayati parçası sayabiliriz. İmge kafamızda tasarlanan tablo veya resmin estetik bir gayretle bir mahsülde can bulmasıdır. İmge edebiyatta genellikle şiir yoluyla var oluyor. İmgenin oluşumunda şairin dış dünya gözlemleri, sanatsal duyarlılığı, estetik kaygısı, hayal gücü, edebi kimliği ve benzeri faktörler etkindir.

Fêrîkê Ûsiv, Kafkasya Modern Kürt Edebiyatının kürt şairlerinden olup kürt edebiyatına iyi eserler katmış ve şiirleri imge açısından oldukça başarılıdır ki tezimizin konusu olmuştur. Biz de bu çalışmamızda şiirle imgenin sağlam bağını göstermek ve Fêrîkê Ûsiv'in şiirlerinin yorum ve analizlerini yapmak istedik.

**Anahtar Sözcükler:** İmge, Şiir, Fêrîkê Ûsiv, Modern Kürt Edebiyatı, Kafkasya, Kürtçe

## ABSTRACT

Poetry is the mirror of human emotions that ruled our literary world from the early ages to the present. In literature, this is an unquestionable fact and we can say that poetry is the most vital part of this field. The image designed in our heads is that the painting or picture comes to life in an aesthetic flurry. In literature, the image usually exists through poetry. The external world observations of the poet, artistic sensitivity, aesthetic anxiety, imagination, literary identity and similar factors are factors in the formation of the image.

Fêrîkê Ûsiv is one of the Kurdish poets of the Caucasian Modern Kurdish Literature and has added good works to the Kurdish literature and his poems are very successful in terms of image, which has been the subject of our thesis. In this study, we wanted to show the firm connection of the image with poetry, to determine the relationship between the image and the literary arts and to interpret and analyze the poems of Fêrîkê Ûsiv.

**Keywords:** Image, Poem, Fêrîkê Ûsiv, Modern Kurdish Literature, Kafkasya, Kurdish

## PÊŞGOTIN

Di edebîyata klasîk û modern da -nemaze di helbesta modern û klasîk da- îmaj meseleyeka pêewle ye ku meriv pişta xwe lê qayîm dike. Îmaja ku bi qasî helbestê ji “kevn”îyê ra kapan diavêje van salên axirîyê bi xebatên cihêreng va serincê radikêşe ser xwe. Îmaja ku weke fotografa zêhnî û sêwrê jî tê zanînê rewşa kamilîyê ye û di helbestan da bûye nuqtêya herî heyatî. Îmaja ku ji hunerên edebî dizê herqa wateya kûr û xeyalbexşîyê ye. Veçirîna îmajê karê rexneya poetîk e ku ragorî endîşeya estetîk dikeve û sîwaxa helbesta çak î bala li dîwarê kelama xas dixê. Fêrîkê Ûsiv jî bi fehma xwe ya çê û feraseta xwe ya estetîkhewîner lêgerê bêjeya nemir bûye. Poetîkaya berz ku ji wî maye ji peyrewên destana kurdî û kurmancî ra tacek e ku ji zêr û zîvan balatir e. Ev xebat lê taqet dike ku berhemên Fêrîkê Ûsiv ên bi navê *Hesretdefter*, *Sûretsûfe* û *Êvara Zivistanê* ji hêla îmajê va vekole û analîz û veçirîna wê bike. Berhemên Fêrîkê Ûsiv da xala sereke ya ku me eleqedar dike helbest e. Di van berhemên berbehs da destan û laqirdî jî hebûn lê me ew cureyana nekirine nava xebata xwe.

Xebatên îmajê di edebîyata kurmancî da gelek kêr in. Vê rewşê jî weke astengîyekê qada xebata me teng dikir. Her çiqas pirtûkên tirkî yê li ser îmajê pir bûn jî gelekên wan di tirkî da tekerê da pêkolî dikirin. Bi vî awayî ev xebat di kurmancî da dibe yek ji wan xebatên ewil ên li ser îmajê. Gumana me jê ew e ku sewa xebatên li ser vê babetê bibe rêzeçavkanîyek û qencîya wê bigihîje edebîyata kurdi.

Di serî da ez spasîyên xwe pêşkêşî mamosteyê xwe yê hêja Doç. Dr. Mehmet Zahir Ertekin dikim ku him mamosteyê min ê lîsansê ye û him jî şewirmendê min ê masterê ye, wî ji destpêkê heta dawiyê bi her awayî alîkarîya min kir, rê û rêbaz nîşanî min da û bi fikrên xwe firsend da min ku ez vê xebatê bikemilînim û bi per û bask bikim. Her wiha Mamosteyê min ê qedirgiran Ömer Delikaya jî bi xwendin û rastkirinê û bi fikrên xwe cebirîna vê tezê da kedeka zehf mezin daye, heta ku ev xebat qedîya sîya wî li ser min bû. Spasîyeka taybet jî deyndarî mamoste Mustafa Aslan û Hêmin Omar Xoşnaw im ku jûrîyên tezê bûn û bi pêşnîyaz û sererastkirinên wan va min gelek kêmasîyên tezê kifş kirin û edilandin. Dîsa kekê Roger Acun her tim derê xwe vekirî hîşt ku pirsên di serê min da zelal bin. Di dîtina çavkanîyan da Mewlûd Oguz alîkarîya min kir û di xwendinê da kekê Şehmus Kurt û hevalên min



ên malê Dilêr Serhed û Cîhat Aşkan jî muxlaqîyên tezê ron kirin. Her wiha divê ez malovanîya wan ji bîr nekim û qayîlbûna xwe bidime malbata Fêrikê Ûsiv û mala birazîyê wî Apê Sêvdîn û kulfetê mala wî ku di sala 2017an da ez li gundê Pampê ezimandim. Herî dawî divê ez însafa xwe neşewitînim û razîbûna xwe bidime hevala xwe Hayal Yildizê ku alîkarîya wê firsend da min ku ez xebata xwe bibime sêrî. Ez spasîyên xwe pêşkêşî wan hemûyan dikim.

Helbet deynê uskura me ye ku em spasîya wan kesan bikin ku me navên wan nenivîsîne lê bi ked û dema xwe piştgirî dane û beşdarî vê xebatê bûne.

## NAVEROK

KURTEBÊJE .....	I
KURTE .....	II
ÖZET.....	III
ABSTRACT .....	IV
PÊŞGOTIN .....	V
DESTPÊK .....	1
BEŞA YEKEM .....	5
HELBESTA KURDÎ YA KAFKASYAYÊ Û HELBESTVANÊN WÊ SERDEMÊ.....	5
1.1. Helbestvanên Kafkasyayê yên Xwedîberhem.....	7
1.1.1. Fêrîkê Ûsiv .....	8
1.1.1.2. Berhemên Wî.....	9
1.1.2. Nûrî Hîzanî (Hovakîm Margaryan) (1896-?) .....	10
1.1.3. Etarê Şero .....	10
1.1.4. Emînê Evdal (1906-1964) .....	10
1.1.5. Aramê Çaçan (Xûdoyan).....	11
1.1.6. Casimê Celîl (1908-1998).....	11
1.1.7. Ûsivê Beko (1909-1969).....	11
1.1.8. Wezîrê Nadirî (1911-1946) .....	12
1.1.9. Qaçaxê Mirad (1914-1979) .....	12
1.1.10. Mîroyê Esed (1919-2008).....	13
1.1.11. Elîyê Evdilrehman (1920-1994) .....	13
1.1.12. Taharê Têcir Biroyêv (1923-...) .....	13
1.1.13. Sihîdê Îbo (1924-1991).....	14
1.1.14. Mîkayêlê Reşîd (1925-1985).....	14
1.1.15. Ezîzê Îsko (1927-2005).....	15
1.1.16. Şikoyê Hesên (1928-1975) .....	15
1.1.17. Simoyê Şemo (1928-2000) .....	16
1.1.18. Karlênê Çaçanî (1929-2012) .....	16
1.1.19. Cerdoyê Esed (1929-1993).....	17
1.1.20. Rizalîyê Reşîd (1929-1998).....	17
1.1.21. Şamîl Esgerov (1929-2005).....	17

1.1.22. Keremê Anqosî (1937-...)	18
1.1.23. Barîyê Bala (1937-)	19
1.1.24. Eskerê Boyîk (1941-...)	19
1.1.25. Tosinê Reşîd (1941-...)	20
1.1.26. Ezîzê Gerdenzerî (1945-...)	21
1.1.27. Mirazê Cemal (1945-...)	21
1.1.28. Babayê Keleş (1948-2014)	22
1.1.29. Elîxanê Memê (1948-2016)	22
1.1.30. Ezîzê Cewo Mamoyan (1949-...)	22
1.1.31. Hesenê Hecîsilêman (1951-2015)	23
1.1.32. Çerkezê Reş (1955-2008)	23
1.1.33. Pirîskê Mihoyî (1958-...)	24
1.3. Helbestvanên ku helbestên wan di kovar û rojnameyan da weşîyane	24
1.3.1. Ehmedê Mirazî (1899-1961)	25
1.3.1. Baxçoyê Îsko (1912-1987)	25
1.3.1. Egîtê Qadirî (1928-1996)	25
1.3.1. Mecîtê Silêman (1932-2018)	25
1.3.1. Egîtê Şemsî (1933-2002)	26
1.3.1. Ahmedê Gogê (1937-2003)	26
1.3.1. Vanîkê Elîxan (1942-...)	26
1.3.1. Îşxanê Eslan (1947-...)	27
1.3.2. Cemalê Ûsiv (1956-...)	27
<b>BEŞA DUYEM</b>	<b>28</b>
<b>ÇARÇOVEYA TEORÎK Î PAŞXANE: ÎMAJ Î HELBEST</b>	<b>28</b>
2.1. Helbest	28
2.2. Pênaseya Îmajê	37
2.2.1. Merheleyên Çêbûna Îmajan	48
2.2.2. Cureyên Îmajê	49
2.2.3. Çend Dîtinên li ser Teorîya Îmajê	50
1.1.1.1. Poetîkaya Wî	54
<b>BEŞA SÊYEM</b>	<b>59</b>
<b>CÛREYÊN ÎMAJÊ DI HELBESTA FÊRÎKÊ ÛSIV DA</b>	<b>59</b>
3.1. Îmajên Evînê	60
3.2. Îmajên Sirûştê	64

3.3. Îmajên Xerîbî û Hesretê .....	73
3.4. Îmajên Tenêtî û Êxtîyarîyê.....	79
3.5. Îmajên Derengmayînê.....	83
3.6. Îmajên Wetenîyê.....	87
3.7. Îmajên Mirinê.....	99
3.8. Îmajên Qerfî/Mîzahî .....	107
3.9. Îmajên Erotîk .....	109
3.10. Îmajên Zordestî û Dijkolonyal.....	112
3.11. Îmajên Polîtîk û Azadîyê .....	118
ENCAM.....	120
ÇAVKANÎ.....	123
PÊVEK.....	127

## DESTPÊK

Meriv bi serê xwe mekanîzmayeka zindî, guherbar û fikirîner e. Ji ber taybetmendîya xwe ya tebi'î xwedîyê hestan e û hestên ku di însanan da peyda dibin dişibine hev. Li ku dera dinê û kîjan serdemê dibe bila bibe hezkirin, bêrîkirin, girîn, şîn, dexesî, nefret û merhemet wekî hev in. Gelekî normal e ku derçûyîna van hestan cuda be lê di esasê xwe da weke nav û hîs ev têgeh heman tişt in. Di edebîyat an jî hunerê da jî gelekî normal e ku ev hestên ku binyada wan eynî ye bi îmaj û derçûyînên cuda li ser berhemekê teşe bigirin. Ev îfadeyên ku li jorê behsa mijara me bûn bi wê estetîk û cuwankarîya ku di hunermend an jî nivîskar da mewcûd e, ji nû va teşe digirin û xwîner arasteyî fikirînên kûr dikin.

Weke ihtîyaceka xwezaya xwe însan her tim di lêgerînekê da ye. Di destpêka mirovatîyê heta niha gelek tişt bi destê însanan çêbûne û çêdibin. Qabilîyet û fehm û feraseta însanan di vê roja ku em lê dijîn da meriv heyrê dihêle. Însanan di wan kêmdarfetan da çawa ew avahîyên endezyarîk ên bêhempa çêkirine, çawa ew bizavên felsefeyê zil dane, çawa fikrên ku îro jî derbasdar in welidîne, ew birc, kela, xan, seray û pîramîd ava kirine ku îro jî bi vê teknolojîya nûwaze ya berdest va jî nayêne çêkirinê? Çawa ew berhemên estetîk, rismên ku texeyûla merivî diderizîne û li hember kêmdimîne, vegotinên biheybet, fikirînên kûr ku hejekê li merivî dixe û gelek tiştên din der çûne? Axir pirsê me bersiva me jî dihewîne; hiş û lêgerîn û meraq. Van xalana derî li berhemên ezamet vekirine. Helbet qesta me ya ji berheman her tişt e, tablo an jî şî'êrek, peykereka antîk an jî romanek...

Îmaj wekî derçûna xîreta estetîk di qadên psîkolojî, huner û edebîyatê da xwedîyê cihekî qewî ye. Her qad li gorî pêwendîya xwe nêzî mijarê dibe û di axirîyê da destlêdan û encamên eleqedar derdikevine holê. Îmaja ku ji serdemên ewil heta îro bûye yek ji meseleyên edebîyatê di xwe da orjînalîte û hewla bedewîyê disitirîne. Xebata me jî xebateke edebî ye ku tê da hewla pêhesîn, eşkerekirin û veçirîna îmajên helbesta Fêrîk Ûsiv heye. Em ê di vê xebatê da li ser teorîya îmajê, pêwendîya xurt a îmaj û helbestê û îmajên sereke yên helbesta Fêrîkê Ûsiv bisekinin.

## **Mijara Tezê**

Merema eslî ya vê xebatê peydakirina îmajên helbesta Fêrîkê Ûsiv e ku di edeb û kelama kurdî da navekî eşkere ye, nola ku em jî haj pê hene hêma, metafor, hunerên edebî û bi taybetî îmaj dihêlin ku helbest wesfa helbestbûnê bigire. Di dîroka peydabûn û geşedana helbestê da helbestvanan her tim xwe di nav lêgerîna şayîkkirin û rewankirina helbestê da dîtine û cehdîyane ku di form û qalibên berteng da îzah û rawekirinên berfireh pêşkêş bikin. Hunerên edebî ku di klasîkan da tesele dibû îro-ro bi temamî nebe jî cihê xwe daye îmajan. Şik tê da tune ye ku îmaj qadeka berfireh e ku xwe dispêre hemû ezayên sehekî. Helbestvanên ku bi zanist û teknîka îmaj û helbestê hesîyane bi vê ferasetê hewl dane ku helbesta xwe binemirînin û qedrê qelema xwe bidine zanînê. Fêrîkê Ûsiv di edebîyata kurdî da derî li gelek îmajên resen vekirîye û bi feraseta xwe ya zanyarî û teknîkî îmaja helbesta kurdî û ya Kafkasyayê kemilandîye. Wê xebata me li ser îmajên Fêrîkê Ûsiv be û em ê di wê lêgerînê da bin ku helbesta wî bidine eşkerekirin û fehmkirinê.

## **Sînorên Tezê**

Mijara xebata me di helbestê da îmaj e. Di îmajê da jî me tenê îmajên helbesta Fêrîkê Ûsiv hîlbijartine ku ji îmajên evînê, îmajên sirûştê, îmajên xerfîbî û hesretê, îmajên tenêtî û êxtîyarîyê, îmajên derengmayînê, îmajên wetenîyê, îmajên mirinê, îmajên qerfî/mîzahî, îmajên erotîk, îmajên zordestî û dijkolonyal, îmajên polîtîk û azadîyê pêk tên. Her yek ji van mijaran dikarin bibine xebateka serbixwe. Ji ber ku li ser helbesta Fêrîk bi dehan mijar dikarin bikevin qada lêkolînan û ji ber ku xebata me teza masterê ye û sînorê wê jî li gorî wê dorteng e me ev tez hîlbijart. Pirtûkên ku di vê xebatê da em li ser xebitîn ev in; *Hesretdefter*, *Sûretsûfe*, *Êvara Zivistanê*. Em di van berhemana da tenê li ser îmajên helbestên Fêrîkê Ûsiv sekinîn.

## **Armanca Tezê**

Em pê dizanin ku helbestvanên weke Şikoyê Hesên, Cerdoyê Esed û Fêrîkê Ûsiv avakarên ekola helbesta kurdî ya Kafkasyayê ne û lîrîzm û rewaniyeka mezin li parta zimanê kurdî zêde kirine. Armanca me jî ew e ku vê geşedana helbesta Fêrîkê Ûsiv ku yek ji endamên helbesta kurdî ya modern a Kafkasyayê ye û navê wî cihêkî qewî digire, bi helbestên wî bipeytînin û li ser îmajên xurt ên sereke yên di helbesta

wî da raçav bikin, bihesin, kategorize bikin, binirxînin û bi vê hesasîyetê çarçoveya xebata xwe eşkereyî muxatabên vê qadê bikin.

Heta niha di kurmancî da ji bo îmajê enerjîyeka kêr hatîye xerckirinê û ji xeynî çend gotar û pirtûkan, xebateka ku em pişta xwe bidinê û rê li ber me veke tune ye, em ê jî di vê xebata xwe da li ser mijara îmajê û teorîya wê bisekinin û di helbestan da pêkhatina îmajê nîşan bidin.

Hin sedemên hilbijartina tezê ev in: Êwra Kafkasyayê pir zelal nîn e, bêtir li ser romanên xebat hatine kirinê, pêdivîya helbesta Kafkasyayê bi xebatan heye, xebatên li ser Fêrîkê Êsiv di asta tunebûnê da ne û helbesta wî nayê zanîn, hewceyî pê hebû ku cihê Fêrîk di nav helbesta kurdî-kurmancî da bihata eşkerekirin, li ser îmajê helbestên kurdî-kurmancî bi gelemperî xebat pir kêr in. Me xwest ku ev alîyê helbesta kurdî xurt be û dêhna xwendekaran li ser helbesta kurdên Kafkasyayê be ku zêde nayê zanînê. Mexseda vê tezê di konteksta qayîm a îmaj û helbestê da destnîşankirina mijarên desthil ên helbesta Fêrîkê Êsiv e. Em ê lê binerin bê ka ev îmajên ku me li jorê rêz kirin di helbesta wî da reng û rûçikekî çawa digirin. Em ê ji vir şûn da xwîner û muxatabên vê qadê bi poetîka, fehm û feraseta wî ya edebî bihesînin.

### **Rêbaza Lêkolînê**

Xebata me li ser rêbaza xwendin, nirxandin, tesnîf û veçirîna helbestê ava dibe û bi şîrovekirina helbestê va didome. Di pişka ewil a vê xebatê da me helbestkarên êwra Kafkasyayê dane nasînê û hingî ji me hat me hin mînakên helbesta wan li vir nîşan da. Pişka duyem ji çarçoveya teorîk û paşxaneyê pêk tê ku, di vê pişkê da em li ser pênase û teorîya helbest û îmajê sekinîn û me behsa şîrove û pênaseyên di derbarê vê qadê da kir. Di bin navê cureyên îmajê da me îmajê kategorize kirin, îmaj di helbestan da çawa pêk tên, reng û rûçikekî çawa hildidin, îmaj çawa tesîrê li helbesta helbestkar dike, ev mijara me ya sereke bû. Helbet me di bin vî sernavî da beşek jî bo nêrînên li ser îmajê veqetand. Di pişka sêyem da em li ser mijara xwe ya esas sekinîne û me behsa îmajên takekesî û mijarên civakî û siyasî yê helbesta Fêrîkê Êsiv kirîye, hin îmajên berçav ev in; îmajên siruştê, îmajên xurbetîyê, îmajên welatperwerîyê, îmajên tenêtîyê...Weke dawî me encama xwe

nivîsî û çavkanîyên xebata xwe dan û hin fotografên pêwendîya wê bi xebata me ra hene weke pêvek danîn dawîya xebata xwe.

### **Girîngîya Tezê**

Kurd ji ber şertên weke mişextî, warguherî, zextî, zehmetîyên ku ji coxrafyayê pêk dihatin û sedemên li dor van hêmanan ji çand û zimanê xwe dûr ketin. Li her alîyê welatê kurdan êwrên edebîyatê pêk hatin lê ji ber şertên berbehs û asîmîlasyona tund him ji zimanên xwe bûn him jî haja wan bi edebîyat û êwrên din çênebû. Êwra Kafkasyayê jî yek ji wan êwran e ku li welatên weke Ermenistan, Gurcistan, Rûsya, Azerbêcan, Kirgîzîstan û Qezexîstanê zîl daye û weke êwra sêwîyan tê zanînê. Ji ber ku helbestvan û nivîskarên vê êwrê ji ber şer, mişextî û zordestîyê him ji warê xwe him jî ji malbatên xwe bûne. Nebûna perwerdehîya kurdî ya li her perçe welatê kurdan jî dibe bayîs û astengîya jihevhesîna xwîner û eleqedaran.

Fêrîkê Ûsiv yek ji wan helbestvan û wergêrên edebîyata kurdî ye ku ji hêla xwendekaran va nayê zanînê, di êwra Kafkasyayê da xebatên li ser îmaj û helbestê kêr in. Me jî bi vê xebatê qadeka destnedayî dagirt. Ji hêla din va jî ji ber ku ev xebat di kurmancî da dibe yek ji xebatên ewil ên li ser îmajê girîngîyekê di xwe da dihewîne û roleka çak digêre.

### **Jêderên Sereke**

Me di vê xebatê da ku ji îmajên helbesta Fêrîkê Ûsiv pêk dihat, ji nivîskarên wek Terry Eagleton, René Wellek-Austin Warren, Remezan Alan, Metin Altıok, Nurullah Çetin, Thomas Stearns Eliot sîd wergirt. Lê di tezê da çavkanîyên sereke ku haveyna xebatê bi xwe jî bûn her sê dîwanên Fêrîkê Ûsiv ên bi navê *Hesretdefter*, *Sûretsûfe* û *Êvara Zivistanê* bûn.



## BEŞA YEKEM

### HELBESTA KURDÎ YA KAFKASYAYÊ Û HELBESTVANÊN WÊ SERDEMÊ

Edebîyata kurdî ya Kafkasyayê ku weke edebîyata sêwîyan jî tê zanîn yek ji êwra edebîyata kurdî ye, ev êwr ji nivîskarên sirgûnê pêk tê. Kurd piştî qirkirina 1915-1920î ya ku para mezin ji ermen û kurdên êzidî pêk dihat û mişextîyek bi xwe ra dianî, ji belavbûneka gelekî qewî derbas bûn. Kurdan bi vê karesatê va gelekî birçîtî, feqîrî, neçarî û bê cih-warî dîtin. Rewşa xedar a ku li dar bû sewa pêşketineka çandî, ilmî û zanistî ne guncav bû lê ew pêvajoya xedar zêde nedomand û kurdan keysa pêşketinê bi dest xistin. Ev pêşketin lêhewîna nivîskar, helbestvan, hunermend û pêşengên kurdên Êzdî bû ku navenda sereke Ermenistan bû.

Güneş Kan bi referansên Eskerê Boyîk, Têmûrê Xelîl û Tosinê Reşîd edebîyata kurdî ya Sovêtê weke sê êwr diseniffine ku teqabulî van dîrokan dike;

a- *Êwra Yekem (1920-1937)*

*Di salên 1920î de bi xebatên perwerdeyî û zimanî bingeha edebiyateke nivîskî tê danîn, di salên ewilîn ên 1930yî de jî bi wergerên ji zimanê ermenî û rûsî û her wiha bi berhevokên afirandinên nivîskarên kurd, ev edebiyat dest pê dike. Wekî tê zanîn yekem romana kurdî, di 1935an da tê nivîsîn. Yanê êwra yekem, 'destpêk' e.*

b- *Êwra Duyem (1937-1955)*

*Bi desthilatdariya Stalîn û qedexeyên vê demê tê pênasekirin. Êwra duyem jî dikare wek êwra 'rawestîna' bê fehmkirin.*

c- *Êwra Sêyem (1955-1991)*

*Û di êwra sêyem de, edebiyata kurdî ya Sovyetê, êdî ji ceribandîna ewilîn û rawestîna dema Stalîn xwe rizgar dike û bi hêz û tecrûbeyê jixwebawer di rêya xwe de dimeşe. Êwra sêyem jî dikare wek êwra 'hostetî'yê bê binavkirin.<sup>1</sup>*

---

<sup>1</sup> Güneş Kan, *Îmaja Ermenî di Romanên Kurdî yên Sovyetê da*, Weşanên Peywend, Stenbol, 2019, r. 52

Eskerê Boyik ku yek ji nûnerên edebîyata kurdî ya Kafkasyayê ye, wê serdemê wiha radigihîne;

*Destpêka sedsala borî, li welatê Sovêtê yê nû hatibû damezrandin, saya bi dêmokratî nêzîkbûna pirsra miletîyê, çawa ji bo gelek netewên kêmjimar usa jî ji pareke gelê Kurd mecalên pêşdaçûyîna perwerde, çand û kultûra netewî vebûn. Para Kurda ya ku ji zulm û zora împratorîya Osmanîyê, qir-bira komkujîya salên 1915-1920î, ji cî û warê kal-bavên xwe şihitî bûn, terikandibûn, revîyabûn xerîbîyê û bi curekî xilas bûbûn. Civak halê eşîretîyê, koçerîyê û nivkoçerîyê de bû. Derheqa xwendin-nivîsarê de gilî nikaribû hebûya. Şer, rev û beza, xelayî û nexweşîyan qira xelkê anîbûn. Sêwîxane tije zarokê Kurda bûbûn. Civak di nav pirsgerêkên jîyanê yên dijwar da bû.*

*Di vî halê civakî û aborî yê giran de, dewleta nû avabûyî (rewşa wê jî pir dijwar bû) qerar û qanûnine nû qebûl kirin. Nava demeke kin de dest bi kampanîya dijî nexwendîtîyê bû, elfabên netewî hatin damezrandin, gundên Kurda de dibistan bi zimanê dê hatin vekirin, xwendexanê hazirkirina kadirên xwexwetîyê vebûn, weşana pirtûkan bi zimanê dê dest pê kir, şaxê koma nivîskarên Kurd li rex Yekîtîya Nivîskarên Ermenistanê vebû. Weşana rojnama “Rîya Teze” û ocaxên perwerde û çandê yên netewî yê din bûn bingeh ji bo pêşdahatîna Edebîyata netewî, yê navê da usa jî helbestvanîyê.<sup>2</sup>*

Siûda kurdan hebû ku di wê rewşa xedar da rewşenbîrên xêrxwaz ên ermenî kurd hewandin û sewa pêşdaçûna kurdan çî ji destên wan hat teksîr nekirin ku ev yek jî bû bingeha edebîyata kurdî ya Kafkasê. *Ji Şoreşa Cotmehê û vir ve ermenîyan eleqeyêke zêde da pêşketin û dewlemendkirina edebiyat û zimanê kurdên Ermenistanê. Hem bi rêya rewşenbîrên ermenî alîkarî kirin û xebatên ewilîn ên nimûneyî pêk anîn û hem jî bi rêya danîna derfet, piştgirî û finansekirinê rê li ber rewşenbîrên kurd vekirin. Sedemeka din a geşedana edebiyata kurdî ya Ermenistanê ew e ku bi têkçûna ‘Kurdîstana Sor’ re navend qulibî ser kurdên Ermenistanê.*

<sup>2</sup> Eskerê Boyik, *Çanda Kurdên Sovêtê*, Weşanên Peywend, Stenbol, çapa duyem, 2019, r. 37

*Ermenistan ji wan re bû welatê duyemîn. Loma em dikarin edebiyata Sovyetê, du sê mînanan jê der ve bihêlin û wek edebiyata kurdî ya Ermenistanê jî bi nav bikin.*<sup>3</sup> Helbet rewşenbîr û nivîskarên ermenî tenê ji hêla hewandinê va alîkarîya kurdan nekirin, di heman lehzeyê da ev rewşenbîrana haj bi kurdî jî hebûn, bi zimanê kurdî û çanda kurdan dizanibûn. Her wiha hin nivîskaran bi zimanê kurdî berhem jî afirandine.

Di nava edebîyata kurdî ya modern a Kafkasyayê da gelek kesan helbest lêkirine, hin ji wan helbestên xwe weke berhem weşandine, hin ji wan helbestên wan di belavok, kovar, rojname û radyoyan da weşîyane, hin ji wan jî bi helbestê ra mijûl bûne lê keysa xwe pê neanîne ku helbestên xwe di tu der û platformê da biweşînin an jî bixwînin û millet pê bihesînin. Em ê di vê beşê da behsa wan kesan bikin ku herî kêr helbesteka wî hebe (li cihekî weşîyabe an jî radyoyekê da hatibe xwendinê bo me bes e). Di edebîyata kurdî ya modern a Kafkasyayê da navên weke Etarê Şero, Aramê Çaçan (Xûdoyan), Nûrî Hîzanî, Egîtê Qadirî, Cemalê Êsiv, Vanîkê Elîxan, Baxçoyê Êsko, Taharê Têcir Biroyêv, Keremê Anqosî, Cerdoyê Esed, Ezîzê Êsko, Ehmedê Mirazî, Mecîtê Silêman, Îşxanê Eslan, Emînê Evdal, Casimê Celîl, Wezîrê Nadirî, Êsivê Beko, Qaçaxê Mirad, Şikoyê Hesen, Mîkayêlê Reşîd, Fêrîkê Êsiv, Elîyê Evdilrehman, Sihîdê Îbo, Simoyê Şemo, Karlênê Çaçanî, Çerkezê Reş, Mîroyê Esed, Rizalîyê Reşîd, Şamîl Esgerov, Tosinê Reşîd, Ahmedê Gogê, Egîtê Şemsî, Elîxanê Memê, Barîyê Bala, Babayê Keleş, Ezîzê Cewo Mamoyan, Ezîzê Gerdenzerî, Hesenê Hecîsilêman, Pirîskê Mihoyî, Mirazê Cemal û Eskerê Boyîk helbestvanên edebîyata modern a kurdî ya Kafkasyayê ne.<sup>4</sup>

### **1.1. Helbestvanên Kafkasyayê yê Xwedîberhem**

Di êwra Kafkasyayê da hin helbestvanan derfet dîtine ku berhemên xwe biweşînin lê hin helbestvanan jî ji ber sedemên sirgûnî, warguherî û ji ber şertên desthilat û heyata wî çaxî keysa xwe lê neanîne ku berhemên xwe biweşînin. Em ê di vê beşa xwe da behsa wan kesan bikin ku herî kêr berhemeka wan weşîyabe.

---

<sup>3</sup> Kan, *h.b.*, r.51

<sup>4</sup> Boyîk, *h.b.*, r. 26-598

### 1.1.1. Fêrîkê Ûsiv

Helbestvan, wergêr, destannûs, laqirdînûs û şanonûsê kurd e ku di sala 1934an da li gundê Pampê tê dinê ku gundekî kurdan ê Yêrêvanê ye. Mezinên wî ji Qersê ne. Piştî şerê cîhanê yê yekemin tevî kurdên Êzdî û Ermenîyan derbasî aliyê Ûris bûne û di rê da ji malbata wî gelek kes mirine. Dibistana seretayî li gundê xwe dixwîne, piştî xwendina xwe ya çar salan, Fêrîkê Ûsiv di 1955an de, di beşa Fîlolojî û Dîrokê da dest bi xwendina xwe ya bilind dike. Heman salê di rojnameya *Rya Teze* da dest bi xebatê dike û helbest û nivîsên wî diweşin. Piştî kutakirina enstîtûyê di radyoya Kurdî ya Yêrêvanê da weke serokê wêjeyê dest bi xebatê dike. Di pêşbirka wergerê ya Sayat Nova da bi wergera xwe ya bo kurmancî xelata sêyemînîyê werdigire. Ji Lêrmontov, Pûşkîn, Yasenîn, Goethe, Shekaspere û gelek nivîskarên din wergeran dike. Di sala 1968an da li gundê xwe dest bi mamostetîyê dike û di sala 1974an da dibe endamê Yekîtîya Nivîskaran. Fêrîkê Ûsiv di helbestê da Pûşkîn û Yasenîn weke hosta qebûl kirine. Di sala 1987an da sewa bajarê ku Pûşkîn lê maye bibîne, derdikeve gereke demdirêj û li danzdeh bajarên welatê ûris digere, di sala 1997an da vedigere Yêrêvanê lê êdî nexweşî li Fêrîkê Ûsiv giran dike. Di 1ê Gulanê da radikin nexweşxaneyê û 3yê Gulana 1997an da li Yêrêvanê, di 63 salîya xwe da diçe rehma xwedê.<sup>5</sup> Eskerê Boyîk di berhema xwe ya bi navê *Çend dîdem ji edebyeta Kurdên Ermenistanê* da wiha behsa Fêrîkê Ûsiv dike; *Fêrîk ji maleke esilzade ye: mala Ûsivê Îbo. Bavê Ûsiv, Îboyê Nemo sala 1918-a, wextê rev û bezê gundê xweyî hizkirî, Yamançayîrê, li qeza Qersê dihêle û bi malê va direvne pala çiyayê Elegezê, gundê Camûşvana mezin (niha gundê Elegezê, nehya Aragasê). Roma reş tê digîhîje vî gundî jî. Bav û apê Ûsiv jî tevî bi sedan mêrên gund digrin, dikujin. Ji pey zulma Romê ra dest bi xelayê dibe. Ûsiv û birê wî neferên xwe hildidin diçine Borçalîyê-Gurcistanê, ku bikaribin ebûra xwe bikin. Sala 1922-a vedigerin, têne gundê Pampê(Sîpanê), cem qewmên xwe, dibin mal-hal. Ûsiv di kolxozê da birîgadîryê dike, dibe malxê mala giran. Neh kur û du keç mala wî dixemilînin. Bi gotina gotya hesavê nebî-nebîçîrkê remetyê Ûsivê Îbo ji sedî zêdetir in.*

<sup>5</sup> Fêrîkê Ûsiv, *Hesretdefter*, Weşanên Lîs, Ankara, 2011, (beşa jînenîgarîyê)

*Di wê mala giran da, di sala 1934-a da Fêrik tê dinê. Zarotyâ wî li nava mêrg-  
çîmanê Elegeza bedew, jîyana gunde qedîmî, odên bi zargotinê tijî û evdên gunde  
sade da derbaz dibe...*<sup>6</sup>

### **1.1.1.2. Berhemên Wî**

1. Çevkanî, Yêrêvan, 1961, helbest.
2. Gula Elegezê, Yêrêvan, 1964, helbest.
3. Lîrîka, Yêrêvan, 1967, helbest.
4. Ûsivê Nevyâ, Yêrêvan, 1973, helbest.
5. Narê, Yêrêvan, 1977, helbest.
6. Hisretdefter, (di berevoka Bahar da, hej.3), Yêrêvan, 1984, helbest.
7. Dinya delal, (di berevoka Bahar da, hej.6), Yêrêvan, 1987, helbest.
8. Hîveron, Stockholm, 1993, (cure ne dîyar e).
9. Hisret, Yêrêvan, 2004, pişt ra Êrbîl 2004, destan.
10. Gahavêj arvî apîn (Ber ava gurr), berevoka helbesta bi zimanê ermenkî, Yêrêvan, 2004, (cure ne dîyar e).
11. Destan, Yêrêvan, 2005, piştra Êrbîl 2006, (cure ne dîyar e).
12. Bera ber deriya, berevoka wergera, Yêrêvan, 2006, (cure ne dîyar e).
13. Kerdîga kilama, Yêrêvan, 2007, (cure ne dîyar e).
14. Berevoka berbema, cilda I-ê, Yêrêvan, 2008.
15. Berevoka berhema, cida II-a, Yêrêvan, 2008.
16. Berevoka berhema, cilda III-a, Yêrêvan, 2009.
17. Pampa min, Yêrêvan, 2009, berhemên bona zarokan.
18. Bijare, Yêrêvan, 2010, (cure ne dîyar e).<sup>7</sup>
19. Xewna Mîrmih (di nava pirtûka Hîkayet Der Heqê Bar Mûraz De), bi rûsî, Moskova, 1971, destan.
20. Rihana Reso, Yêrêvan, 1984, destan.

Her wiha divê meriv însafa xwe neşewitîne ber behsê bixe ku pîyesên wî yên  
mîna Bêqelen û Dimdimê, serhatî, laqirdîyên wî û dîsa wergerên wî yên ji

---

<sup>6</sup> Eskerê Boyîk, *Nûra Elegezê-Çend Dîdem Ji Edebyeta Kurdên Ermenistanê*, Weşanên Dengê Êzîdîyan, Oldenburg, 2004, r. 72

<sup>7</sup> [http://bnk.institutkurde.org/catalogue/detail.php?pirtuk=1394&r\\_detail=f%C3%AAr%C3%AEk](http://bnk.institutkurde.org/catalogue/detail.php?pirtuk=1394&r_detail=f%C3%AAr%C3%AEk)  
(11.01.2020)

Shakespeare, Byron, Heine, Pûşkîn, Lêrmontov, Yassenîn û Sayat Nova û hwd. jî pareka mezin a poetîkaya wî ya berz û feraseta wî ya edebî nîşan dide.

### **1.1.2. Nûrî Hîzanî (Hovakîm Margaryan) (1896-?)**

Bi eslê xwe Ermenî ye. Di sala 1896an da ji dayîk bûye. Di nav Kurdên bakur da mezin bûye. Edetên kurdan baş zanibûye. Salên 30î da wek rojnamevan di rojnameya “Rîya Teze” da xebitîye. Hin pirtûk wergerandine Kurdî. Di sala 1934an da berhevoka wî ya kurteçîroka bi navê “Şewqa Sibê”, di sala 1962an da jî berhema wî ya helbestan a bi navê “Hûb û Xebat” li Yêrêvanê weşiyane.<sup>8</sup>

### **1.1.3. Etarê Şero**

Di sala 1901î da li gundê Soybûlaxê hatîye dinê. Xwendina destpêkê standîye û di dibistanên gundên Kurdan da dersdarî kirîye û helbest nivîsîne. Sê pirtûkên wî yê helbestan hatine weşandin. Ya ewil di sala 1935an da bi navê “Biriqandina Ewlîn”, pirtûka duduyan di sala 1957an da bi navê “Şiêr”, ya sisêyan “Du Diniya” di sala 1963yan da li Yêrêvanê hatine weşandin.<sup>9</sup>

### **1.1.4. Emînê Evdal (1906-1964)**

Di sala 1906an da li gundê Yemançayîra Qersê hatîye dinê. Ji êla Sîpkan e. Di sala 1931ê da dest bi beşa filolojîyê dike. Sewa dibistanan pirtûkên zimanê Kurdî amade dike, bi zargotinê ra eleqeder dibe û tevî Hecîyê Cindî “Folklorê Kurmanca” diweşînin, ji zimanên din wergerê dike, gotaran bo rojnameya “Rîya Teze” hazir dike û helbest û kurteçîrokan dinivîse. Gelek berhemen wî diweşin. Di sala 1953yan da berhevoka wî ya ewil a helbestan “Bihar” diweşe.<sup>10</sup>

#### **Helbesteka wî:**

*Çiqas sar be zivistan,  
Tu delalê dilê min,  
Bihar wê bê gulistan,  
Eşqa dila kurê in.*

---

<sup>8</sup> Boyîk, *h.b.*, r. 27

<sup>9</sup> Boyîk, *h.b.*, r. 26

<sup>10</sup> Boyîk, *h.b.*, r. 161-169

*Çiqas hebe berf-bager,  
Rojê sermê bayê sar,  
Bihar wê bê mîna her car,  
Ew bîr nake me tu car.*<sup>11</sup>

#### **1.1.5. Aramê Çaçan (Xûdoyan)**

Di sala 1908-1992a li gundê Cerçerîsê (Ermenistan) hatîye dinê. Nûçe û gotarên wî yên piçûk di rojnameya “Rîya Teze” da hatine weşandinê. Berhevoka Bahara Teze da jî helbestên wî weşîyane. Di sala 1957an da berhema wî ya helbestan a bi navê “Gulbahar”, di sala 1962an da jî destana wî ya bi navê “Xelîl û Gozel” çap bûye.<sup>12</sup>

#### **1.1.6. Casimê Celîl (1908-1998)**

Di sala 1908an da li gundê Qizilquleyê (Dîgor-Qers) hatîye dinê. Gelek helbest, gotar û destan nivîsîne. Helbest û destanên wî yên ewil bi zimanê Ermenkî derdikevin. Di sala 1960î da li Yêrêvanê berhevoka wî ya helbestan a bi zimanê kurdî “Rojên Min” diweşe. Paşê berhemên wî yên bi navê “Kilamê Çiya” di 1970yan da, “Oda Kurda” di 1975an da, “Kurdê Bengî” di 1980yan da, “Kofîya Dîya Min” di 1984an da, “Bijare” di 1989an de weşîyaye.<sup>13</sup>

#### **Helbesteka wî:**

*Xew li çeva herimandiye  
Ez distirê m şev û rojê seva te,  
Birû-bijang min kil dane seva te,  
Xortê nazik, xortê tûre, zû were,  
Min pez dotîye, şîr kelandiye seva te,  
To û nivîşk min hildaye seva te.*<sup>14</sup>

#### **1.1.7. Êsivê Beko (1909-1969)**

Di sala 1909an da li gundê Qûça Îdirê hatîye dinê. Xwendina xwe ya navîn li Yêrêvanê temam dike. Di rojnameya “Rîya Teze” da gotar û helbestên wî diweşin.

---

<sup>11</sup> Boyîk, *h.b.*, r. 169

<sup>12</sup> Boyîk, *h.b.*, r. 26

<sup>13</sup> Boyîk, *h.b.*, r. 183-188

<sup>14</sup> Boyîk, *h.b.*, r. 194

Hin berhemên wî ev in: “Keskesor” (1961), “Hisreta Min” (1963), “Mêvanê Royê” (1966), “Efrandinêd Teze” (1969), û “Payîz” (1971).<sup>15</sup>

### **Helbesteka wî:**

*Carekê, wexta dilê min dinaliya,  
Zozana da çûme ciyê belekiya,  
Têr berf xwer û xweziya xwe pê anî,  
Wekî bal wê tune şewata dil.*<sup>16</sup>

### **1.1.8. Wezîrê Nadirî (1911-1946)**

Di sala 1911an da li gundê Boralanê (Bakurê Kurdistanê) hatîye dinê. Ji êla Birûkan e. Di sala 1933an da di zanîngeha Yêrêvanê da dersên kurdî dide. Berhemên xwe yên ewil di rojnameya “Rîya Teze” da dinivîse. Şanoyeka wî ya bi navê “Reva Jinê” heye, her wiha berhemeka wî ya bi navê “Nûbar” jî heye. Di 35 salîya xwe da di qezayekê da diçe rehma xwedê. 15 sal piştî wefata wî (1961) sewa 50 salîya jidayîkbûna wî berhevoka berhemên wî ya sêyemîn a bi navê “Wetan û Hizkirin” weşîyaye.<sup>17</sup>

### **Helbesteka wî:**

*Seva axê, dixebitîm, bêrihetî  
Min, ew dît ku bûme kalekî ketî,  
Min ne mal çêkir,  
Ne jî pakî derbaz kir  
Xuezila min li we, roja we îroyîn be  
Hûn gihîştine wexta şêwrê vê meremê  
Bûne xudana keda xue  
Ax! Umrê çûyî naê şûna xue.*<sup>18</sup>

### **1.1.9. Qaçaxê Mirad (1914-1979)**

Di sala 1914an da li gundê Tendûrekê (Sînek/Qers) hatîye dinê. Helbesta wî ya ewil di rojnameya “Rîya Teze” da weşîyaye. Çar berhemên wî yên bi zimanê

---

<sup>15</sup> Boyîk, *h.b.*, r. 213-215

<sup>16</sup> Boyîk, *h.b.*, r. 221

<sup>17</sup> Boyîk, *h.b.*, r. 196-204

<sup>18</sup> Wezîrê Nadirî, *Nûbar*, Weşanên Nûbihar, Stenbol, 2016, r. 96-97



kurdî weşîyane: “Şewq” (1959), “Gulperî”(1963), “Bihara Teze” (1966), “Gava Çara”.<sup>19</sup>

### **Helbesteka wî:**

*Destê xwe bide destê min, hevalo, rabe sibe ye,  
Milê xwe bide milê min, hogiro, qam-qamê me ye,  
Ez î Kurd im, tu inglîz î, yanê hind î, ereb î zeng,  
Destê xwe bide destê min, hevalo, rabe sibe ye.*<sup>20</sup>

#### **1.1.10. Mîroyê Esed (1919-2008)**

Di sala 1919an da li gundê Elegeza Ermenistanê ji dîya xwe bûye. Zanîngeha Yêrêvanê da beşa Hiqûqê xwendîye. 34 salan berpîrsîyarîya rojnameya “Rîya Teze” kirîye. Sê berhemên wî yên kurteçîrok û helbestan weşîyane; “Sisê” (1961), “Ewledê Welêt” (1969), “Hisreta Dil” (1973).<sup>21</sup>

#### **1.1.11. Elîyê Evdîlrehman (1920-1994)**

Di sala 1920î da li gundê Bayreka Wanê tê dinê. Ji eşîra Birûkan e. Li bajarê Yêrêvanê xwendinxana dersdarhazîrkirîna ya Kurdî dixwîne. Li bajarên Yêrêvan û Bakûyê pedagojîyê dixwîne. Berhema wî ya ewil “Xatê Xanim” di sala 1959an da li Yêrêvanê diweşe. Berhemên wî yên din ev in; “Dimdim” (roman), “Morof” (çîrok), “Gundê Mêrxasa” (roman), “Şerr Çiya da” (roman). Her wiha berhevokên wî yên helbestan ên bi navê “Dê”, “Gulistan”, “Hisreta Min” diweşin.<sup>22</sup>

### **Helbesteka wî:**

*De lêxin, lê xin, bav û birano,  
Bila tu kes me neke lomano.  
De min go, -basîstê teleqreşo,  
Destê xwe bi xûna Kurda meşo.*<sup>23</sup>

#### **1.1.12. Taharê Têcir Biroyêv (1923-...)**

---

<sup>19</sup> Boyîk, *h.b.*, r. 222-225

<sup>20</sup> Boyîk, *h.b.*, r. 226

<sup>21</sup> Boyîk, *h.b.*, r. 351- 353

<sup>22</sup> Boyîk, *h.b.*, r. 291-296

<sup>23</sup> Boyîk, *h.b.*, r. 299

Di Sala 1923yan da li gundê Korbulaxê (Ermenistan) tê din, hê di xotanîya xwe da dest bi nivîsîna helbestan dike. Di sala 1954an pirtûka wî ya yekemîn bi navê “Şêr” li Yêrêvanê diweşe. Şanoya bi navê “Memê û Eysê” di sala 1991ê da li Bêlçikayê ji aliyê Enstîtuya Kurdî ya Brûkselê va tê weşandinê. Paşê berhemên wî di pirtûkên dersa, efrandinên nivîskarên Kurd yên komarê Ermenistanê û Gurcistanê, gelek rojname û kovaran da tene weşandinê, Taharê Têcir wusa ji bi wergerê ra mijûl bûye û destana Şota Rûstavêlî a bi navê “ვეგბობტყაობსაბო” (Wergirê Postê Piling) wergerandîye Kurdî.<sup>24</sup>

### 1.1.13. Sihîdê Îbo (1924-1991)

Bav-kalên wî ji êla Hesinîya Ortilîya bûne, Sihîdê Îbo di sala 1924an da tê dinê. Bijîşkekî bi nav û deng bûye. Gelek kar û xebatên çandî kirîye, berhemên wî yên weşiyayî ev in; “Qurna Min” helbest/1963, “Duryan” kurteçîrok/1966, “Bîst Salê Dinê” destan/1970, “Sînem” helbest/1975, “Kurdê Rêwî” roman/1979, “Azatî” helbest/1988. Di sala 1991ê da hatîye kuştinê.<sup>25</sup>

#### Helbesteka wî:

*Ax çi kirin salê min,  
Xirab kirin halê min,  
Zarotiya min zevt kirin,  
Bêxweyî, bêbext kirin,  
Ax çi anî serê min...  
Salino we ra şerê min.*<sup>26</sup>

### 1.1.14. Mîkayêlê Reşîd (1925-1985)

Di sala 1925an da li bajarê Tilbîsê tê dinê, li bajarên Yêrêvan û Moskovayê da beşa ziman û edebîyatê dixwîne. Helbestên wî yên ewil bi zimanê Ermenkî û Rûsî di berhevokên efrandinên nivîskarên Kurdên Sovêtê, rojnameya “Rîya Teze” û pirtûkên dersan da diweşin. Hin berhemên wî yên weşiyayî ev in: “Dilê Min”

---

<sup>24</sup> Boyîk, *h.b.*, r. 35-36

<sup>25</sup> Boyîk, *h.b.*, r. 302-312

<sup>26</sup> Boyîk, *h.b.*, r. 315

helbest/1960, “Pişikî Min” helbestên zarokan/1965, “Wede” helbest/1966, “Pencere” helbest/1974, “Mîtale” helbest/1978.<sup>27</sup>

### **Helbesteka wî:**

*Nîvro îx bûye mînanî devê,  
Çem qey nakîşe, lale, bê avaz,  
Û vir dara bîê ber devê avê  
Gundê xweye şîn berdaye bi naz.*<sup>28</sup>

### **1.1.15. Ezîzê Îsko (1927-2005)**

Di sala 1927an da tê dinê. Ji êla Sîpkan e. Bav- kalên wî ji gundê Qizilcîya Qersê koçî gundê Pampê kirine. Ji wir ji derbasî Tilbîsa Gurcistanê bûne. Beşa ziman û edebîyata Rûsî qedandîye. Di sala 1966an da li Yêrêvanê berhema wî ya helbestan a bi navê “Bihara Min” weşîyaye.<sup>29</sup>

### **Helbesteka wî:**

*Qudûm ketiye sur û serma,  
Seqem îdî naşidîne,  
Wê hû kirin bayê germa,  
Bager îdî nalûbîne.  
Pencê royê tîra xwe rist  
Hingavt sîngê çiya û baniya,  
Şepe berfê hêlana xist,  
Xulîn ketiye cew û kaniya.*<sup>30</sup>

### **1.1.16. Şikoyê Hesên (1928-1975)**

Di sala 1928an da li gundê Camûşvana Biçûk (Ermenistan) hatîye dinê. Di Zanîngeha Yêrêvanê da beşa rojhilatzanîyê xwendîye. Berhevoka wî ya helbestan “Qalçîçek” di sala 1961ê da li Yêrêvanê weşîyaye. Berhema wî ya duyemîn “Tembûrê Kurda” di sala 1965an da weşîyaye, di sala 1970yan da jî “Meremê Dilê Kurd” weşîyaye.<sup>31</sup>

---

<sup>27</sup> Boyîk, *h.b.*, r. 248-249

<sup>28</sup> Mîkaêlê Reşîd, *We'de-Pencere-Mitale*, Weşanxaneyê Belkî, Enqere, 2019, r.69

<sup>29</sup> Boyîk, *h.b.*, r. 458-459

<sup>30</sup> Boyîk, *h.b.*, r. 459

<sup>31</sup> Boyîk, *h.b.*, r. 232-236

### **Helbesteka wî:**

*Şayîr girtin birne hebsê, ku tu cara nestirê,  
Ku tu cara lêvê tuberk dîhar nekin tu surê,  
Ku tu cara bera hûbê dilê erş da pêl nede,  
Ku dilê erş, ku roja geş vêsîn heta-hetayê...*<sup>32</sup>

#### **1.1.17. Simoyê Şemo (1928-2000)**

Di sala 1928an da li navçeya Armavîrê (Ermenistan) hatîye dinê. Ji êla Şerqîyan e. Zankoya Yêrêvanê da bijîşkîyê dixwîne. Helbestên wî yên ewil di rojnameya “Rîya Teze” da diweşin. Hin berhemên wî ev in; “Nûr” (1961), “Xetên Hubê” (1967), “Gula Gêlî” (1979), “Dilê Bengî” (1989), “Zozan” (2000).<sup>33</sup>

### **Helbesteka wî:**

*Dengê gulla, axîned kûr,  
Şingîna mertal ber derba şûr,  
Çewa rima donzdemovik,  
Di destê mêrxasê çargurçik.*<sup>34</sup>

#### **1.1.18. Karlênê Çaçanî (1929-2012)**

Di sala 1929an da li gundê Cerçerîsê (Ermenistan) tê dinê. Li bajarê Yêrêvanê beşa dîrokê dixwîne. Helbesta wî ya ewil a bi navê “Sala Teze” 1951ê da weşîyaye. Berhevoka wî ya helbestên zarokan a bi navê “Ahmedê Egît” li Yêrêvanê diweşe. Berhemên wî yên helbestan ên din jî ev in; “Gul” (1960), “Şêr û Kew” (1961), “Dil û Wetan” (1962), “Berbanga Wetanê Min” (1967), “Baqe Tev” (1972), “Zerê” (1980).<sup>35</sup>

### **Helbesteka wî:**

*Bahara min teze vebîye  
Wek keskesora awaz,  
Ax diliko teyamîş ke,  
Nekewgire, neke naz.*<sup>36</sup>

<sup>32</sup> Şikoyê Hesên, *Payiz û Ba*, Weşanên Avesta, Stenbol, 2008, r. 72

<sup>33</sup> Boyîk, *h.b.*, r. 316-318

<sup>34</sup> Boyîk, *h.b.*, r. 327

<sup>35</sup> Boyîk, *h.b.*, r. 330-331

<sup>36</sup> Boyîk, *h.b.*, r. 332

### 1.1.19. Cerdoyê Esed (1929-1993)

Di sala 1929an da li gundê Sabûnçiyê (Ermenistan) hatîye dinê. Hêj di salên xwe yê xwendevanîyê da dest bi nivîsandina helbestan dike. Berhevoka pêşîn a helbestan a wî “Şêr û Poem” di sala 1959an da li bajarê Yêrêvanê weşiyaye. Di sala 1966an da berhema wî ya duyemîn a bi navê “Ser Rêya Emir” û pey ra jî berhemên wî yê bi navê “Sewta Dil”, “Bilûr”, “Evd, Ez Te Bawer Dikim” jî bi zimanên Ermenkî û Gurcîkî weşiyane.<sup>37</sup>

### 1.1.20. Rizalîyê Reşîd (1929-1998)

Di sala 1929an da li Tilbîsa Gurcistanê çavên xwe li dinê vedike. Li zanîngeha Yêrêvanê beşa mamostetîya dîrokê diqedîne. Helbest, gotar û nivîsên wî di “Rîya Teze” da diweşin. Pirtûkên wî yê helbestê yê weşiyayî ev in; “Ber bi Tavê” (1964), “Xem û Xîyal” (1982). Her wiha di sala 1989an da bi navê “Heyr û Guman” berhemeka wî ya din diweşe.<sup>38</sup>

#### Helbesteka wî:

*Hezar, hezar car par kirin,  
Hezar, hezar nav lê kirin,  
Tofanê şûşt, ew tev birin,  
Disa navên qedîm ser man.  
Hezar, hezar sedsal herin,  
Merd û nemerda ser bigerin,  
Te bernadin em ji destan,  
Welatê me, xweş Kurdistan.*<sup>39</sup>

### 1.1.21. Şamîl Esgerov (1929-2005)

Di sala 1928<sup>40</sup>an da li Kurdistana Sor hatîye dinê. Ji ber sedema kurdayetîyê wî davêjine hepsê, 4 salan di hepsê da dimîne û di hepsê da destana bi navê “Keçîka

---

<sup>37</sup> Boyîk, *h.b.*, r. 427

<sup>38</sup> Boyîk, *h.b.*, r. 393-396

<sup>39</sup> Boyîk, *h.b.*, r. 397

<sup>40</sup> Di pirtûka berbehs a Eskerê Boyîk da sala jidayîkbûna Rizalîyê Reşîd him weke 1928 him jî weke 1929 dane.

Lal” dinivîse. Bi dehan berhem nivîsîne ku hin ji yên helbestî ev in; “Çiya Ser Çiyan” 1964/Bakû, “Dengê Delîdax” 1973/Bakû, “Gulîlkên Çiya” 1987/Bakû...<sup>41</sup>

### **Helbesteka wî:**

*Evîxan nas dîkin rast e navê wî,  
Gelê Kurd li dîrok dêran e îro.  
Vedibe, bi perde nema çavê wî,  
Dijminên Kurdistan goran e îro.*<sup>42</sup>

### **1.1.22. Keremê Anqosî (1937-...)**

Di sala 1937an li bajarê Tilbîsê hatîye dinê. Kal-bavên wî ji êla Anqosîyan e. Di sala 1999an li Tilbîsê dest bi weşana rojnameya “Gelavêj” dike. Bi navê “Min Bona Çi Distra”, “Sozê Heqîqetê” û “Rast û Çep ya Êzdîyan” berhemên wî yên helbestan hene, her wiha berhemên lêkolînî, folklorîk, berhevokên serhatîyan û wergerên wî jî hene. Hin helbestên wî yên bi nav û deng ku bûne stran ev in; “Lêxin Birano”, “Em ê Vegerine Kurdistanê”, “HOLA Êzîdê Sor e”...<sup>43</sup>

### **Helbesteka wî:**

*Ax, Kurdistan, ez hatim te bibînim,  
Lê tu ketî şêr, ax li min, te nabînim,  
Gelo kengê Kurdistan wê aza be,  
Erdê kurdên şervanên jîr, zana be.*

*Lêxin birano, lêxin,  
Roja sor bilind e,  
Kurdistana aza çiqas xweş û rind e.*

*Eva dinya bê Kurdistan xalî ye,  
Îro roja şer e, tune çare ye,  
Rabin lêxin, dijmin ser me barîye,  
Derdên kurdan xemên gele salî ye*

*Lêxin birano, lêxin,  
Roja sor bilind e,  
Kurdistana aza çiqas xweş û rind e.*

---

<sup>41</sup> Boyîk, *h.b.*, r. 400-404

<sup>42</sup> Boyîk, *h.b.*, r. 407

<sup>43</sup> Boyîk, *h.b.*, r. 425-426

*Bes e binal dilbirîno,  
Kurdistan ji xûna bilbil tu sor bûyî gulistan,  
Êy kurdno, mertalê me yekîti ye,  
Riya azayê îro Pêşmergetî ye*

*Lêxin birano, lêxin,  
Roja sor bilinde,  
Kurdistana aza çiqas xweş û rind e.*<sup>44</sup>

### **1.1.23. Barîyê Bala (1937-)**

Di sala 1937an da li gundê Demirçîyê (Ermenistan) ji dayîk bûye, ji êla Birûkan e. Li bajarê Yêrêvanê ziman û edebîyata azerî xwendîye. Helbesta wî ya ewil di rojnameya “Rîya Teze” da weşîyaye, pîranîya helbestên wî di rojnameya “Rîya Teze”, “Dengê Kurd” û “Jiyana Kurd” da weşîyane. Pirtûka wî ya helbestan a ewil a bi navê “Dinya Min” di sala 1974an da li bajarê Yêrêvanê weşîyaye. Pirtûka wî ya duyemîn a bi navê “Ku da Herim” jî di sala 1994an da li bajarê Bakûyê weşîyaye. Di sala 2008an da jî li Qirxizîstanê pirtûka wî ya bi navê “Dîlbera Min” weşîyaye.<sup>45</sup>

#### **Helbesteka wî:**

*Kulîlkeke zef tenik e,  
Bila xwînxar wê qut meke.  
Bin piyê xwe yî heram da,  
Meheciqîne, pêpez meke.*<sup>46</sup>

### **1.1.24. Eskerê Boyîk (1941-...)**

Di sala 1941ê da li Qundexsazê (Ermenistan) ji dîya xwe bûye. Li Yêrêvanê di Enstîtuya “Malhebûna Gûndîtîyê” da xwendîye. Helbestên wî yên ewil di rojnameya “Rîya Teze” da weşîyane. Di sala 1966an da pirtûka wî ya ewil a helbestan “Şiverê”, di sala 1975an da jî pirtûka wî ya bi navê “Kulîlkên Çiya” li Yêrêvanê weşîyaye. Pirtûkên wî yên helbestan ku weşîyane ev in: “Tîrênc”, “Govenda Herfan”, “Duaya Serê Sibê”, “Oda Çîrokan”, “Ez Kilameke Melûl im”. Ji

<sup>44</sup> <https://krd.riataza.com/2015/10/28/diroka-kilameke-welatperweriye-bi-nave-lexin-birano-lexin-2/>  
(07.01.2020)

<sup>45</sup> Boyîk, *h.b.*, r. 446-448

<sup>46</sup> Boyîk, *h.b.*, r. 452

xeynî van hin berhemên wî yên weşîyayî jî ev in; “Sinco Keça Xwe Dide Mêr” (şano-1980-Yêrêvan), “Li Çiya” (kurteçîrok-1991-Yêrêvan), “Xezeva Xwedê” (roman-2004-Stenbol), “Bahoz” (roman-2011-Stenbol).<sup>47</sup>

### **Helbesteka wî:**

*Azadî beyreqa wê be,  
Edlayî tifaqa wê be  
Ez zanim Kurdistanê çêbe.*

*Tavê qelema wê be,  
Çavê alemê lê be,  
Ez zanim Kurdistanê çêbe.*<sup>48</sup>

### **1.1.25. Tosinê Reşîd (1941-...)**

Di sala 1941î da li gundê Kûrekendê (Ermenistan) ji dîya xwe bûye. Li zanîngeha Yêrêvanê beşa fîzîk-matematîkê dixwîne. Gotar û helbestên wî di rojnameya “Rîya Teze” da diweşin. Bi dehan berhemên kurteçîrok, roman, drama, werger û lêkolînê nivîsîne, yên helbestî ev in; “Kilamê Rê” 1975/Yêrêvan, “Zozan” 1985/Berlîn.<sup>49</sup>

### **Helbesteka wî:**

*Wekî ser dinê  
Çiya tunebûna,  
Dinya çi ra bû?  
Wekî ser wan çiya  
Kurd tunebûna,  
Ew çiya çi ra bûn?  
Wekî bo Kurda  
Welat tunebûya,  
Ew Kurd çi ra bûn?  
Wekî ew welat  
Kurdistan nîbûya,  
Welat çi ra bû?  
Wekî Kurdistan  
Ser bi xwe nibe,  
Lê em çi ra nin?*<sup>50</sup>

---

<sup>47</sup> Boyîk, *h.b.*, r. 583- 598

<sup>48</sup> Boyîk, *h.b.*, r. 591

<sup>49</sup> Boyîk, *h.b.*, r. 410-413

<sup>50</sup> Boyîk, *h.b.*, r. 413



### 1.1.26. Ezîzê Gerdenzerî (1945-...)

Di sala 1945an da li Tilbîsa Gurcistanê hatîye dinê. Li Yêrêvanê bijîşkîyê dixwîne. Helbest û gotarên wî di rojnameya “Rîya Teze” û “Radyoya Yêrêvanê” da weşîyane. Pirtûkên wî yên bi navên “Kilîta Dil”, şanoya wî ya bi navê “Zarîna Çîya” 1989/Yêrêvan, romana wî ya bi navê “Fîncana Ferfûrî” (1990) weşîyane. Her wiha di sala 1996an da berhevoka berhemên wî “Gelavêj” li Yêrêvanê çap bûye ku tê da du roman (Bingeh, Hezkirina Qedexe), du şano û heşt kurteçîrok dihewin.<sup>51</sup>

#### Helbesteka wî:

*Kilamê, kawê, bibe wek berbanga sibê,  
Bangdana bilbilê re tu per vede, hilkişe jor,  
Dilê xewixî, tu ji xewê hişyar bike,  
Silavê rêke li ser deşt û zozanê hişyar.  
Kilamê, yarê, bibe wek çevkaniya sar,  
Ku her kesê bixarice dirozga ji te bike,  
Kilamê, delalê bibe wek dengê dayîkê,  
Ku her rêwîk, xerîbek derê te veke.<sup>52</sup>*

### 1.1.27. Mirazê Cemal (1945-...)

Di sala 1945an da li gundê Qundexsazê (Ermenistanê) ji dayîk bûye. Ji ber rewşa xerab a aborî nikare xwendina xwe bibe sêrî. Helbestên wî di salnameya “Bahara Teze”, kovara “Dostanî”, rojnameyên “Rîya Teze”, “Mêzopotamiya” û “Zagros”ê da, her wiha di kovar û rojnameyên Ermenistan û Rûsyayê da weşîyane. Berhevoka wî ya ewil a bi navê “Keskesora Çiya” ku ji helbest û destanan pêk dihat di sala 2016an da ronkayî dîtîye.<sup>53</sup>

#### Helbesteka wî:

*Heta hebim, te bîr nakim  
Tîm hisreta axa te me,  
Tu buhuştê bawer nakim  
Cihê min hemêza te be.<sup>54</sup>*

---

<sup>51</sup> Boyîk, *h.b.*, r. 470-471

<sup>52</sup> Boyîk, *h.b.*, r. 471-472

<sup>53</sup> Boyîk, *h.b.*, r. 490

<sup>54</sup> Boyîk, *h.b.*, r. 493

### 1.1.28. Babayê Keleş (1948-2014)

Di sala 1948an da li gundê Eynelûyê (Ermenistan) ji dayîk bûye. Li Yêrêvanê Beşa Kurdzanîyê qedandîye. Di salên xwendevanîyê da kurteçîrok û helbestên wî yên bi zimanê Ermenî û Kurdî rojnameyên Ermenistanê da weşîyane. Salên bihûrî firsend dîtîye ku gotar, çîrok û helbestên xwe di “Rîya Teze” da biweşîne. Kurteçîroka wî ya ewil a bi navê “Xaşxaşk” jî di sala 1968an da, di “Rîya Teze” da weşîyaye. Di sala 1983an da berhevoka wî ya kurteçîrokan “Nîşanî” li Yêrêvanê weşîyayaye.<sup>55</sup>

#### Helbesteka wî:

*Min çek hîlneda ber dijminê te,  
Rebê jorîn neda min ew yazî,  
Lê bi qelema xwe ez methê  
Mêrxwes-şihîdê te dikim gazî.*<sup>56</sup>

### 1.1.29. Elîxanê Memê (1948-2016)

Di sala 1948an da li Ermenistanê hatîye dinê. Li Zanîngeha Yêrêvanê beşa filolojî xwendîye. Pirtûkên wî yên helbestan ên bi kurmancî ev in: “Ax û Nan” (2004), “Nûrên Zagrosê” (2008), “Nûranî” (2010).<sup>57</sup>

#### Helbesteka wî:

*Herge xweyî ke  
Mixek nalekê,  
Nal jî hespekê,  
Hesp mêrxasekî,  
Mêrxas malekê,  
Mal jî gundekî,  
Gund cimetekê,  
Welat wê çêbe!*<sup>58</sup>

### 1.1.30. Ezîzê Cewo Mamoyan (1949-...)

---

<sup>55</sup> Boyîk, *h.b.*, r. 455-456

<sup>56</sup> Boyîk, *h.b.*, r. 456

<sup>57</sup> Boyîk, *h.b.*, r. 441

<sup>58</sup> Boyîk, *h.b.*, r. 442

Di sala 1949an da li Ermenistanê hatîye dinê. Fakulteya rojhilatzanîyê xwendîye. Redaktorîya rojnameyên “Botan” û “Axîna Welat” kirîye. Helbest, nivîs û gotarên wî li Ermenistan, Rûsya, Ewropa û Kurdistanê, bi zimanên Kurdî, Ermenkî, Rûsî û Tirkî weşîyane. Helbest û gotarên wî di rojnameya “Rîya Teze” û “Radyoya Yêrêvanê” da weşîyane. Berhevoka wî ya helbestan a bi navê “Karwanên Bêxewiyê” di sala 1998an da li Moskovayê weşîyaye.<sup>59</sup>

### **Helbesteka wî:**

*Ez b' derdê Geliyê Zîlan kewgirîm,  
Ji bo goriyên Agirî ez naliyam,  
Ez ji bo derdê Koçgirî zariyam,  
Û j' bo derdê Dêrsima kevnar...  
Derdê Çarçirayê dilê min hingavt,  
Û derdê Amûd û Qamûşlokê,  
Û kula ewan zarên Helepçê...<sup>60</sup>*

### **1.1.31. Hesenê Hecîsilêman (1951-2015)**

Di sala 1951î da li gundê Taytanê (Ermenistan) ji dîya xwe bûye. Li Yêrêvanê beşa ziman û edebîyata Azerbaycanî dixwîne. Helbest û gotarên wî di bi dehan rojnameyan da diweşin ku hin ji wan ev rojname ne: “Rîya Teze”, “Welat”, “Axîna Welat”, “Golos Kurda”, “Jiyana Kurd”, “Prostor”, “Nûbar”... Di sala 1995an da berhevoka wî ya helbestan a bi navê “Dilê Min” weşîya. Her wiha di salên cuda da berhemên wî yên bi navê “Hesreta Welat”, “Welat Gazî Min Dike” û “Riya Emr” li Almaatayê weşîyane.<sup>61</sup>

### **Helbesteka wî:**

*Derdê'm pir in ketine ser hev,  
Birînen'm kûr in nayêne hev,  
Xelaz nabin jimara dev,  
Ez vî derdî, kê ra bêjim?!<sup>62</sup>*

### **1.1.32. Çerkezê Reş (1955-2008)**

---

<sup>59</sup> Boyîk, *h.b.*, r. 463-464

<sup>60</sup> Boyîk, *h.b.*, r. 466

<sup>61</sup> Boyîk, *h.b.*, r. 483-484

<sup>62</sup> Boyîk, *h.b.*, r. 484

Di sala 1955an da li Ermenistanê hatîye dinê, ji êla Şerqîyan e. Hê di xwendevanîya xwe da dest bi nivîsandina helbest û gotaran dike ku di rojnameyên komarê da diweşin. Beşa ziman û edebîyatê dixwîne. Hin berhemên wî yên ku hê neweşîyane ev in; “Zanyariya Bedewetiyê û Çanda Peyvê”, “Serhatiyên Dîroka Wêjeya Kurdî”, “Çavkaniyên Ermeniya Derbarê Kurd û Kurdistanê da”, “Wêjeya Zaroka ya Kurdî” û gelekên din. Pirtûka wî ya helbestan a bi navê “Şoreşa Peyvan” li Yêrêvanê diweşe. Ev berhem paşê ji hêla weşanxaneya Belkîyê va jî bi tîpên latînî diweşe.<sup>63</sup>

#### **Helbesteka wî:**

*Min dixapînin ezman û neynîk,  
Av qebûl nake qeyka ruhê min,  
Gula şabûnê, ax bû minminîk,  
Dike pîrqepîrq gur ber ruhê min.*<sup>64</sup>

#### **1.1.33. Pirîskê Mihoyî (1958-...)**

Di sala 1953yan da li gundê Baysizê (Ermenistan) hatîye dinê. Ji êla Stûrkîyan e. Li Yêrêvanê beşa matematîkê xelas kirîye. Gotar, nivîs û helbestên wî him di rojnameya “Rîya Teze” da him jî di kovar û rojnameyên kurdan û yên Ewropayê da weşîyane.<sup>65</sup>

#### **Helbesteka wî:**

*Ji Cizîra Botan heya Lalişê,  
Meydana Borê Memê Alan e,  
Nikarin siyar kin Zîn-Xatûnê,  
Hewlêrê heya Cizîra Botan e!*<sup>66</sup>

### **1.3. Helbestvanên ku helbestên wan di kovar û rojnameyan da weşîyane**

Di êwra Kafkasyayê da çawa ku hin helbestvanan derfet dîtine ku berhemên xwe biweşînin hin helbestvanan jî ji ber sedemên sirgûnî, warguherî û ji ber şertên desthilat û heyata wî çaxî keysa xwe lê neanîne ku berhemên xwe biweşînin. Em ê di

<sup>63</sup> Boyîk, *h.b.*, r. 341-343

<sup>64</sup> Boyîk, *h.b.*, r. 346

<sup>65</sup> Boyîk, *h.b.*, r. 486

<sup>66</sup> Boyîk, *h.b.*, r. 487

vê beşê da jî behsa wan helbestvanan bikin ku mecala weşîna berhemên wan çênebûye.

### **1.3.1. Ehmedê Mirazî (1899-1961)**

Ehmedê Mirazî di sala 1899an da li gundê Tûtekê ku bi ser Gîyadîna Qerekilîsê va girêdayî ye, hatîye dinê. Li ba Mela Kakaşêx dixwîne, li ba wî hînî xwendin û nivîsandinê dibe. Di sala 1937an da Ehmedê Mirazî dişînine Moskovayê ji bo xwendinê. Piştî xwendinê vedigere Ermenistanê di nava miletê xwe da gelek xebatên çandî dike ku hin ji wan ev in; nivîsandin û lîstina şanoyan, nivîsîna helbestan, çêkirina kilaman û hwd. Helbest û kilamên wî di rojnameya “Rîya Teze” da diweşin. Di sala 1935an da şanoya wî ya bi navê “Zemanê Çûyî” diweşe. Di sala 1961ê da li gundê Yêxêgnûtê (Qamûşlû) diçe emrê xwedê. Piştî mirina wî di sala 1966an da pirtûka wî ya bi navê “Bîranînêd Min” diweşe.<sup>67</sup>

### **1.3.1. Baxçoyê Îsko (1912-1987)**

Di sala 1912an da li gundê Qizilçiyê ku qezayeka Qersê ye ji dayîk bûye. Pêşiyê derbasî Ermenistanê paşê koçberî bajarê Tilbîsê dibin. Helbest, destan û gotarên wî di gelek rojname û kovaran da bi zimanê Kurdî, Rûsî, Gurcîkî weşîyane. Di sala 1963yan da pirtûka wî ya bi navê “Kurd li Pişkavkazê” bi zimanê Gurcîkî weşîyaye.<sup>68</sup>

### **1.3.1. Egîte Qadirî (1928-1996)**

Ji eşîra Birûkan e. Lêkirinên wî, di berhevokên efrandinên nivîskarên Kurdên Ermenistanê û rojnameya “Rîya Teze” da weşîyane. Berhema wî ya helbestan neçapkirî maye.<sup>69</sup>

### **1.3.1. Mecîte Silêman (1932-2018)**

Di sala 1932an da li gundê Semekaşê (Ermenistan) tê dinê. Ji sala 1961ê heta sala 1990î di Radyoya Yêrêvanê da dengbêjî û kilambêjî kirîye. Her wiha helbest

---

<sup>67</sup> Boyîk, *h.b.*, r. 172-177

<sup>68</sup> Boyîk, *h.b.*, r. 33-34

<sup>69</sup> Boyîk, *h.b.*, r. 27

nivîsandine. Helbestên wî di rojname û kovarên Rûsya, Ermenistan û Qazakistanê da hatine weşandinê.<sup>70</sup>

### **Helbesteka wî:**

*Wey bedewê, wey bedewê,  
Dilê min de gozel kewê,  
Xewa xûnkelê şîrîn e,  
Hebe behsa min wê xewê.  
Bes e tu min bidî cefê,  
Te ez anîme ber wefê.*<sup>71</sup>

#### **1.3.1. Egîtê Şemsî (1933-2002)**

Di sala 1933an da li gundê Kelekûta tê dinê. Zanîngeha Yêrêvanê da filolojîyê dixwîne. Hê di şagirdîya wî da helbest û gotarên wî diweşin. Helbesta wî ya ewil di sala 1956an da di rojnameya "Rîya Teze" da diweşe. Berhevoka wî ya ewil "Şemdan" di sala 1964an da diweşe. Piranîya berhemên wî neweşîyayî mane.<sup>72</sup>

### **Helbesteka wî:**

*Ez ê hildim gopalê xwe terkeseî dinê bim,  
Heta çevê'm rê bibire li pey huba jinê bim,  
Herke cîkî dem-demistan gopalê min bimaşe,  
Ez ê îcar çalepînga...bêjim dilo, wa baş e.*<sup>73</sup>

#### **1.3.1. Ahmedê Gogê (1937-2003)**

Di sala 1937an da li gundê Şamîranê (Ermenistan) tê dinê. Beşa ziman û dîrokê xelas dike. Ji radyoya Yêrêvanê ra gotaran dinivîse û devîdevî çardeh salan dixebite û serokîyê dike. Hin helbestên wî di salnameya nivîskarên kurd "Bahar"ê da diweşin. Berhema wî ya bi navê "Dengê kal-bavê me" di sala 1997an da li Yêrêvanê diweşe.<sup>74</sup>

#### **1.3.1. Vanîkê Elîxan (1942-...)**

---

<sup>70</sup> Boyîk, *h.b.*, r. 108

<sup>71</sup> Boyîk, *h.b.*, r. 109

<sup>72</sup> Boyîk, *h.b.*, r. 435-438

<sup>73</sup> Boyîk, *h.b.*, r. 440

<sup>74</sup> Boyîk, *h.b.*, r. 418-420

Di sala 1942yan da li gundê Qundexsazê (Ermenistan) hatîye dinê. Piştî xwendina dibistanê Ziman û Edebîyata Kurdî da dixwîne. Paşê di Enstîtuta dersdarhazirkirinê ya bajarê Yêrêvanê xelas kirîye. Di rojnameya “Rîya Teze” da xebitîye. Helbest û gotarên wî di rojnameya “Rîya Teze” da hatine weşandin.<sup>75</sup>

### **1.3.1. Îşxanê Eslan (1947-...)**

Di sala 1947an da li gundê Çobangermezê (Ermenistanê) ji dayîk bûye. Beşa ziman û dîroka Îranê qedandîye. Di sala 1965an da dest bi nivîsandina helbestê kirîye û bi dehan (hetta ew bi xwe dibêje 100î zêdetir) helbestên wî ji hêla hunermendên wek Aram Tîgran, Dîyar, Xelîl Xemgîn, Delîl û gelekên din va di radyoya Yêrêvanê da hatine gotinê (weşandinê).<sup>76</sup>

### **1.3.2. Cemalê Ûsiv (1956-...)**

Di sala 1956a li gundê Dihanê (Telînê/Ermenistan) çavên xwe li dinê vekirîye. Ji sala 1986an heta 1993yan di radyoya Yêrêvanê para axaftinê Kurdî da berê wek raportor, paşê jî weke redaktor xebitîye. Di nava salan da, helbestên wî di weşanên cur bi cur da weşîyane.<sup>77</sup>

---

<sup>75</sup> Boyîk, *h.b.*, r. 29

<sup>76</sup> Boyîk, *h.b.*, r. 110-111

<sup>77</sup> Boyîk, *h.b.*, r. 28-29

## BEŞA DUYEM

### ÇARÇOVEYA TEORİK Î PAŞXANE: ÎMAJ Î HELBEST

Çarçoveya teorîk a vê xebatê wê ji pênaseya helbest û îmajê pêk bê, em ê dîyar bikin bê ka îmaj di helbestê da çawa kifş dibe û wesfa îmajeka çak digire. Her wiha wê di vê beşê da merheleyên çêbûna îmajan, cûreyên îmajê û nêrînên li ser îmajê jî hebin.

#### 2.1. Helbest

Pênaseyeka helbestê ya ku ji hêla piranîyê va bê qebûlîkirinê tune ye, helbest yek ji wan tiştan e ku li ser wê bi sedan pênase û şîrove hene, em ê jî hewl bidin ku behsa hin pênaseyên curbicur ên helbestê bikin. Bi pênaseyeka besît em dikarin bibêjin ku li hember rûdanên dinyaya maddî û manewî teşegirtina hestên însanan ên li ser kêxiz in. Helbest janreka gelekî kevn a edebîyatê ye ku heta îro jî bi teşe û dirûvên pir cuda va pêkolîyê li “îro” dike. Helbest di nava xwe da dabeşî gelek cureyên naverokî û şiklî dibe. Helbestvanan ji serdemên herî kevn hetanî îro bi gotinên sêhrî, metaforîk û sembolîk hukardariyên çak li ser merivan hiştine, helbest ew cure ye ku me ji zimanê bêruh xilas dike û li hemberî zimanê rojane dicenge û xwe datîne refên zimanê birqok û bedew. Helbet helbest tenê li ser cendekê kaxiz teşe nagire, ji şîr û şahîyan heta straneka dengbêjî, ji tevgereka edebî bigire heta kêlîyeka ku em ne li bendê ne helbest reng vedide û dibe perçeyekî heyata me. “*Di nav cureyên edebî de helbest kevintirîn cure ye ku peywendîyeke bihêz digel mirovan heye û hema bibêje dîroka wê bi qasî dîroka mirovahîyê dûvdirêj û dêrîn e.*”<sup>78</sup> Ergün amaje pê dike ku helbest ji serdemên ewil ta niha cureya edebî ya herî qedîm e ku di herka heyatê ya însanan da cihê xwe yê mehkem diparêze. Her wiha Ergün peywendîya xurt a helbest û netewetîyê jî wiha radigihîne me: “*Hizra neteweyî, bi armanca çêkirina nasnameya neteweyî û destnîşankirina cudatîyên neteweyeke dîyarkirî ji neteweyên dîtir, herî zêde dikare bi rêya helbestê xwe berceste bike. Lewra helbest wek warê kodkirina hestên neteweyî hem dikare peywendîyeke ruhî bi dîroka bavûkalan re çêbike, hem jî dikare ji bo gihîştina armancên paşerojê bibe*

<sup>78</sup> Zülküf Ergün, *Nerî û Helbest-Nerîta Neteweyî di Helbesta Nû ya Kurdî de (1880-1970)*, Weşanên Nûbihar, Stenbol, 2017, r. 40



*çavkanîya çêkirina hest û sozên hevbeş ên neteweyî.*<sup>79</sup> Dîsa Ergün di wê bawerîyê da ye ku hîlbûna hestên netewî û kodên mîletîyê dikare herî rehet bi rêya helbestê xwe dîbar bike, ji ber ku helbesta ku bûye rê-bihorka netewetîyê him dikare xwe bigihîne tarîxa pêşîyan him jî dikare bo dahatûyê bibe perçeyekî erênî yê hestên şîrkî yên neteweyî. *Gotina “Helbest nayê pênasekirinê” têrê nake. Ji ber ku hemû tiştên heyî dikarin bêne pênasekirinê. Di vê rewşê da belkî jî nêzîkbûna herî rast ev gotin e; nabe ku tekane pênaseya temama helbestan hebe ku heta niha hatine nivîsînê. Ev di heman demê da tê wê wateyê jî, ku meriv li benda resenbûna hemû helbestan be. Ser vê meseleye em dikarin bêjin pênaseya her helbestê heye û vê yekê bi xwe ra tîne.*<sup>80</sup> Veysel Çolak jî ber gotinê dixwe ku gotina “*helbest nayê pênasekirinê*” xav dimîne. Ji ber ku tekane pênaseya temama helbestan tune ye ku heta niha hatine nivîsandinê. Çolak dinimîne ku her helbestek xwedîyê pênaseyekê ye. Ji ber ku divê meriv li bendê nebe ku her helbestek orjînal be. *Ser meseleyê, heke ez ê hutil-mutil (teqez) pênaseyekê bînim ser helbestê û heke ez ê di derheqê helbestê da bikevime şikê, ger ez ji wê beled nebin, ez ê tişteki wiha bêjim: Helbest bi rêya gotinên lihevhatî bi şêwazeka hunerî îfadeya bedewîyê ye.*<sup>81</sup> Borges pênaseyeka rûxarkî û têgihîştinbar daye û xwe ji meseleyê filitandîye lê gelek kesên wek wî yên ku di vê qadê da xwedîyê gotinên mehkem in bi şîrove û pênaseyên kompleks mesele kûrtir kirine. *“Bêtir qolinca hebûnekê, şahida jîyanê, awira derûnî, dinyaya efsûnî ya bêjeyan, xwişka mûzîk û ahengê, coşa tekoşînê...bûye di pêvajoya afîrîna her şexsî de. Ya rast jî wisan e; lewra neheqî ye ku helbest ji însafa pênasekê (ta’rîf) re bête hiştin.*<sup>82</sup> Alan îşare pê dike ku pênasekirina helbestê wê ji helbestê ra bibe neheqî, ji ber ku dêhna me dide ser ku helbest ji yekê zêdetir wesf û taybetîyê dihewîne û bûye stargehek ku di xulîqandina berhema her berhemdêrî da.

*“Bêguman di nav vegotinên hunerî de, ya ku ji hemûyan bi eşqtir xwe davêje hîmbêza hêmayê, helbest e. Helbest vegotina tîpîk a hizra hêmayî ye. Ew ne têgeh-ziman e, bi semantîkî pir-qatî ye û çî ye wisa ye, çendîn caran xwendinê, (bi gotina îroyîn ‘mezaxtin’ tûketim) teşwîq dike. Elbet em vê yekê li ser navê razberkirinê*

<sup>79</sup> Ergün, *h.b.* r. 41-42

<sup>80</sup> Veysel Çolak, *Şiir Nedir ve Nasıl Yazılır*, İkaros Yayınları, İstanbul, 2016, r. 7

<sup>81</sup> Jorge Luis Borges, *Şu Şiir İşçiliği, Charles Eliot Norton Konferansları (1967-1968)*, Çeviren: Mukadder Erkan, De Ki Basım Yayın, Ankara, 2006, r. 21

<sup>82</sup> Remezan Alan, *Bendname*, Weşanên Avesta, Stenbol, 2009, r. 279

*dibêjin, nexwe metneke pexşanî jî dikare xwe bi pir-qatî saz bike. Lê helbest, di xulqê xwe de pir-qatî ye. Ew, dema tiliya xwe di nav canê zimanê hevbeş (yê rojane) de digerinê, konvansiyonên wî yên mantiqî û sentaksî pûç dike an jî wan yên “nû” çêdike. Jixwe kokên wê dijmin-biratîya helbest û pexşanî di vê xirecirê de rû dide.*”<sup>83</sup> Remezan Alan dêhna me dide ser ku di nav vegotinên hunerî da ji hemûyan bêtir û bengîtir helbest bi hêmayê ra pêwendîdar û raz û sembol di helbestê da disitirin.

Înce ji berhema *Poetry and Myth* a Prescott wiha neql dike ku *bêguman helbest di esasê xwe da ne ew tişt e ku tê çapkirinê û di rûpelên wê kitêbê da bê liv û tevger tê hiştinê. Helbest ji rêzefikr-hestên ku ji îmajên desthil ên di zêhna xwîner da peyderpey tên, çêdibe.*<sup>84</sup> Meseleya helbestê çapbûn nîn e, helbest divê di nava geşedan û tevgereka gur da bijî û hukardarîyekê li dû xwe bihêle. Helbest ji rêzê-bêjeyên ziha pêk nayê, divê derfeyên asofîreh li xwe nede dadanê, helbest divê meseleya fikrên azad be, wekî din divê li benda vebijêrkeka din nemîne. Helbest di heman demê da resenbûn bi xwe ye û sewa ku helbesta wî nebe qurbanê şêlandin û întixalê divê haj pê hebe ku gilîyên negotî bîne helbesta xwe. *Helbestvan çawa dikare xwe ji dizîyê biparêze, tiştêkî wiha ne mimkun e bi ya min, lê ji bo ku vê dizîyê mînmîze bike dikare serî li çend rêyan bixe: Ewilî divê îmajê xwe baş bikemilîne û li bedena (ferasete) xwe ke, îmajên ku li ser nehatine listinê û nehatine vedanê, ger di xwe da aso û şewqan bihewîne bi xeternakîya dizîyê ra rû bi rû dimîne. Yek jî heman îmaj di helbestên din da bi perspektîfên cuda werine bikaranîne, dibine sembol, yanê helbestkar îmajê xwe di helbesta xwe da kevn dike, li ser vî esasî wê helbestvanên din cil’et nekin ku xwe nêzî wî bikin.*<sup>85</sup> Helbestvanên ku naxwazin bi întixalekê ra rû bi rû bimînin divê nasnameya helbesta xwe çêkin. Ser meseleyê dema em rismeka Ernst an jî Dali dibînin em metaforên ku di rismên wan da veşartî ne dibînin û di çavpêketina ewil da biryara xwe didin ku ev dewsên destên wan in, dema em fotografeka Sebastiao Salgado dibînin bişirînek li ser rûyê me peyda dibe û em hewlên hunerî yên fotografa wî dibînin, risteyên helbesta Berken Bereh eşkere ne behsa rûxandin, çîya, kavil, kovan, evîn, mindal, heyat, kevnarî, tofan, cûdî û

<sup>83</sup> Alan, *h.b.*, r. 280-281

<sup>84</sup> Neql: Özdemir İnce, *Şiir ve Gerçeklik*, Türkiye İş Bankası Kültür Yayınları, İstanbul, 1. Basım, 2001, r. 117

<sup>85</sup> Zafer Acar, *Genç Şaire Açık Mektuplar*, yazarın kendi yayını, İstanbul, 2015, r. 115

metaforên ajalî û nebatî dike û ev bêje edetî li ser wî rûniştine, helbestên Arjen Arî jî gelekî eşkere ne metaforên mêrxas, şer, hez, welat, azadî, bindestî, ax û gelek metaforên ku li dora vê pêwendê di helbesta wî da tesele dibin. Dema em rastî peyvên dibûr, berpâl, hûb-hewes, fêz, qaput-qutnî, zozan, kubar û Elegezê dikevin em dizanin ku dengê Fêrîk olan dide û stranên Ciwan Haco eşkere ne, tembûra Şivan Perwer qolyeyek e di stûyê wî da li ser hunera wî, dema peyvên kilamên Şakiro li ser hev rêz dibin tîm em dizanin ferhenga wî ya fireh û feraseta wî ya hunerî li dar e, heke meriv meseleyê topî ser hev bike meriv dikare bêje resenbûn û xwebûn rê li ber wê dizîyê digire. Metin Altîok di pirtûka xwe ya bi navê *Şiirin İlk Atlası* (Hêwirgeha Ewil a Helbestê) da behs dike ku Ülkü Tamer ji pirsra “helbest çi ye” ra bersiveka wiha dide: *Helbest xeberdarê êgir e, gelacê şewatê ye, çivîka li ser çîyayê volkanî ye.*<sup>86</sup> Metin Altîok paşê şîroveya xwe ya mijara berbehs wiha didomîne: *Nexwe em dikarin bi dilrehetî vê yekê bêjin, helbest hebûneka wisa ye ku meriv nikare bi pexşanê wê îzah bike, helbest xwedîyê şêwazeka sehîner û pêhesîner e, ev şêwaza heyînê xwemalî helbestê ye. Ji helbestekê bo helbesteka din diguhere û nabe ku di xeteka hevpar da bê komkirin û giştîkirinê.*<sup>87</sup> Helbest di pênasayên xav da nahewe û derî sînoran e, helbesta ku bi pexşanê va nayê ravekirinê weke taybetîyeka resen xwedîyê awayekî sehîner e. Di heman demê da pêkan e ku her helbestek jî pênasayeka xweser hilgire ser xwe. Ne hewce ye ku hemû helbest merûzî pênasayeka hişk bin.

Metin Altîok dîyar dike ku Octavio Paz di hevpeyvîneka ku Jean Louis bi wî ra kirîye da ji pirsra “helbest çi ye” ra belasebep bersiveka wiha nedaye; *Pênasekirina helbestê hingî bêjî xeternak e. Di esasê xwe da tiştêkî bi navê helbestê tune ye, encax hozan hene.*<sup>88</sup> Bi vê bersivê mebesta Paz ev e; helbest bi helbestvanê/a xwe heye, ji vê hevokê meqsed ne ew e ku helbest bêyî helbestkar ne tu tişt e lê dîsa jî helbestkar haveyna helbestê çêdike. Helbestek mîrateya rabirdûya helbestkar e û ev mîrate bi lîrîzm, ferheng, zanist û qelema helbestkar va dimeye. Weki ku li jorê jî eşkere dibe pênasaya helbestê him heye him jî tune ye, ji ber ku her kes li gorî aştana zêhn û dile xwe helbestê dinavîne. *Helbest reha wateyê ye, rewşa wê ya rût e, rewşa sade û*

<sup>86</sup> Metin Altîok, *Şiirin İlk Atlası*, Yapı Kredi Yayınları, İstanbul, 2004, r. 12

<sup>87</sup> Altîok, *h.b.*, r. 12

<sup>88</sup> Altîok, *h.b.*, r. 12

tebi'î a hestê ye. Ev jî îmaj e. îmajeka ku ji pêkhatayên sehî û zêhnî û tebeqeyên afirîner şikl girtiye... Helbestvanên ku îmaj di xeta pêjn, çavdêrî û bêjeyê da ditine neheq nebûne. Îmaj di têkilîya helbestî da di nava zimanê helbestî da weke naverok (ezoterîk) cih digire. Ragihandina pêjnê hewcehîya bi bêjeyê mecbûrî dike. Hebûna îmajê bi rapêçîna peyvî diqewime. Yan na ne mimkun e ku meriv îmajeka ku weke afirînerîya zêhnî girêdayî nedîyarîyê ye, bikêr bibîne. Axirî her îmaj bi pêkhatayekê an jî metnekê va têkildar e.<sup>89</sup> Helbest di nava cureyên edebî da yek ji wan cureyan e ku timî di rewacê da bûye. Di tîrbûna hestan da, dilkovanîyan da, hestîyarbûnên herwextî da xwe davêje bext û emana muxataban. Helbest di vê pêwendê da reha wateyê ye. Ev yek jî pêvajoya îmajafirandinê amade dike. Helbestvanên ku îmaj di wê xeta jor a navborî da ditine jî xwedîyê gotina xwe bûne û mafdar bûne. Nabe ku îmaj xwe bispêre rehên rizî û mûxlaq, ji ber ku îmaj di xwe da heqîqetekê dihundirîne û li ser zemînekî qewî hebûna xwe didomîne. *Helbest rêxistineka estetîk, wateyî, dengî, tebi'î, dîrokî û civakî ye. Ê nexwe tebi'î ye ku pergaleka zimanî ye.*<sup>90</sup> Helbest wekî ku Înce jî dêhna me daye ser ji skeleteka bedewî, wateyî, sewtî, xwezayî û hwd. pêk tê ku haveyna wê cehekî ciwan e. *Metneka ku ji ber bêîmajîya xwe nagihîje dilan û berhema fikreka sabîta ku tenê li serê mirov da tê û diçe ji xweşbêjîyê wêdetir naçe. Nikare bigihîje qonaxa helbestê... Helbesta bêîmaj ji nemirîyê bêpar e, qels e. Îlhama ku hilgirê risteya ewil e, bi îmajeka sipî-sax û qewî tê zîl dide û dibe helbest. Ji pêxemberan ra jî wahîy ne bi awayekî xwerû, bi îmaja însanî (Cebraîl) hatîye.*<sup>91</sup> Nivîsa ku xwe li qeraxên îmaj, metafor û qalibên estetîk nexwe wê ji straneka mode wêdetir xwe negihîne tu qonaxan û nebe helbest, belkî bibe parta peyvên rizî. Helbesta bêîmaj nikare zorê li qurnên dûr bike... Acar destnîşan dike ku helbest tebi'eta însanekî da hebe wê ew însan tu carê rê da nemîne û tirsî wî ya nemanê tune be, ew vê meseleya man û nemanê nafikire û ne xema wî ye, ji ber ku di toximê wî da ev behre heye. Yên ku weke helbestvan nehatine dinê jî helbestê di destên xwe da şepirze dikin û hingî bêjî diçerçirînin, yên ku îşligê helbestvanîyê li wan nayê heta dawîya emrê xwe jî binivîsin nikarin îmajên çak derînin. Yek ji meseleya ku di helbestê da li ser tê sekinîne meseleya helbest û temen e: *Heke em ê*

<sup>89</sup> Melik Bülbül, *İmgesel İletişim*, Çizgi Kitapevi, Konya, 2017, r. 67

<sup>90</sup> İnce, *h.b.*, r. 17

<sup>91</sup> Acar, *h.b.*, r. 218

*behsa helbest û temenê bikin, divê em qayîl bin û bipejîrînin ku helbest ne meseleya cuwanîyê ye. Ya duyem jî ev e ku meriv nikare bi têgihîştineka amatorwarî xwe bigîhîne qonax û hedefên dîtir. Esas divê edebîyat di nav dest û lepên civateke amator (naşî) da negevize. Hin helbestên baş hene ku di xortanîyê da hatine nivîsînê. Di bingeha hemû berhemên baş da têkilîyên qewî yên cuwanîyê hene. Lê ji cîhaneka amatorî tu berhemeka mezin derneketîye.*<sup>92</sup> Eroğlu behsa meseleya temen û helbestê dike û di wê qenaetê da ye ku divê şekê xortan neye şikandinê û divê cihana wan a hunerî û xîyalgeha xortan ji hêla mezinan va neye texrîbkirinê. Ji ber ku ev gavên balixî bingeha sûrên xurt ên edebî ne. *Di nava civakên ku zanistên teknîkî bi fire ketine û endezyarîya wê cihê pesnê ye, helbest weke emelekî însanî yê badilhewa tê dîtine...Îfadeya 'xort e, tiştên wiha normal in' vê nêzîkbûnê xulase dike.*<sup>93</sup> Paşê Eroğlu mînaka Şeyh Galip dide û dupat dike ku helbest ne meseleya emr e: *Dema Şeyh Galip dîwana xwe xelas dike hê bîst û çar salî ye. Wexta Husn-u Aşkê dinivîse temenê wî tenê bîst û şeş e, tezebûn û coşa cuwanîya wî û giraniya çandî ya helbesta wî, ew kemilandîye û hevsengandîye. Bi vî awayî cîhaneka poetîk a ku kamilîya merivî naheyirîne hêj di cuwanîyê da pêk tê. Ev dinyayeka poetîk e ku di nava berheman da dizê û digîhîje berhemê.*<sup>94</sup>

Di 'Gösterge Avcıları' ya Mehmet Rifat da (beşa Melih Cevdet Anday) li ser helbestê şîroveyekê wiha heye: *Helbest ew tişt e ku meriv bi bêjeyên jirêzê gotinên efsûnî biafirîne. Em dikarin şîroveya xwe wiha bidomînin; helbest ew e ku meriv bi gotinên berdest imajên veşartî durist bike. Merema min ne ew e ku ez di lêgerîna pênaseya helbestê da bim, belkî jî tu huner nîn e ku bi qasî helbestê pênaseyên cuda hilgire.*<sup>95</sup> Çawa ku li jorê jî kifş e helbest xelasbûna ji dubare û klîşeyan e. Ji bo helbestê divê bêje kirasê edebî li xwe kin û sûra edebîyatê qayîm kin. Helbest berîya her tiştî xwendineka xurt divê, ji ber ku sewa nivîsandinê divê meriv xîyalgeha xwe bi telaşên estetîk dagire. Helbest divê ked û xwêdanekê jî bi xwe ra bîne, jê ra wext, xwendineka kamil, zanîn û teknîkên helbestê lazim e. *Yê ku hewl dide helbestê binivîse jî ewilî divê xwînerêkî keys be. Paşê jî divê xwerû û hêsayê, geremol û*

<sup>92</sup> Ebubekir Eroğlu, *Modern Türk Şiirinin Doğası*, Yapı Kredi Yayınları, İstanbul, 2018, r. 93

<sup>93</sup> Eroğlu, *h.b.*, r.93

<sup>94</sup> Eroğlu, *h.b.*, r.95

<sup>95</sup> Mehmet Rifat, *Gösterge Avcıları*, Yapı Kredi Yayınları, İstanbul, 1997, r. 106

*bêwateyê ji hev veçirîne. Çawa ku ji bo namzetekî nîgarkêşîyê zanîna reng, anatomî, perspektîf, nîrxê rengî, paşê jî hînbûna razberkirinê qaydeyek be, ji bo namzetê helbestvan jî zanîna rîste, îstîf, deng, lihevanîn, xaze, qafîye û pîvanê ew qas qayde ye...*<sup>96</sup> Helbest di nava xwe da dikeve nav pêvajoya guherîn û werareka wateyî û paşê ji hêla zanistîya berhemdêr a îmajî va di xwîner da dikemile. *Merivê modern û helbestvan ê ku nîrxên wî yê xwegirtî û bîngeha zîmanê wî hejîyaye, li hember rewşên nû ku leqayî wan hatîye, hewl da ku îmaj û derfetên vegotinê yê cîyawaz bibîne. Bi vî awayî peyvên ku kevneşopî û helbesta kevneşopîyê bi tu awayî li wan ne qayîl e û tu wextê wan peyvên nahewîne hatine rex hev. Bi vî şiklî îmajên top-teze yê ku temsîlkarên rastîyên nû ne zîmanê helbestê veguhestine serenceka din.*<sup>97</sup> Bi domana demê merivê modern û helbestvanê ku nîrxên wî yê westar û kelama wî hejîyaye li hemberî qewamên nû yê dinê dikeve wê telaşê ku vegotin û hilmeka teze ra aşîna bibe. Bi vî yekê va peyvên ku nikarin li rex kevneşopîyê bisitirin têne ser hev û îmajên nîp î nû yê ku berdevkê rastîyên teze ne zîmanê helbestê arasteyî serborîyeka din kirine. *Ji bo têgihîştina helbestê pêdivî pê heye ku meriv hewl bide ku mebesta helbestê jî fehm bike.*<sup>98</sup> Eliot di vî hevokê da meyla wê yekê da ye ku bi me bide zanîne helbest tenê ji nivîsînê pêk nayê, helbest bi rêzîkirina peyvên va sînardar nîne, divê meriv vî hewldana nazîk hîn be û merem û mebesta wê jî fehm bike, helbest karê serwextî û seknekê ye, helbest gelek tiştan di hundirîne ku yek jê têgihîştîneka zelal e, yanê divê meriv haj bi armanc û merema xwe hebe.

Tevî ku her tişt nabe helbest, helbest dikare weke mijar ji gelek tiştan sîd werbigire, hêjayî behsê ye ku em dikarin bêjin helbest dikare her tiştî bi hundirîne. *Helbest ji bo dekora filolojîk di her şertê da bi çavê melzemeyekî li her tiştî dinêre; ji her tiştê ku rastî wê tê, ji her tebelayê û ji her qewamê ra...*<sup>99</sup> Ser meseleyê helbestek dikare hêz û îlhama xwe ji cendekê pîrpironekekê heta binîkê cixareyekê, ji qewameka radîkal heta duçerxeyekê, ji qelîştêkên rûyan hetanî rêhildana qurçe av, ji wîzîniya bayî heta gelek rûdan û vegotinên mînimîl ji xwe ra qada hebûnê bibîne.

<sup>96</sup> Sennur Sezer, *Şiir Gündemi*, İnsancıl Yayınları, İstanbul, 2016, r. 31

<sup>97</sup> Mustafa Kurt, *Çağdaş Türk Şiirinde Modernizmin İmgeleri*, Çolpan Kitap, Ankara, 2018, r. 29

<sup>98</sup> T.S.Eliot, *Edebiyat Üzerine Düşünceler*, Çeviren: Sevim Kantarcıoğlu, Kültür Turizm Bakanlığı Yayınları, Ankara, 1983, 1. Baskı, r. 258

<sup>99</sup> Vladimir Mayakovski, *Şiir Nasıl Yapılır*, Rusçadan çeviren: Alper Çeker, Altıkkırkbeş Yayın, Kadıköy, 2016, r. 22

Helbest zordayîna sînoran e, bêyî ku derdê pênase û navandinekê hebe, helbest mazmazka edebîyatê ye. Lê wekî ku me di destpêka paragrafê da jî mesele anî ser, her tişt nabe helbest, yanê helbest parta peyvan nîn e, sewa helbestê divê feraseteka cuwan û zanista helbestê hebe. *Wer dixûyê ku hunera helbestê hebûna xwe deyndarî du bingehan e ku di tebî'eta însan da hazir e. Ya ewil daxwaza teqlîdê ye ku ev ji ezel va li ba însan peyda dibe. Însan beqî serê qabilîyeta xwe ya teqlîdê ji zindîyên din vediqete û zanînen xwe yên ewil jî deyndarî vê yekê ye. Ya duyem jî hezkirina wan a berhemên teqlîdê ye. Ev jî bi însên va têkildar e.*<sup>100</sup> Bi qasî ku eyan e hunera helbestê hebûna xwe di du bingehan da dihewîne ku di însanî da hazir e. Ya ewilî heyranîya teqlîdê ye, ev yek di roja roj da li ba însanan heye. Însan bi vê teqlîdê va ji zindîyên din vediqete û tecrube û ilmên xwe yên ewil ji vir distîne. Ya duyem jî dîsa li dor însanî teşe digire ku ji meyla însanan a teqlîdê dizê. *Hunera helbestê di hewla berzkirina zimanê rojane da ye, ji ber vê yekê helbestvan ew kes e ku fişargoyên bêhemd, heta çemen hevokan û qenalên bêjeyan sererast dike, helbestvanê ku mîmarê zimanekî ye wextê ku hêlîna xwe ya helbestê lêdike, tevî ku di nav zimanê rojane da hin hilbijartinan dike, bi rêya kombînasyona peyvan hewl dide ku helbesta xwe biparzûnîne û bixemilîne. Armanca helbestkarî ya di vê xebata du-cepheyî da krîstalîzekirina helbesta xwe û hêsankirina şîroveya helbesta xwe ye.*<sup>101</sup>

Heke çend pîvanên helbesta baş hebin bêguman du heb jê resenbûn û xelasîya ji tkrarê ye. *Divê helbestvan xwe ji dûbarekirina van îmajên ku hingî hatine bikaranîne bûne benîştê ser devan , maqûlî û çelengîya xwe wînda kirine û kevn bûne, biflîtîne û îmajên nû û resen biafirîne.*<sup>102</sup> Divê helbestvan weke karkerê dîwarekî rast û qayîm hewl bide helbesta xwe qewî bike, xwe ji nerindîyan bihewîne û bi liv û tevgerên bedew hilmeka çê bide helbesta xwe. Helbet şayîkbûn û rewanbûn jî xalên heyatî yên helbestê ne. *Ji bo ku ew tebî'eta xwemal (öz) ku helbestvan di helbesta xwe da pêş dibe, di xwîner da rûhîyetekê biafirîne, şert e ku ev tebî'et di wesfeka pêhesîner da be. Eliot ji vê tiştê ra dibêje 'bersiva objektîf'. Helbestvan ji bo ku cîhana merivî bigîhîne xwîner mecbur e ku bi rêzebûyeran, çîrokan, mijaran va*

<sup>100</sup> Aristoteles, *Poetika*, Say Yayınları, Eski Yunancadan Çeviren: Furkan Akderin, İstanbul, 2013, r. 39

<sup>101</sup> Tarık Özcan, *Şiir Sanatında İmajın Yeri ve Bunun Cemal Süreya'nın Şiir Dünyasına Uygulanması*, Fırat Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi, Ocak, 2013, C.13, 1, 115-136, r. 3

<sup>102</sup> Nurullah Çetin, *Şiir Çözümleme Yöntemi*, Öncü Kitap Yayınevi, Ankara, 2011, r. 88

*bersiva objektîf a qozîya (açı) xwe biafirîne.*<sup>103</sup> Helbest divê xwe li taldeyan bitelîne û xwîneran bihejîne. Helbestvan divê resen be, sade be, xwedîyê gotina xwe be, ji dûbareyên acizker dûr keve, ji ava çemê xwe bixwe, li mêrgeya milletîyê be, ev tiştana rê li ber mayîndebûn û resenbûnê vedikin. Şika me jê tune ye ku qesta Eliot a ji afirandina qozîya xwe ev e.

Di hemû qadan da navên berceste hene ku dêhn timî li ser wan e. *Em çawa dikarin di rismê da Chagall, Chirico, Dali, Max Ernst, Klee, René Magritte, Juan Miro, Picassoû yên din; di helbestê da jî Aragon, Artaud, Breton, Char, Desnos, Eluard, Paz, Prevert, Queneau û Tristan Tzara tune bihesibînin?*<sup>104</sup> Înce dinimîne ku di her qada edebî an jî estetîk da hin nav hene ku mifteya şakarîyê xistine stûyên xwe û pêkolîyê li mayîndebûnê dikin, ev navên jor jî hin ji wan kesan in ku wê rê li ber hostayên din vekin û bi fehm û feraset û zanista xwe ji gelek ra bibine hêwirgeh.

Em ê niha jî weke xulase cih bidine hin şîroveyên giştî yên helbestkar û nivîskarên mezin û bi şîroveyeka hevpar beşa helbestê biqedînin. Veysel Çolak di pirtûka xwe ya bi navê *Şiir Nedir ve Nasıl Yazılır* (Helbest çi ye û çawa çê nivîsînê) da fikr, şîrove û pênaseyên gelek helbestvanan gîhandîye me, ne ku em ê hemû pênaseyên pirtûka navborî binivîsin lê hin pênase û şîroveyên berceste li jêr in;

- Helbestvan him hesp e him jî hefsar e: îlham û karkerî. Ne ku hefsarê bêhesp an jî hespa bêhefsar. (*Tristan Dereme*)
- Prensîba helbestê bêrîkirina bedewîyeka berz a însan e. Ev prensîb bi coşekê, di hîlbûna rûhî da xwe dide der. Ev coş û peroş li derveyî wê heqîqetê ye ku di hiş da dimeye (*Baudelaire*)
- Hin kes di derheqê helbestê da xwedîyê ramanên nîvco-nivîşkan in, hin kesên din ên cuda jî van ramanên nîvco-nivîşkan, nîvco-nivîşkankî fehm dikin. Ev ji bo wan dibe cureyek pênaseya helbestê. (*Breton-Eluard*)
- Hunera helbestê ilmeka sêhrê ye ku kêmasîyan vediguhezîne bedewîyan. (*Aragon*)

---

<sup>103</sup> Cemal Süreya, *Papirüs'ten Başyazılar*, Yapı Kredi Yayınları, İstanbul, 2015, r. 105

<sup>104</sup> İnce, *h.b.*, r. 36



- Pîvana şaşnebar a payebilind a di hest û ramanên miletekî da, berzîya çanda helbesta wê ye. (*Voltaire*)
- Hetanî ku helbestvanek ji vegotina hestên xwe yên şexsî wêdetir neçe, ew ne helbestvan e, hingî ku bizanibe dinyayê ser xwe bihesibîne û vê yekê vebêje ewqasî dibe helbestvan. (*Goethe*)
- Helbest musîqîyek e ku bi fikreka nazenîn ra kelimîye, musîqîya bêfîkr tenê mûsîqî ye; fikra bêmûsîqî jî tenê pexşan e. (*Edgar Allan Poe*)
- Pîrî caran ceribandina helbestvan a gazîkirina girseyeka bilind tiştêkî baş e, heke bikaribe bêyî ku hunera xwe bêqîmet bike di vê yekê da ser bikeve dikare di heman katê da hunera xwe berz jî bike. (*Roger Caillois*)<sup>105</sup>

Ji pênase û şîroveyên jor em pê derdixin ku helbest hingî bêjî di zemîneka berfireh da tê analîzkirinê, heke em şîroveyên li jor komî ser hev kin em ê bikaribin pênaseyeka wiha lê zêde kin; helbest zimanekî taybet ê cuda ye ku di xwe da ligel heqîqetê tevgerike nazenîn dihewîne, divê fehm û feraseteka hesas û zanistîyeke mehkem û hestên dinyaya derveyî li qelem û kaxizî biale, helbest lihevciwîna sêhr, rastî, aheng û dilzîzîyê ye.

## 2.2. Pênaseya Îmajê

Bêyî ku wate û pênaseyeka wê ya zelal hebe em dikarin îmajê bi çend şiklan binavînin; îmaj hîlbûna hestên dinyaya derveyî ya di mêjîyê merivî da ye, veçirîna peyvên vasat û jirêzê ye, di heman demê da filîtîna ji tekrariyê ye. Îmaj ew tişt e ku nivîskar xwelîya mirî ya li ser cendekê nivîsa xwe rake û wê ber bi asoyeke zindî rê bike û bi vê hewlê di naverok û teşeya berhema xwe da şoreşekê pêk bîne.

*Em dikarin îmajê “veguhastina zindî ya ku em bi hestên xwe tê digêhin” binavînin. Di ferhenga tirkî da sewa îmajê ev îfade cih digirin;*

*1- Ew tişt, xewn, xîyal û arezûya ku di zêhna mirov da tê sêwirandinê û qewimîna wê tê xwestinê.*

---

<sup>105</sup> Çolak, *h.b.*, r. 15-18

- 2- *Tiştta ku rengê hişmendîyê dixê ya objeyekê ku ezayên sehekî wan jî derve va tê digihîje. Xîyal an jî wateyên li dor wê.*
- 3- *Bêyî ku hilgirek muxatab be, obje û rûdanên di hişmendîyê da zil didin. Xîyal, îmaj.*<sup>106</sup>

*Bi bikaranîna xwe ya herî derbasdar û hewîner, îmaj sêwirandina me ya zêhnî ya di derbarê tişteki da ye. Ev wêne, kopî an jî sêwirandina ewil a ku bi rêya ezayên sehekî hatiye bidestxistin, di hişmendîya sêhrî û nixumandî da kifş dibe. Bi kurtasî dema cîhana derveyî, heyînek, tişteki rastî yan jî der-rastî yan jî bûyerek di zêhna mirovî da tê sêwirandinê ev dibe îmaj.*<sup>107</sup> Metin Cengiz fikra xwe ya di derbarê îmajê da wiha didomîne; *Heke meriv dêhna xwe baş bidê îmaj di heman katê da rêyeka agahî-hilîner e. Lê hewce pê heye ku meriv îmajê -wek ku Avner Ziss jî di heman boçûnê da ye- jî sêwirandinê veqetîne. Li gorî Ziss îmaj bibîrxistina hunerî ya heqîqetê ye (evocation). Wek ku di paşxaneyê hunermend da çikîyaye, tabloyeka ramanî (ideal) ya cîhana objektîf e û wek encama vê jî hêla xwîner, bîner an jî guhdêr va tê serwextbûnê. Sêwirandin jî xwe mîna objektîfbûna fikra hunerî nişan dide û dihêle ku ew bi ezayên sehekî va bê têgihîştinê.*<sup>108</sup> Cengiz bi me dide zanîn ku heke meriv bala xwe baş bidê, îmaj rêya agahî-standinê ye, lê îşare pê dike ku îmaj û sêwirandin jî hev cuda ne. Cengiz destnîşan dike ku îmaj rengvedana hunerî ya heqîqetê ye lê sêwirandin weke objektîfbûna fikra hunerî tê kifş û bi çav û guh û bêvilê va tê fehmkirinê.

*Heke em di derbarê îmajê da lêkolînên ku hatine kirinê û nêrînên berdest binêrin, em ê bi dilekî rehet bikaribin bejin orjînalîte di îmajê da xaleka heyatî ye. Bi vê rayê em dikarin bêjin helbest bêyî îmajê û îmaj jî bêyî helbestê nabe. Li ser vê yekê hêjayî behsê ye ku îmaj mazmazk û kirasê serdest ê helbestê ye. Di helbestê da îmajafîrandin hunereka wisa ye ku xîyalperestîyeka mezin, zanistîyeka mehkem bo teknîka helbestê, hêza sêwirandinê û afirînerî divê. Xususîyetên şexsî û xwemalî yên îmajê jî hene. Ji vana ya herî girîng orjînalîte ye. Ev orjînalîte bi başbikaranîna*

<sup>106</sup> Mustafa Karabulut, *İmge ve Cumhuriyet Dönemi Türk Şiirinde Su İmgesi*, Journal of Turkish Language and Literature, Volume:1, Issue:2, Autumn, 2015, r. 66

<sup>107</sup> Metin Cengiz, *İmge Nedir*, Şiirden Yayıncılık, Ankara, 2014, r. 7

<sup>108</sup> Cengiz, *h.b.*, r. 9-10

*peyv an helbestkarî va pêwendîdar e.*<sup>109</sup> Ji gotinên Melek Çetinê kifş dibe ku yek ji pêkhateya herî heyatî ya îmajê resenî ye. Heke meriv wê resenîyê neparêze wê ji helbestên dişibin hev wêdetir tu tişt dernekeve. Her wiha skeleta helbestê îmaj e. Helbet afirandina vê îmajê bi hin tiştan pêkan e; hêza texeyûlê, zanîna teknîkî ya helbestî, xîyalgeheka tije û xelqeyên eleqedar ên din. *Ez qîmeteka mezin didime îmajê. Ji ber ku bi hemû pirsgirêkên helbestê ra (şiklî, şewazî, naverokî û hwd.) tekilîyên nêz û jidil saz kirîye, yek ji pêkerên herî girîng ên helbestî yên ku bi qasî ku mohra xwe li helbesta hozanekî xistîye, mohra xwe li helbesta welatekî jî xistîye pergala îmajê ye, divê îmaj weke hêmana herî heyatî ya kesayet û nasnameya helbestî were hesibandin, ez vê fikrê da me. Mîna biharatên ku dikevîne xwarinekê û tehma wê diafirînin, ne kêr, ne zêde: di hedê xwe da.*<sup>110</sup> Înce di wê qenaetê da ye ku îmaj serederîya hemû kêşeyên helbestê dike ku di nav da şikl û naverok jî hene. Ya ku dihêle berhemdêrek bi qasî ku li axa ku zîl daye deng daye li dinyayê jî bibe dengê berz, îmaj e. Înce dîyar dike ku divê îmaja ku li helbestê hatîye reşandinê di radeyeka wisa da be ku meriv pê aciz nebe, yanê divê di hedê xwe da be.

*Îmaj hazingava hemû zenginîya xwe radest neke jî, divê di çavpêketina ewil da eleqeyeka balkêş tesele bike. Divê gazî coş û zêhna xwîner bike...Îmajeka baş ew e ku di xîyalgeha xwîner da xelboqeyên bibîrxistinê (association) saz bike.*<sup>111</sup> Îmaj ku dînamîzm, geşedan û werara helbestê ye zû bi zû wê potansiyel û dewlemendîya xwe radest neke jî divê hukardariyeka baş jî li ser xwîner pêk bîne. Divê yekser li hemberî statîkbûnê be û tevgerekê çêke, her wiha yek ji meseleya eslî ya îmajê teserûfa wê ye. Îmaj ku merheleyên geşedana xwe pêk anî divê xwîner jî xîyalgeha xwe û hêza sêwirîna xwe çalak bigire û bi wê ferasetê tehmê ji helbestê hilde. Özdemir İnce li ser têkilîya îmaj û rastîyê ji agahîyên Boris Suçkov neql dike; *Kîjan îmaj dibe bila bibe binyada wê “rastî” ye. Ev tebi’î ye, ji ber ku huner cureyek zimanê taybet e ku meriv ji serdemên ewil heta niha pê xeber didin; çawa ku peyvek hingî bêjî ku têgeheka ku wê bi ruh bike tune be ew peyv jî nabe, hunera heqîqî jî nikare îmajekê ji naveroka wê bi xwe, yanê te divê bila qada xwezayê da, te divê qada fikr û hestên*

<sup>109</sup> Melek Çetin, *Cumhuriyet Dönemi Türk Şiirinde Gül İmgesi*, Fatih Sultan Mehmet Vakıf Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü, Yüksek Lisans Tezi, İstanbul, 2013, r. 9

<sup>110</sup> İnce, *h.b.*, r. 22

<sup>111</sup> İnce, *h.b.*, r. 30

*însên da -ku ev jî bi qasî cîhana maddî bi xwe ye, perçeyekî rastîyê ye jî- pêwenda wê ya ku bi tiştêkî dîyar ku weke objektîf hebe dûr dixê.*<sup>112</sup> Özdemir İnce radigihîne ku çî cure îmaj dibe bila bibe çavkanîya xwe ji rastîyê digire, İnce şîroveyên xwe li ser wê pêwendê didomîne: *Di şêwaza vegotinê da, ku bi îmajan mişt e pêwendîya edebî qadeka pir-rehendî (hyperdimensional) vedike. Bibîrxistinên ji zimên wêdetir, pîvanên jor-wateyî, peyama ku pêkhatayên metnî ya di nav honaka pir-tebeqeyî ya wateyê, wê atmosferê amade dikin ku dê wate pê berfirehtir be.*<sup>113</sup> Awayê vegotinê ku bi îmajan va dagirtî ye li ser zemînê edebî qadeka pir-alî vedike û bi bibîrxistin û bikaranînên zimanî ên serkeft û hwd. dihêlin ku bingeş û wate berfirehtir be.

Di pêvajoya kemilîna berhema hunerî da di nava xwîner û berhemdêr da kontaktek çêdibe. *Dema zimanê edebî ji hêla nivîskar/hunermend va tê çêkirinê, ziman ji hêmanên hunerên xwe sûd werdigire. Îmajan bi kar tîne. Xwîner jî tevî ku karê xwendin û şîroveyê çalak dike, hewl dide vî zimanê hunerê ku saz bûye û honaka îmajî çareser bike.*<sup>114</sup> Wextê ku nivîskar, hunermend an jî berhemdêr zimanê edebî çêdike, ziman ji kokên xwe dermale dibe û ji hunera xwe sûd werdigire û serî li îmajan dide. Xwîner jî di vir da erka lebtokbûn û çalakkbûnê hildide ser milên xwe û mijara ku bi van hewldanan li holê ye bi çîroksazîyê safî dike. *Îmajên ku sentezeka ziman, peyvberî û temaşeyê (viewing) ne hemû şêweyên medyayê komî ser hev dikin. Tevî ku îmaj îfadeyên îzolekirî yên di navbera gelek îfadeyan da nîn in, helbet bi tenê bireser an jî nîşane jî nînin.*<sup>115</sup> Îmajên ku ji ziman, peyvberî û dîtîne pêk tîne hemû awayên medyayî didine ser hev. Ligel ku îmaj îfadeyên tenê yên di navbera gelek îfadeyan da nîn in, di heman demê da weke bireser an jî nîşane jî dernakevine hemberî me.

*Îmaj ew têgeh e ku rîsm û wêneyên di zêhna mirov da ne ku tesîrê li wate û binyada helbestê dikin û bergehêka cuda didine helbestê. Di avabûna îmajê da çavdêrîyên derveyî yên helbestvan, hestîyarîya hunermendî hêza xîyalê ya hunermend û pêwendîyên ku di nava objeyan da saz dike derdikevin pêş. Helbestvan*

<sup>112</sup> İnce, *h.b.*, r. 53

<sup>113</sup> Bülbul, *h.b.*, r. 21

<sup>114</sup> Bülbul, *h.b.*, r. 91

<sup>115</sup> Ron Burnett, *İmgeler Nasıl Düşünür?*, Metis Yayınları, Çeviren: Güçsal Pusar, İstanbul, 3. Basım, 2018, r. 31

*ji çavdêrîyên xwe sêwrên nû pêk tîne. Ew sêwirandinên bi vî awayî pêk tîne reng û rûçikekî resen dihewînin.*<sup>116</sup> Wêneyên ku di zêhna me da tesele dibin îmaj in û ev îmaj bandorî li wate û bingeha helbestê dike, Çêbûna îmajan bi wan şertên navborî yên jor pêkan in. Helbestkar ji dîtînen xwe şayesandinên nû pêk tîne û bi wan şayesandinan resenî û xwemalîyek dihewe. Her wiha Karabulut di gotareka xwe ya din (Tevfik Fikret ve Cenap Şahabettinin şiirlerinde Melankoli/Keserkûrî di helbestên Tevfik Fikret û Cenap Şahabettin da) da ji agahîyên xwe vê yekê neql dike: *Îmaj ew sêwirandinên zêhnî ne ku, helbestê ji jirêzêtiyê difilitîne û dewlemendiya wateyê ya helbestê xurt dike. Helbestvan bi îmajê derfetê dide xwîner ku xwîner bikaribe xwe bigîhîne cihana wî ya hundirîn. Helbestvanê ku ji hêza peyv û îmajan sûdê werdigire, xîyalên xwe direşîne helbesta xwe.*<sup>117</sup> Îmaj zevîya metaforan e ku helbestvan tovên hestên xwe lê direşîne û mehsûla xwe hildide. Ya ku îmajê ji klîşetîyê rizgar dike û rehên wê bi wateyên kûr têr dike jî îmaj e. Her wiha îmaj navgîna navbera berhemdêr û xwîner e ku, xwîner dikare xwe bi van îmajan bigîhîne xîyalgeha helbestvan. *Îmaj bi wateya xwe ya herî derbasdar ew tişt in ku hest û wêneyên di zêhna xwîner an jî guhdar da pêk tîne, hildiberin û tîne xêzkinê. Îmaj di çavê xwîner da çêkirina wêneyên resen û balkêş e. Îmaj ew tişt e ku îdraqên ku helbestvan ji cihana derveyî raçav dike, temaşe dike, hîs dike, şexsen bi xwe dijî û bidest dixê, di zêhn û xîyalxaneyê xwe da -tevî ku bigîhîne watedarîyekê- çêkirina rismeka lihevhatî ye. Îmaj ew tişt e ku ya ku dixûyê ji taybetmendîyên wî yê dixûyê bifilitîne (razberkirin), îmaj ew e ku tu wan dehfi kêlekekê bikî, ji wan ra kirasekî teze bifesilîn...*<sup>118</sup> Nurullah Çetin destnîşan dike ku îmaj liv û tevger û rism in ku di mêjîyê xwîner da zindî dibin. Îmaj çavdêrîyên cihana derveyî ya helbestvan e ku xwe digîhîne bitûneka watedar. Îmaj hinekî jî kojandina zêdehîyên li ser helbestê ye. *Îmaj bi wateya xwe ya herî rûxarkî tê wateya dîtîne, têgeheka dîtbarî ye, heyîneka xûya nîşan dide...Îmaj çi ye? Divê ev pîrs bê pîrsînê; divê ew dijwarîya ku xwe di binê hêsaniya vê pîrsê da vedişêre derkeve me'derê. Heke em her îmajê weke dîmenekê qebûl bikin jî gelo her dîmen îmajek e? Têgeha îmajê xwedîyê du bikaranînen cuda*

<sup>116</sup> Karabulut, *h.b.*, r. 65

<sup>117</sup> Karabulut, *h.b.*, r. 66

<sup>118</sup> Nurullah Çetin, *h.b.*, r. 87

ye ku yek di felsefe û psîkolojîyê da ya din jî di teorîya hunerê da derbasdar e.<sup>119</sup> Orhan Koçak balê dikişîne ser ku îmaj dîmen e û tiştêkî dîtbarî ye, her wiha îmaj di qadên cuda yên weke psîkolojî û felsefeyê da bi wateyên cuda jî têne bikaranînê. Orhan Koçak dîyar dike ku Pierre Reverdy di sala 1918an da îmajê wiha dinavîne; *Îmaj afîrîneka xwerû ya zêhn e. Ji berawirdekê wêdetir, ji du rastîyan dizê ku kêmezêde dûrî hev ku li hev sîwar dibin. Pêwendîya di nav du rastîyên ku li hev hatine sîwarkirinê çiqasî rast û dûrî hev be wê îmaj jî ewqasî xurt be, wê tûndîya wê ya hestîyarî û heqîqeta wê ya helbestî jî ewqasî zêde be. Bi wî awayî hesta ku tîr dibe weke helbestî xwerû ye, ji ber ku ji hemû teqlîd û telmîh û berawirdîyê azadtir welidîye...*<sup>120</sup> Orhan Koçak nîşan dike ku îmaj kiryareka hişî ye, îmaja ku ji muqayeseyê nawelide û jê derbas dibe, xwe davêje bextê du rastîyên kêmezêde dûrî hev. Ev têkilîya ku di nav van her du rastîyan da pêk hatîye çiqasî rast be û ji hev dûr be îmaj di wê radeyê da qewî dibe. Şerta çakbûna vê meseleyê li ser vî esasî ye.

Orhan Koçak di berhema xwe ya bi navê *Îmgenin Halleri* (Rewşên Îmajê) da ji Ezra Pound arasteyî me dike: *Bîr (memory) îmaja hemû tiştî ku tê digîhîje di xwe da dihewîne. Tiştên ku bi têgihîştinê têne bîrê li vir tîrê depokirinê û wextê ku dor tê, derdikevine holê. Hingî ku îmaj zêde dibin hinek diçine paşxaneyê. Ev, ew îmajên ku berê hatine girtinê ne, îmajên nû li pêş in û bibîrxistinên wan bi lez in.*<sup>121</sup> Îmaj heçî tiştê ku tê digîhîje di xwe da vedişêre, bireserên ku bi vê fehmê têne hefizyê li vir kom dibin û wextê ku dora wan tê xûya dibin. Li ber zêdebûna îmajan hinek diçine paşxaneyê. *Îmaj sêwirandinên sêbjektîf ên bûyerên cîhana objektîf in, hostatîya helbestvan ji vê şewqvedan û sêwirandinê tê. Sêwirandinên jirêzê û yên weke wê nikarin îmajên qewî vejînin. Sêwrên klîşe (cliche) û îmajên ku kopîya rastîyê ne, muhîm nîn in...Jîyana ruhî û bedenî ya helbestkar çavkanîyên îmajên wî ne. Îmaj objektîfbûna fikra hunerî û 'bi pêjnê têgihîştin' e.*<sup>122</sup> Îmaj fikirîn û hilberînên zêhnî yên sêbjektîf in ku di qewamên cîhana rasteqîn da rastî me tîr. Ji bo afirandina îmajê

<sup>119</sup> Orhan Koçak, *Îmgenin Halleri*, Metis Yayınları, İstanbul, 1995, r. 42

<sup>120</sup> Koçak, *h.b.*, r. 46

<sup>121</sup> Mustafa Küçüköner, *İmge ve Bellek İlişkisine Bir Bakış*, Atatürk Üniversitesi Güzel Sanatlar Fakültesi dergisi, Sayı:12, 2005, r. 79

<sup>122</sup> Himmet Uç, *Ahmet Kutsi Tecer'in Şiirlerinde İmajlar*, Elektronik Sosyal Bilimler Dergisi, Bahar, 2015, j:12, c:3, r. 2

divê mirov derîyên xîyalgeha xwe bide zorê. Sêwrên jirêzê ku em di jîyana rojane da zêdecaran leqî wan tênê nikarin bibine berdevkê îmajên çak û mayînde.

*Îmaj dişibine almastan ku di esasê xwe da karbon in. Vegotinên kartêker in ku tevî ku gotin in ji gotinan wêdetir in û merivan rasterast tesîrdar dikin...Divê neye jibîrkin ku mantiqeka hundirîn a îmajê heye. Yan na wê îmaj bi hêsanî veguheze pûçîyekê. Lê were bibîne pûçî û îmaj du têgehên ji hev cudatir in. Îmaja ku mazmazka helbestê ye kanîya dilîne ya şîyarker û tevgerîner e ku bi tebî'eta hestîyar a însên ra guncav e. Li hember bêwatebûn û tevlihevîya pûçîyê, îmaj mantiq û wateyeka taybet dihewîne. Hûn dikarin îmajê bidoşin lê hundirê pûçîyê vala ye.*<sup>123</sup> Her îmaj li dor mantiq û zelalîyekê pêk tê, heke îmaj ev yek nehewandiba wê ji dilqekî pejmûrde wêdetir neçûya, wekî ku di mijara jor da jî behs dibe îmaj û rizîbûn an jî pûçbûn dûrî hev in. Li hember alozîya absûrdê îmaj, mantiq û remz û wateyên taybet dihundurîne. Îmaj bi bereket e û meriv dikare fêdeyê jê werbigire lê bi rêyên aloz meriv nikare xwe bigîhîne mirazê xwe. Îmaja ku di nava helbestê da veşartî ye carna wisa derdikeve pêşîya me ku em pê heyrê dimînin ku ev peyv çawa li kêleka hev in. Ser meseleyê dema em dibêjin “bişirîna bayê” em sifreyê ji îmajekê ra radixin, ji ber ku ev peyv di heyata me ya rûtîn da ne li dar e, nayê bîra me ku em van peyvan li hev bînin an jî hewcehîya bi vê yekê nahesin, sedema vê yekê bêpeywendî ye, yanê di telaşa me ya rojane da an jî di dîyalog û axaftinên her-wextî da em leqî vê bikaranîne nayên. Lê dema em bêjin rûyê bayê yê ku dibiriqe, em wateyeka wê ya helbestî çêdibe, lewra ev îfade derbirîna telaşeka estetîk e û di xwe da rastîyeka taybet a sûbjektîf dihewîne.

*Divê helbestvan bi qasî ku dizane helbestê bibiriqîne, divê bizanibe helbestê di nava helbestê da bihelîne jî. Lazim e neyê jibîrkin ku tu helbest nîn e ku bi îmajan va mişt bin. Lewra hewce pê heye ku helbest hilmê bide û bistîne. Helbesteka ku bi îmajan va dagirtî dibe helbesteka ‘tisî’. Ya rastî ji helbestbûnê derdikeve...Di helbesteka baş da îmaj weke dilekî ye ku xwîne berdide helbestê û dîsa bi xwîne tijî dibe. Ger pêwendîyeka wiha di nava îmaj û bêjeyan da neye avakirîne reng e ku îmaj jî helbest jî deste xwe ji wê nirx û jîyanê bişon...Taybetmendîya herî heyatî ya îmajê*

---

<sup>123</sup> Altiok, h.b., r. 14

li gorî bingeha xwe lebtokbûna (dynamic) wê ye. Ji ber ku îmaj beroşeka hest û dilînan e ku gelek wate bi ahengekê li rex hev tê da dikelin...Lebtokbûna îmajê neynika lebtokbûna mûxayîleya (îmajînasyon) însan e.<sup>124</sup> Divê helbestvan haj pê hebe ku helbesta xwe nevéje nava gêrdawa rengdêrên hişk û qalibên klîşe û îmaja pir tîr. Lewra hewcehîya helbestê heye ku bi nîyet û daxwazên rasterast xwe bilivîne û nefesê hilde. Divê helbestkar rê li ber veke ku xwîner di helbesta wî da bîra îmajan bike, ev jî bi eyarkirina îmajan va pêkan e. Helbestvanên cuwan avê gelekî tev li xercê dikin, ev yek jî -wek ku îro jî meseleyeka derbasdar e- dibe sedem ku bêwesfbûn û qedirnezaniyek li meydana be. Heke helbestekê da meriv tansiyona îmajê baş eyar bike xerîdarê wê helbestê jî gelek in, pêkan e ku bi îmajên çak, zimanê resen û bicîhbûna bêjeyan pêkolîyê li mayîndebûnê bike. Jixwe heke helbestkar van yekana pêk neîne wê wan almastên biqîmet ên destê xwe ber bi bayî bixe. Yek ji meseleya din a îmajê dînamîkbûna îmajê ye, îmaj ne tiştêkî westar e. hewce pê heye ku meriv helbesta xwe bi taybetmendiyên navborî bibiriqîne û li ser sifreya edebîyata mayînde raxe, merema me ya ji şayîkbûnê ne ji hêla rûxarkî va ye, ji hêla binyadî û naverokî va ye.

Zanista îmajê her çiqasî nîspeten di edebîyata me da term û têgeheka nû be jî di van 20 salên axirîyê da bi metaforên xurt, hêmanên xiyalî û derasayî, sêwirandinên rewan û kûr, hewlên nû û vegotinên qalibşikên rê li ber vebû ku qada helbestê xwe bigihîne qonaxên dîtir. Îmaj hewl û cehdeka estetîk e ku di afirandina wê da zanîn radizê. Ev zanîn jî xwe dispêre îlhamê. *Îmaj şewazeka zanîne ye...Îmaja di helbestê da şewazeka têgihîştinê ye ku xwe dispêre keşf û îlhamê, ji ber wê ye ku îmaj mîna tesewûfê li ba me bûye xwedayane.*<sup>125</sup> Ahmet Güntan meseleya îlahbûna îmajê wiha ronî dike: *Pirsên ku em ji bo îmajê dipirsin hema hema nêzîkî wan pirsan e ku em ji bo xwedê dipirsin, ka bala xwe bidinê; gelo divê em bawerîya xwe bi îmajê binin? Gelo divê em wê înkâr bikin? Birastî jî îmaj heye yan ji derewekê wêdetir tiştêk nîn e?*<sup>126</sup> Güntan meseleya îlahbûna îmajê li dor pirsan ku bo xwedê têne pirsînê zelal kirîye ku ger meriv bi baldarî lê hûr bibe wê maf bide Güntan. Îmaj ji ber razberbûna xwe pêkolîyê li van pirsan dike. *Îmajeka ku bi peyvê nehatibe rawekirin di esasê xwe*

<sup>124</sup> Altîok, *h.b.*, r. 17

<sup>125</sup> Ahmet Güntan, *Ûyot*, Yapı Kredi Yayınları, İstanbul, 2006, r. 136

<sup>126</sup> Güntan, *h.b.*, r. 138



da wekî îmajekê nayê hesibandin. Îmajeka wisa encax di mêjîyê kesekî da weke aşopî (nebuloz) disekine: rewşeka ku sînor, hundir, naverok, bergeha wê nediyar be...<sup>127</sup> Özdenören dîyar dike ku divê îmaj bi peyvê were temsîlkirin û zindîkirinê, yan na wê ev îmaj weke îmaj neyê qebûlkirin, tiştêkî wiha encax wê di mêjîyê kesekî da weke rewşeka jêçûyî û xîyalî be. Dîsa Özdenören di heman kitêbê da wiha dibêje: *Nivîsek çiqasî bi hurgilî û hewîner be bila bibe, di wê nivîsê da tiştêkî ku kê mabe (kêmbûna wêne an jî dengekî) tune ye? Dema rewş ev be, her nivîs jixweberî naguheze îmajekê? Îmajek jî encax xwe biqasî şarezabûna wî kesê ku xwe nêzî îmajê dike, xwe pêşkêşî xwendinê nake? Ez di wê qenaetê da me.*<sup>128</sup>

Wekî ku me berê jî behsa vê meseleyê kiribû di helbestê da resenî binyada îmajê ye. Bo nimûne peyvên gav, xîyal, parzemîn û dil di jîyana me ya rojane carna leqî me tîn, em van peyvana her tim nebe jî carna bi kar tînin, ev peyvana bi tena serê xwe tu telaş û hêzeka estetîk nadine me lê em ji van peyvana risteya “Gav dikim parzemînên dilê xwe yên xîyalî ku tim tu serdest î” birêsin ev kêf û tehmeke baş dide me û wê gavê em noqî bin behra estetîzmê dibin. Ev tişt jî çawa ku li jorê behs bibû bi lîstina peyvana û başbikaranîna qalib û metaforan va têkildar e. Helbestvan çiqasî ji gencîneya dinyaya xwe ya xîyalî pêşkêşî kaxîzê ber xwe bike û xerckirina metafor û qalibên edebî da merd be wê ewqasî mayînde û serkeft be.

Îmaj bi texeyûla însan û bercestekirina hêza hunermend û qewimînên dinyaya derveyî va têkildar e. Yanê hunermend an jî berhemdêr li gorî hêza xwe ya estetîk bûyerên ku dinyaya derveyî diqewime di aşana xwe ya zîhnî da dihêre û li gorî vê telaşa estetîk berhema xwe diafirîne, berhema ku tê ber destan senteza van her du hewldanan e. *Helbest bi îmajan ava dibe, bêyî wê tu tişt nayê vegotinê. Ne felsefe ne jî tiştêkî din.*<sup>129</sup> Di vir da cihê mehkem ê îmajan tê vegotinê û qîmeta wê ya heyatî xuya dibe. *Îmaj di esasê xwe da wate ye. Piştî wateyê ye. Yekeya helbestê ye lê bi tena serê xwe jî qîmeteka wê heye ne tenê amrazek e.*<sup>130</sup> Tê dîyarkirinê ku îmaj wate bi xwe ye û pêkhatiya heyatî ya helbestê ye lê bêyî ku ihtiyaca wê tiştêkî hebe jî dikare bi serê xwe hebûna xwe bidomîne.

<sup>127</sup> Rasim Özdenören, *Yazı, İmge ve Gerçeklik*, İz Yayıncılık, İstanbul, 2011, r. 26

<sup>128</sup> Özdenören, *h.b.*, r. 116

<sup>129</sup> Ece Ayhan, *Dip Yazılar*, Yapı Kredi Yayınları, İstanbul, 1996, r. 74

<sup>130</sup> Ayhan, *h.b.*, r. 76-77

Navgînên razber ên mîna gotin, wate û heyecanê bi derfetên zimên va xîyalên şayîk û sêwirandinên estetîk berpêşî xwîneran dikin û dekoreka çak diafirînin. Îmaj di helbestê da bizmarek e ku perçeyan digîhîne hev û xizmeta ahengeka naverokî û şiklî dike. Wekî ku di helbestê da li dar e, di qad û karên din da jî îmaj berbehs e. *Îmaja ku derçûyîna herî eşkere ya çêkirina wêneya razber e, yek ji wan teknîkan e ku di hewla pêşkêşkirineka qewî ya naverokê da ye. Zanyar tiştên ku dîtî bi te'bir û têgehên disepîne; filozof bi pêşniyaz û mûqayeseyan şîrove dike; helbestkar jî bi îmajan hewl dide ku nîşan bide, pêşkêş bike û bide hîskirinê.*<sup>131</sup> Îmaj di berhemên da xwe dide zorê ku wê berhemê li gor telaşa estetîk bigîhîne cihekî, hebûna îmajê sewa vê yekê ye. Armanca îmajê balkêşî û zerafeta berhemê ye ku di nezera xwendekar da pêk tê. Îmaja ku bi çavdêrî û hilberînên helbestvan hil dibin bi xîyalgeha wî ya dewlemend va digîhîjine hev û bitûnîyekê pêk tînin. Sartre feraseta Spinoza ya di derbarê îmajê da wiha berpêşî xwendekaran dike: *Îmaj dilzîzîya bedena însan e; rasthatin, pêvebûn û xûy jî çavkanîyên pêywendên nav-îmajî ne. Bîranîn jî ji nû va vegehrîna heyatê ya dilzîzîya bedenê bi xwe ye.*<sup>132</sup> Îmaj derçûyîna hestîyarî û dilzîzîyê ye, taybetîyên jor ên navborî jî têkilîya hundirîn ên îmajî ne. Xatirat an jî bîranîn jî ji nû va vejîna hestîyarîya laşî bi xwe ne. *Îmaj hêmana herî heyatî ye ku di nava rêkûpêkîya rojane ya zimên da jê ra wesfa bêjebûnê dide qezençkirinê. Helbestvanên xurt ên ku di cîhana sêhrî ya hunerê da ne esse xwedîyê cîhaneka xurt a îmajê ne jî...Potebyna îmajê weke teşegirtina şiklekî fîzîkî ya evîne dinasîne, psîkolojî jî îmajê weke temsîliyeta tiştêkî ya di zêhna merivî da (sikûmekî ku ji nû va afirîye) weke xatiratekê û weke dewsa fikr û hestekê ya rabirdûyê dinasîne. Perre jî îmajê weke tecrûbeyê ku bi rêya pêjnê bi dest dikeve, pêşkêşkirina bi rêya zimên dinasîne.*<sup>133</sup> Tarîk Özcan destnîşan dike ku îmaj bingeha helbestê ye, îmaj jî mîna helbestê gelek pênasayan dihevine û bi gelek awayan tê nasandinê. Dîsa Tarîk Özcan ber şîroveyê dixê ku îro-ro kêşeya herî mezin a îmajê ya lêkolînên edebîyatê ew e ku nayê zanîn bê ka îmaj çî ye û çî nîn e. Özcan hewl dide ku vê kêşeyê ji makaleya bi navê "Edebi Tenkitte Îmaj İncelemesinin Yeri ve Bu Metodun Shakespeare'nin Romeo ve Juliet Oyununa Uygulanması" (Di rexneya edebî da cihê lêhûrbûna îmajê û di şanoya

<sup>131</sup> Nurullah Çetin, *h.b.*, r. 86-87

<sup>132</sup> Jean Paul Sartre, *İmgelem*, İthaki Yayınları, Çeviren: Alp Tümertekin, İstanbul, 2009, r. 16-17

<sup>133</sup> Özcan, *h.b.*, r. 3

Romeo û Jûliet a Shakespeare da sepandina vê metodê) ya Engin Uzmen çareser bike;

1- *Teşbîh, mecaz, îstîare, cinas an jî peyvzanînên (listikên li ser peyv) din.*

2- *Şexsandin û nîvşexsandin ku ev bedena lêkera ku tevî fikreka razber hatîye bikaranîn bi tesîra hereketê edetî ji nû va qezenç kirîye.*

3- *Atif.*

*Em dikarin îmajên jêr ku ji aliyê lêkolînerê eleqedar va -ji xeynî îmajên helbestê- weke îmajên dramê hatine senifandinê jî tevî senfandina îmajên helbestê bikin.*

4- *Dubarebûna hin peyvên ku fikren cuda di nav berhemê da didomîne û heke hewce bike van fikran berhev bike.*

5- *Rengdêrên ku girîng in an jî dû ra girîngîyê bidest dixin.*

6- *Ji aliyê tarîx û coxrafyayê va cihên ku bûyer lê diqewimin û îstîfadeya navên taybet ên cihên dûr û xerîb.*

7- *Şexsekî sembolik.*

8- *Bikaranîna hin kereste û melzemeyên ku hin têgehên manewî bi bîr bixin.*

Her wiha Tarık Özcan wiha dibêje; *em dikarin van xalên jêr jî li vê listeya E.Uzmen zêde bikin;*

a- *Lêkanînên (harmonisation) ji edet der.*

b- *Îstîfadekirina ji wateyên duyem (yan anlam).*

c- *Bikaranîna peyvên ku qîmeta hestiyarî pê va hene.*

d- *Bikaranîna peyvên ku bibîrxistinên dûr bîne bîra mirov.*

e- *Berawird*.<sup>134</sup>

Lîsteya E.Uzmen jî dirêj e lê em bi van xalên sereke va sînordar dikin.

Tarîk Özcan dîyar dike ku meriv dikare bi rêhnûmayîya lîsteya jêr ku ji ravekirinên me yê heta vê derê pêk tî senifandinekê bike ku kêmasîyên vê mijarê kêmtir bike;

- 1- *Tabîgirtineka babetî (thematic) ya îmajê.*
- 2- *Bûyîn an nebûyîna resenî an jî gerdişîya îmajê û ravekirina bi sedemên wê.*
- 3- *Bê ka îmaj xîtabî hiş dike yan xîtabî ruh dike.*
- 4- *Rawekirina statîkbûn an dînamîkbûna îmajê.*
- 5- *Ji hêla ezayên sehekî va xîtabî kîjanê dike?*
- 6- *Gelo bi çi tê çekirinê? Şibandin, îstîfare, bibîrxistinên ji edet der, şexsandin, dûbarekirin û hwd.*<sup>135</sup>

Dîsa li gorî ku Melek Çetin ji Mitchell neql dike, Mitchell îmaj weke 5 xalan senifandîye û kategorîze kirîye;

- 1- **Îmajên Grafîk:** *Rism, peyker, sêwirandin.*
- 2- **Îmajên Optîk:** *Dîmen, projeksiyon, bergeh.*
- 3- **Îmajên Têgihanî:** *Pêzanînên pêjnî, cure, fikr.*
- 4- **Îmajên Zêhnî:** *Xewnî, xatirat, fantazî.*
- 5- **Îmajên Gotinî:** *Metafor, teswîr.*<sup>136</sup>

### 2.2.1. Merheleyên Çêbûna Îmajan

- 1- *Helbestvan dinyaya xîyalî raçav dike.*

---

<sup>134</sup> Özcan, *h.b.*, r. 4

<sup>135</sup> Özcan, *h.b.*, r. 7

<sup>136</sup> Neql: Melek Çetin, *h.b.*, r. 21

- 2- *Ew hêmanên ku helbestvan bi tégihîştin û serwextbûna xwe çavdêrîya wan dike li gorî xwe hîlbijartin û destjêbardanê dike.*
- 3- *Di hişmendîya xwe da bi hestîyarîya helbestvanekî di nava van da cîyawazî û pêwendîyan saz dike.*
- 4- *Resmeka razber çêdike ku watedar be û heyr û metelîyê bide.*
- 5- *Vê resma resen bi awayekî hukardar, balkêş û rîtmîk tîne zimanî.*<sup>137</sup>

### 2.2.2. Cureyên Îmajê

Xebatên senifandina îmajê di serdema antîk da dest pê kirine. Zanyaran, ferq xistine navbera îmajên sirûştî û îmajên çêkirî. Li gor vî tiştî îmajên sirûştî, di encama sî û vebêyînê da derdikevin holê. Îmajên çêkirî ji aliyê mirovan wek wêneyan pêk tên.<sup>138</sup> Teorîsyen René Wellek û Austin Warren radigihînin ku îmaj wiha têne kategorîzekirinê: Îmajên xemlîner, îmajên noqbûyî, îmajên hov, îmajên tundrê (radîkal), îmajên tîr, îmajên berfireh û gur, îmajên berbelav.<sup>139</sup>

- a- Îmajên Hov:** *Pêkan e ku em bêjin ev feraseta îmajê di afirînerîya helbestî ya ewil a benîadem da dikare bê dîtîne...Ferasetên vê îmajê ji kûrahîya subjektîf a merivî bêpar in...Yekbûneka çêkirî (ne tebi'î) pêk tînin. Bêjeyên li rex hev têne danîne, bi vê feraseta îmajê tu wextê nikarin bibîrxistineka hestîyar û ramanî pêk bînin...*
- b- Îmajên Xemlîner:** *Ev îmajana ji hêla bêparîya zerafeta helbestê va dişibine îmajên hov. Bi dilrehetî dikare bê gotîne ku ev şibandinên hoveber in. Ji naverokeka ku ji hêla giştî va tê bikaranîne bêpar e û ew cure şibandin in ku kûrahîya sùbjektîf di wan da tune ye, ev cure îmaj çîroksazîyekê dixine helbestê jî. Ya girîng ew e ku meriv rê li ber veke ku îmaj bi kêrî tişteke bê, yanê meriv pêwenda ziman û dîyardeyê çêke. Ev jî bi bibîrxistinên hukardar û mayînde va pêkan e...*
- c- Îmajên Gur:** *Bi anîna cem-hev a bêjeyên wate-fireh û qîmeta wan a îmajî heye va têne çêkirîne, ya rast bi bêjeyên va çêdibin ku li hemberî-hev têne danîne. Esas a ku tê kirîne ji berawidîyekê wêdetir ne tu tişt e...*
- d- Îmajên Tîr:** *Meriv dikare vê cure îmajê weke şewaza pêşketî ya îmajî xemlîner bifîkire. Weke çêkirîna rîsm û wêneyekê têne sêwirandîne. Dema ev îmaj têne*

<sup>137</sup> Nurullah Çetin, *h.b.*, r. 88

<sup>138</sup> Roger Acun, *Îmaj di Helbesta Kurdî ya Modern de*, Weşanên J&J, Ankara, 2018, r. 49

<sup>139</sup> René Wellek-Austin Warren, *Edebiyat Teorisi*, Dergah Yayınları, Çeviren: Ö. Faruk Huyugüzel, İstanbul, Eylül, 2013, r. 232

*çêkirinê xwe bi temamî dispêrine dîtbarîyê. Ji ber wê eyan-beyan in. Divê meriv binimîne ku evna sembolik in...*

**e- Îmajên Noqbûyî:** *Ev îmaj xwe dispêre bîrbirinê (telmîh). Ev îmaj bi eşkere wê dinyaya maddî ku bi ezayên sehekî têne fehmkirinê naîne ziman. Ev îmaj bi bêjeyên razber û bi bêjeyên ku bang li binyada fikrî ya însên dikin va têne çêkirinê.*

**f- Îmajên Tundrê:** *Di avabûna vê îmajê da peyv li hemberî hev naêne danînê. Ya rast ev îmaj bi anîna ba hev a peyv an çênabe. Peyvên ku îmajên tundrê çêdikin mantiqî ne. Di vê çîroksazîya mantiqî da kêr-warî tê hesînê. Rast e ku ji ber teknîkî û zanistîbûn û agahî-hewînerîya wan peyv an weke têgeh têne qebûlbûnê...*

**g- Îmajên Berbelav:** *Em dikarin bêjin ku ev cure îmaj dijberê îmajên tîr in, ji ber taybetmendiyên xwe rê li ber helbesta modern vedike, ev cure ji bo helbesta modern derfeteka çak e.<sup>140</sup>*

### 2.2.3. Çend Dîtinên li ser Teorîya Îmajê

Teorîya îmajê wekî ku heta vê beşa xebata me da jî dixûyê yek ji wan meseleyên aloz ên edebîyatê ye ku teorîsyen, rexnegir û nivîskarên edebîyata cîhanê pê serê xwe eşandine û geh bi pênaseyên qebûlbîner geh jî bi nêzîkbûnên xwe yên resen va ev mesele kirine rojeva edebîyatê. Helbet ev cihêbûn ne tenê di meseleya pênaseyê da maye her wiha naveroka îmajê bi xwe da jî hin lihevnekirin hene, îmaj ne tenê di edebîyatê da, di psîkolojî, huner û qadên din da jî mijareka behsê ye. *Em dikarin qebûl bikin ku li pey her cure îmajê maddeyek (element) heye. Ji ber ku xîyala ku dihêle îmaj zîl bide, li dor hebûn an jî dîmenekê saz dibe. Lê qebûlkirina maddeyekê ya li pey her cure îmajê têrê nake ku ev mesele safî be. Ji ber ku ya ku atmosfera xîyalê amade dike -ku di meseleya îmajê da bingeh e- mûxayîle ye. Bachelard dibêje ku îmaj li gorî pêwendiyên xwe li ser çar hêmanên sereke têne senifandinê ku ewna jî ev in; agir, hewa, av û ax. Lê dîsa jî destnîşan dike ku ne pêkan e ku meriv temama îmajan di nav vê senifandinê da lê bikole. Bachelard neçar dimîne ku cureyeka din a mûxayîleyê ku jê ra dibêje “mûxayîleya dînamîk” tev li van îmajên maddî yên navborî dike: Bachelard li dor wê mûxayîleya dînamîk eşkere dike*

<sup>140</sup> Çolak, h.b., r. 131-137

*bê ka ew çar hêman di xîyalan da, di çi radeyê da û çawa digîhîjine hev û bi vî awayî muxayîle çawa ji hêmanên maddî dûr dikeve. Bi vî şiklî van îmajan weke maddî û dînamîk dike du par û vana li gorî taybetmendiyên desthil vediçirîne...Li gorî Bachelard îmaj xwediyê rastîya xwe ye û di cihana wê bi xwe da rastî û taybetîyeka wê heye.*<sup>141</sup> Aktaş dipejirîne ku li pey her cure îmajê maddeyek heye.

Mustafa Karabulut ji Norman Friedman radigihîne: *Pergala Îmajê (imagery) di bikaranîna edebî da hê spesîfîktir, ji îmajên ku di hiş da bi zimên afirîye ra peyaman dişîne; gotin an jî peyvên zimên, an jî tecrubeyên ku bikaribin têgihîştinên fîzîkî biafirînin ra peyaman dişîne, ger bê xwestinê ku xwîner birastî jî tecrubeyên di hişê xwe da bisêwirîne peyaman dişîne, yan jî çavdêriyên sehekî bi xwe ra peyaman dişîne.*<sup>142</sup> Li gorî agahîya jorê îmaj navgîna derçûna derhişmendî ya diltenikîyê ye. Ev rewşa navborî ya ku her kes bi qayîlîyeka mezin lê dinêre bi îmajan dişixule. *Îmaj mijareka wisa ye ku him dikeve qada lêkolînerên psîkolojîyê him jî ya edebîyatê. Di psîkolojîyê da peyva îmajê di hiş da ji nû va zindîbûn û bîrketina heyata têgihîştinbar û sehî ya rabirdûyê ye. Hewce nake ku îllam ev zindîbûn û bîrketin dîtbarî be...Lê wextê ku îmaj tê gotinê divê meriv bi tenê îmaja dîtbarî fehm neke. Tenê îmajên tehm û bêhnê tune ne, di heman kêlîyê da îmajên germê û fişarê jî (îmajên ku ji tevgerên laş û ezayan diwelidin, îmajên destdanê û îmajên empatîyê jî) hene.*<sup>143</sup> Îmaja ku tenê di qadekê da sînordar namîne, xwe li qeraxên edebîyat û psîkolojîyê dixê û di her du qadan da wateyên cuda hildigire, mesela îmaj di psîkolojîyê da ji nû va zindîbûna jîyana têgihîştinbar û sehî ya rabirdûyê ye û lazimî pê tune ye ku teqez ev zindîbûn dîtbarî be. Ji hêla din va îmaj tenê bi tehm û bêhnê va sînordar namîne.

*Di helbestvanên weke Shakespeare, Emily Brante û Poe da -ku hingî bêjî ji hev cuda ne- em dikarin bibînin ku, mekan (pergala 'alavên dikê') behra ku zewqê dide, bahoz, sirûştî dirinde, qesra ku ber ritûbatê wêran bûye, gola kewgirî û hwd. pîrî caran îstîiare an jî sembolek in.*<sup>144</sup> Îmaj hêmaneka wisan e ku xwe tenê naspêre

<sup>141</sup> Şerif Aktaş, *Edebiyatta Üslup ve Problemleri*, Akçağ Yayınları, Ankara, 1993, r. 150-151

<sup>142</sup> Mustafa Karabulut, *İmge Kavramı ve Necip Fazıl Kısakürek'in Şiirlerinde İmge*, Turkish Studies-International Periodical For Languages Literature and History of Turkish or Turkic, Volume:10/4, Winter 2015, Ankara, Turkey, r. 606

<sup>143</sup> René Wellek-Austin Warren, *h.b.*, r. 214

<sup>144</sup> René Wellek-Austin Warren, *h.b.*, r. 216

qadekê, mimkun e ku îmaj hukmî qadên edebî, hunerî, psîkolojîk û hwd. jî bike. Weke ku di helbestvanên navborî da jî dixûyê helbestvanan îmajên xwe yên resen afirandine û kirine metaforên eslî ên helbesta xwe, çawa ku di edebîyata me da, di Fêrîkê Ûsiv da metaforên tebî'etê, di Bereh da dewêsên dîrokê, di Arî da hez û di Savci da polîtîzm dixûyê, gelek helbestvanên cîhanî û cîranî jî qalibên helbesta xwe xêz kirine û hin hêman bo helbesta xwe qorix kirine. Zeynep Sayın bi me dide zanîn ku li gorî Plinius *Îmaj kîngê ku bi tenê xwe temsîl neke, bi xwe neyê temsîlkirinê û taybetmendîya "cihekî ku ji xwe wêdetir ra şandina tiştêkî" ji dest berde wê gavê nirxê hunerê qezenç dike. Ev ew kêlî ye ku îmaj berpêşî nêrînê dibe û ji bo ku nêrînê tatmîn bike bi rêxistin dibe; Plinius ji ber arastekirin û kişkişkirina (kışkırtma) nêrînê û ji ber ku îmajê vediguherîne aştkereka ku meriv jê têr nebe, li hember teknikên zêdebûnê (multiplication) radibe ku xweserîya îmajî har dikin.*<sup>145</sup> Li gorî Zeynep Sayınê sewa ku îmaj qîmeta hunerê bi dest bixe divê ji hin tiştan ferexet bike; ewilî divê bi tenê xwe temsîl neke, bi xwe neyê temsîlkirinê paşê jî divê ji wê yekê bihewe ku ev jî şandina tiştêkî ya ji xwe wêdetir e. *Divê em bi bîr bînin ku dîtin di heman demê da karekî hîlbijartinê ye, ji ber ku tu îmaj tune ye ku jixweberî û rasterast bigihîje merivî...Îmaj encax dema ku bikaribin wek perçeyekî tamamîya rismê kom bibin, dibine xwedîqîmet. Eyan-beyanbûna îmajê her tim nayê wateya fehmê; têgihîştin her demê hewceyî zanîna însan û tevahîya rismê ye...*<sup>146</sup> Cemal Şakar dîtinê wek karekî hîlbijartinê dibîne û di wê qenaetê da ye ku îmajên ku rasterast bigihîjine însanan tune ne...Pir-eşkerebûna îmajê her tim xwe nagihîne encamekê. *Îmaj bi lêkerên kirin û livînê hêzê vediguhezîne qudretê û bi 'qîmetdana' qudretê -bi rewşeka zorlêker, mecbûrî û meşrû- vediguhezîne desthilatê. Îmaj vê veguhezînê çawa pêk tîne? Ji alîyekî va mîna keştîyekê berî avê de, wateyê li hêzê bar dike, ji alîyê din va jî îmaj -bi qanûnî- tê wateya hêzê...*<sup>147</sup> Tery Eagleton di pirtûka xwe ya bi navê *Şiir Nasıl Okunur* (Helbest Çawa Tê Xwendinê) da ji Paul Haeffner van agahîyan digihîne me: *Mûxayîle (imagination) şêwazeka axaftina figuratîf an jî metaforê ye, îmajîstasyon cureyekî zimanê wêneyî ye.*<sup>148</sup> Îmajîstasyon awayekî

<sup>145</sup> Zeynep Sayın, *İmgenin Pornografisi*, Metis Yayınları, İstanbul, Aralık, 2015, r. 37

<sup>146</sup> Cemal Şakar, *İmge Gerçeklik ve Kültür*, İz Yayıncılık, İstanbul, 2017, r. 8

<sup>147</sup> Louis Marin, *İmgenin İktidarları*, Dost Kitapevi, Çeviren: Muna Cedden, Ankara, 2013, r. 16

<sup>148</sup> Tery Eagleton, *Şiir Nasıl Okunur*, Agora Kitaplığı, (Çeviren: Kaya Genç), İstanbul, 2011, r. 223



axaftina sembolîk e û vediguheze zimanekî taybet ê fotografik. Derçûna vî zimanê figuratîf bi telaşa îmajîst va tesele dibe.

Doğan Aksan ji Şklovski neql dike ku: *Peywira îmajê ne ew e ku wê wateya dihewîne nêzî feraseta me bike. Mebesta îmajê zeftkirina dîmena wê ye.*<sup>149</sup> Îmaj ne mecbûr e ku wateya xwe ya hundirîn bigihîne me û li ba me wateyekê peyda bike, an jî erka îmajê ne ew e ku pireyekê di nava rehên xwe û têgihiştin me da ava bike, îmaj cehd dike ku kêlîyê bisekinîne û îmajê zeft ke. *Dema ku îmaj mijareka berz û naverokeka payebilind der dibe (ji hêla pîvana vegotinê û serkeftinê va) nîrxê vê mijar û naverokê nexê, wê bilind bike.*<sup>150</sup> Heke îmaj bikaribe ji bin barê xwe derkeve wê xwe bigihîne qonaxeka qewî û dema li ser derbirîna mûhteva û mijareka çak disekine bikaribe qîmeta wê nexê helbet wê kirasekî nû û mayînde li xwe bike. Îmaj di hemû qadan veguhezîye jênerîyekê. *Hunera bêîmaj, bi taybetî helbesta bêîmaj nabe.*<sup>151</sup> Todorov di hunerê da bi taybetî jî di helbestê da îmajê wek xala herî girîng û jêner dibîne. Divê helbestkar îmajan wek karê xwe yê eslî bibîne ku kêrî binyada helbesta wî bê. *Karê herî heyatî yê helbestvan ew e ku îmajan bibîne ku ji tebî'eta xwe ra hingî bêjî kêrdar, nû û bedew be û vana bi hev girê bide û yekbûnekê saz bike. Ji ber ku îmaj ew hêmanên zindî yên weke masûlke, rehik, reh û ezayên hundirîn in ku çepera (skelet) ewil dipêçe...*<sup>152</sup> Her wiha divê ev îmaj resen, nû û rind bin û yekbûneka berk hebe di nava wan da. Ji ber ku ev gavên ewil in ku helbesteka baş derkeve. Kevin Robins ji Jean Louis Weissberg neql dike: *Îmaj hewl nade ku nûnerîya bireserê bike...Zêdetir nîşan dide, derdixîne holê û dihêle ku hebe.*<sup>153</sup>

Heta niha gelek hunermendên ku xwe qanihî girseyan kirine, teorîsyenên bijarte û nivîskarên payeberz di derheqê têgeha îmajê da gelek tişt gotine, şîrove û analizên şîrikî û ji hev dûr li pey hev rêz kirine. Meriv dikare hê jî ji gelek navên mezin agahîyên îmajê hilde lê wê ev yek mijara me belavtir bike û derî çarçoveya xebata me be. Hingî ji me hat me behsa îmajê kir û hewla me ew bû ku agahîyên me

<sup>149</sup> Doğan Aksan, *Şiir Dili ve Türk Şiir Dili*, Engin Yayınları, Ankara, 2006., r. 30

<sup>150</sup> Aragon, *Çağımızın Sanatı*, Gerçek Yayınevi, Çev: Bertan Onaran, İstanbul, 1966, r. 63

<sup>151</sup> Tzveton Todorov, *Yazın Kuramı*, Yapı Kredi Yayınları, Çeviren: Mehmet Rıfat-Sema Rıfat, İstanbul, 1995, r. 66

<sup>152</sup> Atilla İlhan, *İkinci Yeni Savaşı*, Türkiye İş Bankası Kültür Yayınları, İstanbul, 2004, r. 54

<sup>153</sup> Kevin Robins, *İmaj*, Ayrıntı Yayınları, Çeviren: Nurçay Türkoğlu, İstanbul, 2013, r. 256

dayî sade bin. Piştî beşên pênase û şîroveyên helbestê û teorîya îmajê em ê hewl bidin ku li ser poetîka û îmajên helbesta Fêrîkê Ûsiv bisekinin.

#### 1.1.1.1. Poetîkaya Wî

*Bêjeya “poetîka”yê di teorîya wêjeyê de, bi maneya huner û şî’rîyetê tê bikaranîn. Ev bêje cara ewil ji aliyê Aristo ve wek navê berhemek hatîye bikaranîn.*<sup>154</sup>

Fêrîkê Ûsiv ji sala 1955an heta rojên axirîyê yê heyata xwe bi qelemê ra bûye û kelama kurdî nivîsandîye. Em nikarin bêjin ew di saxtîya xwe da hate qîmetkirinê. Dexesî û çavnebarîya ku di destê desthilên wê serdemê da bû fîrsend nedida ku berhemên Fêrîkê Ûsiv bêne weşandinê û Fêrîkê Ûsiv bê qîmetkirinê. Têmûrê Xelîl wiha behsa vê meseleyê dike;

*Bêguman, Fêrîkê Ûsiv (1934-1997) sedî sed ji helbestvanên Kurdên Sovyetistana berê yê herî navdar bû û cîyê wî yê bilind di nav hemû helbestvanên Kurdên cîhanê de gereke hebûya. Û şikberî tenê di wê de bû, ku ji pey wî re kî ye, yê bi nav û deng? Şikoyê Hesên, Mikayêlê Reşîd, Qaçaxê Mirad, Eskerê Boyîk, Egîtê Şemsî, Simoyê Şemo an yê dinê? Lê ew çawa dibe, ku pirtûkên wî li Sovyetistanê ji hemûyan kêmtir çap bûne û li Ewropayê û Kurdistanê jî hindik çap bûne? Ew ji wê demê, ku yê gelek ronahî dîtine, ji wana gelek sist bûne, an jî ne helbest bûne. Îcar emê dîsa wek her caran ji derd û kulan re bikine qarîn û hewar, ku dijmin nahêle. Hiç eleqa dijmin li vir tune. Eger dijminatî hebe jî, di nav me de ne û sîc yê me ye. Di dema saxtîya wî de hemû helbestên wî çap nebûn. Ewî derd û kulên xwe ji min re digot û dilê xwe ber min vedikir. Gazinê xwe dikir, digot ku berpirsîyarên weşanxaneyê ku pirtûkên Kurdî çap dikin –Casimê Celîl û Karlanê Çaçanî- berhemên wî çap nakin û dewesê de yê xwe, kur û qîzên xwe, xanimên xwe çap dikin, ku bi qalîta xwe ve li ber helbestên Fêrîkê ne tiştek bûn.*<sup>155</sup>

<sup>154</sup> [http://www.rojnameyakurdistan.com/ku/makale/Poet%C3%AEkaya\\_Cih%C3%AE\\_di\\_Hawara\\_D%C3%AEcley%C3%AA\\_de](http://www.rojnameyakurdistan.com/ku/makale/Poet%C3%AEkaya_Cih%C3%AE_di_Hawara_D%C3%AEcley%C3%AA_de) (27.02.2020)

<sup>155</sup> Têmûrê Xelîl, *Ew Ji Cîhanê Bi Xeyd Çû*, Kovara Nûbihar, j: 126, 2014, r. 16

Nêzîkatîya Fêrîkê Ûsiv a bo helbestê ji tebî'eta wî pêk tê. Tevî ku li Yêrêvanê xwedîyê firsendên baş bû û karê wî jî hebû, wî berê xwe da gundê xwe û bû mamosteyê zimanê kurdî û helbestên xwe yê berceste li gundê xwe yanê li Pampa kurdan lê kir. Ji ber ku ew di nava tebî'eteka nûwaze, dîmeneka rengîn û li dora qewm û milletê xwe bû feraseta wî ya tebî'etî, hesreta wî ya welêt, di poetîkaya wî da şiklê xwe digire, helbet di vê şiklgirtina poetîkaya wî da tesîr û fêdeya wergerên wî jî hene. Fêrîkê Ûsiv ji Shakespeare bigire heta Byron, ji Pûşkîn bigire heta Yasenîn û Lermontov gelek werger kirine. Bi van wergeran Fêrîkê Ûsiv firsend dîtîye ku dakeve dinyaya van helbestvanan û bi vê yekê va jî helbesta xwe daîne refên mayîndetîyê.

Emerîkê Serdar di merasîma mirina Fêrîkê Ûsiv da wiha li ber gotinê dixê;

*“Fêrîkê Ûsiv dewraneka teze nava lîteratora me da vekir, dewrana lîteratora rast, dewrana lîteratora milletîyê. Û her binelîkê<sup>156</sup> Pampê gereke xwe kubar<sup>157</sup> hesab ke, weke gundîyê Fêrîk bûye, weke Fêrîk dîtîye, Fêrîk ra xeber daye. Ez nizanîm, milletê me wê pêncî salên din şûnda, sed salên din şûnda, pênsed salên din şûnda yekî mînanî Fêrîk bide yanê nede? Fêrîk mezinîyeka isan<sup>158</sup> e weke me ra kubarî ye. Bi serê Fêrîk lîteratora me gihîşte dereceyeka wisa wekî cimaetên mayîn lîteratora me nas kirin, lê telebext<sup>159</sup> ra, Fêrîk saxîya xwe da qîmetkirina mezinahîya xwe nedît. Gelekan -ez îro bi dilê keder dibêjim- gelekan dilê Fêrîk êşandin, Fêrîk gelekî çerçirî, lema mezinahîya Fêrîk nava wê çerçirandinê wî da bû, mezinahîya Fêrîk nava wan durr-cewahirên wî da bû wekî wê bi qurn û dewranan bêne gilîkirinê, wekî ew bûne xemla lîteratora me, wekî em bi wê yekê mînanî mêtîrika milletîyê destê me da em karin<sup>160</sup> rûkî<sup>161</sup> rûspîtî derên erefê<sup>162</sup> orta milletîyê. Fêrîk durr-cewahirên isa<sup>163</sup> pey xwe hiştine wekî wê her silsiletê<sup>164</sup> ra xeber din û her silsiletêkî bi şêkirdarî<sup>165</sup>*

<sup>156</sup> Niştasih

<sup>157</sup> Serbilind

<sup>158</sup> Wisan

<sup>159</sup> Mixabin

<sup>160</sup> Dikarin

<sup>161</sup> Rûyekî

<sup>162</sup> Meydan, nav millet.

<sup>163</sup> Wisa

<sup>164</sup> Zurîyet

<sup>165</sup> Qedrzanîn

*navê Fêrîk bîr bîne, navê Fêrîk wê her silsiletekî ra çawa navê cahal<sup>166</sup> bê gotinê, çimkî efirandinên wî nemirî ne. Tu tişt nenivîsiya Fêrîk, tenê Ûsivê Nevîya bes bû wekî ew bima nemirî, Ez îda<sup>167</sup> derheqa Xewna Mîrmih da nabêjim, ez îda derheqa hesretdefterê da nabêjim, ez derheqa poêm û şî'rên wî yên mayîn da nabêjim, Ez derheqa pîyêsên wî da nabêjim; Bêgelen. Ez derheqa Dimdimê da nabêjim wekî haqas<sup>168</sup> veçêkiribû, haqa rind veçêkiribû... A mezinahîya Fêrîk vê yekê da bû, a kemala Fêrîk, talanta wî... Merî kare bêje wekî kancara wî vê yekê da bû... lê Fêrîk wan qewlên çetin da, nava gelek xêrnexwazan, pêketîyan da dîsa karibû weke çendik-çend kitêban neşir ke... Fêrîkê hê bê qîmetkirin. Bedbextîya me -dîsa dibêjim- wê yekê da ne wekî me saxtîyê da nikaribû çî ku lazim e bihata qîmetkirinê, gilîyê qîmetkirinê heq derheqa Fêrîk da bihata gotinê, lê wehdê<sup>169</sup> yê gilîyê xwe bêje ez bawer im wekî ewê navê Fêrîk rex navê klasîkê<sup>170</sup> me bê danînê.”<sup>171</sup>*

Emerîkê Serdar, Fêrîkê Ûsiv weke yek ji serkêşên edebîyat û helbesta kurdî-kurmancî dîtîye û di wê bawerîyê da bûye ku Fêrîk hilmeka teze anîye nava kelama kurdî û wê bi hatina zemên ra Fêrîk bigihîje qîmeta xwe ya ku heq kirîye. Her wiha Emerîkê Serdar mohra xwe di bin wê yekê dixê ku wê bi domana demê ra navê Fêrîkê Ûsiv di nava klasîkên kurdî da bê danînê.

Îmaj, metafor, sembol û zimanê figuratîf ê ku di helbestên wî da dixuyên şahidîya wê axê ye ku Fêrîk lê hatîye dinê. Ew heyata ku li Elegezê li dar e di helbestên wî da raxistî ye û meriv dikare bêje edetî vejîna wî ambîyansa wê derê ne. Tevî ku Fêrîkê Ûsiv ji axa bav û kalên xwe dûr bû, dîsa jî henaseya wî miletî bû û digel ku ji pareka mezin a netewa xwe û welatê xwe dûr bû jî her dem di nava kozî û kulfetê xwe da dijîya, bi êşa wan dihesîya, di nav azara miletê xwe da bû û êşa wan di gotin û helbesta xwe da kêm nedikir, wî bi keda destê xwe sûr hildida, mal çêdikir,

<sup>166</sup> Ciwan, nû.

<sup>167</sup> Êdî

<sup>168</sup> Ewqas

<sup>169</sup> Dewr, zeman

<sup>170</sup> Klasîk li vir ne di wateya helbesta klasîk a bi arûz de ye, mebest jê ew e ku berhemên sedsalan û hezarsalan mayînde dimînin.

<sup>171</sup> Ev belgefilm cara ewil di Kurdistan Tv'yê da bi amadekarî û derhênerîya Hesên Şucaî va derketîye, paşê me li ser *YouTubeyê* peyda kir û li ba xwe qeyd kir, vîdeo 19 deqîqe û niv e lê niha li ser *YouTube* an jî internetê peyda nabe. Di vîdeoyê da jina wî Firîda Cewarî, hevalê wî nivîskar Emerîkê Serdar û pismam û hevlingê wî nivîskar Ehmedê Gogê di derheqê Fêrîkê Ûsiv û heyata wî da xeber didin.

zevî û zîyanê xwe diçinî û her dem paleyê mala xwe bû, ev sedem jî dihêlin ku zimanê wî ji yê gel dûr nebe û ew ji hevdu fehm bikin. Zimanê wî yê rewan, sêwirandinên wî yên di cih de, metaforên zelal hiştine ku xwendina helbesta wî zêde be. Fêrîkê Ûsiv di heman demê da, di berhemên xwe da ferhengeka fireh, folkloreka dewlemend, zimanekî figûratîf û sembolîk, helbesteka serkeftî hewandîye ku bi xeteka îmajîst ra pêwendîdar e.

*“Fêrîkê Ûsiv ji mezintirîn helbestvanên gewre ye ku behs û qala mekan û dewrana xwe bi awayekî poetîk afirandîye. Di qurneya<sup>172</sup> bîstem de helbestvanê Kurd ê herî xurt e ku îmajîzma cîhanê bi teql û kêşeya kurdî li kelambêjîya kurmancî cebirandîye. Guhê wî her qasê li ser der û dorên helbesta bilind bûye ku ew tev li çemê gur ê helbesta wî zêde bûne...Helbesta Fêrîkê Ûsiv bi pîvan û ramangerîya şêw û şîreta helbestkarîyeke di asta cîhanê de xwedîyê kamilbûneke bi tena serê xwe ye. Bi her awayî mekan, der, zeman, îmaj û xasma ferhenga wextê xwe zeft kirîye.”<sup>173</sup>*

Di helbesta wî da dîyaframeka xurt heye, her çend weke dîmeneka jirêzê bixûyê jî peyvên wî sêhrekî dihewînin; *Ax dibe binice/Çemê min li van deran/Û neçe negihîje/Tu oqyanos û behran.*<sup>174</sup> Helbestên wî yên ku bûne stran vê dîyaframê dide der. Di helbesta wî da her tişt di nava ahengekê da ye. Helbest kurt an jî dirêj bin jî risteyên wî da mûzîkalîyeka pêhesîner heye; *Memikêd yarê li ser bedenê cotkanî ne/Xalêd sûret mîna konê Kurmancî ne.*<sup>175</sup> Zimanê wî rewan e, helbestên wî sewa civatên berz nehatine nivîsînê, ew helbestvanê dîwanxaneyên maqûlan e, her kes dikare ji wî fehm bike û xwe di risteyên wî da bibîne lê peyvên tirkî (ku bermayîyên koça 1915-1918an in), rûsî, ermenkî û pir in di helbesta wî da. Ev peyvên jî zimanên din êdî bûne malê helbesta Fêrîk û zimanê kurdî. Weke mînak dibêje *qêmîş nakim*, carna dibêje *teyax nakim* an jî peyvên *êpêcê*, *aylix* û hwd. bi kar tîne. Jixwe ev peyv di zimanê me yê îroyîn da jî hene. Yan jî peyvên rûsî û ermenkî li wî gundê hê jî likar in. Zarok ji dîya xwe ra dibêjin *Mam* (mama min li ku ye), an jî peyva *tîvê*, kurdên li Kafkasyayê li dewsa “salê” peyva *tîvê* bi kar tînin; *ew tîva 18an ji Qersê*

<sup>172</sup> Sedşal

<sup>173</sup> Rizgar Elegez, *Di Helbesta Fêrîkê Ûsiv de Mekan: Destpêkek ji bo Helbesta Fêrîkê Ûsiv*, Kovara Wêje û Rexne, j.5, 2015, r. 254

<sup>174</sup> Ûsiv, *h.b.*, r.112

<sup>175</sup> Ûsiv, *h.b.*, r. 50

*hatine*. Mebesta me ya ji van mînanan ew e ku zimanekî sade û sirûştîyane heye. Fêrîk xwe netengizandîye, nexwestîye bi tu awayî ji herka heyatê ya normal derkeve. Helbesta Fêrîkê Ûsiv ya hîsê ye, ziman çiqasî rewan be jî gelek caran peyamdêrîyeka xurt dihewîne û mirov xerqî mîtaleyên kûr dike; *Çima cênîk spî dibin/Ku ne wextê wan e?/Difîkirim, axir cênîk/Li nêzîkî guhan e.*<sup>176</sup>

Helbestvanê ku bi zimanê şivanê gund xeber dide di helbesta xwe da henûnîyekê dihewîne, zimanê wî nerm e û êrîş nake, mijar tûnd be jî dilê xwîner nahêle. Zimanê wî her çiqas sade be jî, ew helbesta xwe bi metafor û îmajan dibiriqîne û zimanekî figuratîf pêk tîne.

*Şik û xumamî berovajî ku bibe qusûrek, sewa estetîkê yek ji hêmana mecbûrî ye. Pir-eyanî sewa xîyalkirinê astengîyek e. Beqî serê xumamîyê berhema hunerî îmajînyonê di xwe da dihewîne. Divê mirov mijarê piçekî tenê bide fehmîkirinê û nîvco bihêle û mûxayîle wê tamam bike. Mûxayîle encax dikare nîvtarîtîya helbestê da hilperike. Divê helbest di firehî û bergeheka wisa da be ku ji şîroveyên cuda ra misaît be. Helbestên herî xweş wateyên xwe ji xîyalên xwîneran werdigirin.*<sup>177</sup>

Her wiha Fêrîkê Ûsiv bi îmajên welatperwerî, xerîbî û sirgûnê jî bi fehm û feraseteka fireh û mebesteka zelal xwe li xwîneran dike mêvan. Gelek caran bêjeyên ku bi mirinê ra rûbirû mane di helbesta wî da têne kifşê û pêkolîyê li mayîndetîyê dikin, biwêj û qalibên ku pir kêmtê têne zanînê û haveyna xwe ji kurdîyeka çê hildidin her tim di risteyên wî da tesele dibin.

<sup>176</sup> Fêrîkê Ûsiv, *Sûretsûfê*, Weşanên Lîs, Ankara, 2012, r. 28

<sup>177</sup> Oktay Yivli, *Ahmet Hâşim'in Poetikası*, Tohum Dergisi, İstanbul, Şubat-Mart 2002 sayısı, r. 35

## BEŞA SÊYEM

### CÛREYÊN ÎMAJÊ DI HELBESTA FÊRÎKÊ ÛSIV DA

Di edebîyata klasîk da bêtir hunerên edebî bûne xeml û şayîkîya helbestê. Îro ro jî di helbesta modern da îmaj derdikevine pêşîya me û di helbestê da reng vedidin. Îro dema meriv li ser wesf û pênaseya helbestê disekine îmaj, metafor, sembol, mît, texeyûl, şayesandin û hin têgehên din dibine mijarên sereke ku em rastî wan tên. Sewa zindîbûn, xurtbûn û mayîndebûna helbestê îmaj rêyek e ku helbestvan serî li wê dide. Bi îmajê hewlên rizî û mirî di xîyalgeha xwîner da vediguhezine rismeka çak î dîtbar.

Modernîzasyona helbestê tenê bi avêtina kafiye û weznê va ne pêkan e. Divê kakilê helbestê biguhere. Modernîzasyona helbesta kurdî bi mijarên nû û bikaranîna amûrên jîyana modern dest pê kirîye.<sup>178</sup> Helbesta kurdî ya modern a Kafkasyayê jî her çiqas xwe bavêje paşla qafiyeyê jî helbesteka serbest e û haj bi îmaj û metaforan heye. Fêrîkê Ûsiv jî di helbesta xwe da gelek îmaj vejandine û terxanî kelama kurdî kirine ku tê da îmajên evîn, wetenî, sirûşt, mirin, polîtîzm û azadîyê jî mewcûd in.

Jîyana kurdan, dîroka wan a ku xwe dispêre kevneserdeman, mîtolojî û rabirdûya kurdan û coxrafyaya mezin û belavbûyî ya kurdan hiştîye ku Fêrîk li ser van mijaran hevîrê xwe hil ke û sînorên sînorder ên helbesta xwe xêz bike. Di bilindkirina parta helbesta Fêrîk da hêmanên folklorîk ên weke biwêj û gotinên pêşîyan, qalibên zimanî ên herêmî, mîzaha rexneyî û ferhenga resen a kurdewar cihekî mehkem digirin û dihêlin ku helbesta wî ji teqlîd û întîxalan bê parastin û ji pilekanên mayîndebûnê berjor bin. Bi taybetî cehdên pastoralî, epîkî û lîrîkî di avabûna helbesta wî da derîyên qayîm ên îmajîst in.

Me di helbesta Fêrîkê Ûsiv da 11 îmajên sereke peyda kirin, di helbesta wî da gelek îmaj jî hebûn ku ji ber kêmbûna hejmarî neketine nava vê xebatê. Bêyî ku em di nav tekrarekê da bigevizin em dikarin bêjin helbesta Fêrîk ji hêla îmajan va hingî bêjî xurt e û dikare rehberîya gelek kesan bike ku di hewla helbestnûsîyê da ne. Em ê

---

<sup>178</sup> Acun, *h.b.*, r. 97

li jêrê wekî ku me kategorîze jî kirîye li ser îmajên navborî yên helbesta Fêrîkê Ûsiv bisekinin.

### 3.1. Îmajên Evînê

Însan li gorî tebî'eta xwe hebûneka hestîyar e, ev yek dihêle ku di însanan da hîsên weke hezkirin, bêrîkirin, nefret, hêrs û hwd. peyda bibin. Di serdemên ewil heta îro-ro însanan hîsên xwe kolane dîwarên şikeftan, qurmên daran, nivîsîne li ser kaxizan û gîhandine îro. Piştî ku helbest weke cureyeka edebî derkete holê û cehda estetîk di helbestkaran da peyda bû, hunerên edebî û îmaj jî bûne hîmên sereke yên helbestê. Edebîyata kurdî ji serdema klasîk heta niha di nava bedewîyeka edebî da bûye. Destpêkirina qonaxa modern va teknîkên nû, zanista helbestê û îmaj bêtir serdest bû û îmaja ku haveynê helbestê ye di kelama kurdî da jî hate dîtinê. Evîn jî yek ji wan îmajan e ku hema bêje di helbesta hemû helbestvanan da heye. Xerîbîya ku sewa yarê vediguhere evînê, negihîştina yarê, şertên dijwar û hezkirin dihêlin ku meseleya îmajê qayîm be û di helbestê da bixûyê. Weke ku di hemû edebîyatên cîhanê da serdest e di edebîyata kurdî da jî îmaja hezkirin û evînê li dar e. Fêrîkê Ûsiv jî yek ji wan helbestvanan e ku meseleya evînê pişt kirîye û anîye nava helbesta xwe, em ê bi mînakên jêrê va îmaja evînê û şîroveya wê îzahî xwîneran bikin;

*Mîna çavê yara min e ev behr,  
Ew qeyîka han - ez im, ez im li ser -  
Ditirsim bayên bêbext li behrê rabin:  
Behr qeyîka min li kenar bavêje der.*<sup>179</sup>

Helbestvanê ku behr şibandîye çavên hezkirîya xwe û qeyîka li ser avê jî şibandîye xwe, bi hewleka pak tirsaxwe ya firqetê jî veder kirîye û bi me daye zanînê ku tirsaxwî ew tirs e ku gefên har li wan bêne xezebê û ew ji yara xwe bibe. Şibandina çak, tirsax cudabûna ji hûbê û xerîbîya nepenî ya di risteyan da hiştîye ku îmaja evînê li me tesele be.

*Ez navê te nadim, ezîzê,  
Vedişêrim wek xezîneyê, defîneyê,  
Wekî kes neyne rêç û îzê,  
Nedize xezînenga evînê:*

---

<sup>179</sup> Ûsiv, *Hesretdefter*, r. 90



*Ez navê te nadim, lê wextê  
Navekî din li dewsê datînim,  
Ji min tirê li ber te û zîyaretê  
Gunehekî giran ez hiltînim.*<sup>180</sup>

Helbestvanê ku sewa kesek li yara wî nehese qêmîş nekirîye navê yara xwe hilde, di heman kêlîyê da sedeqeta xwe reşandîye nava helbestê û li dewsa navê yara xwe hildana navekî din weke gunehê mezîn ê li ber ocax û zîyaretan dîtîye. Sazbûna risteyan da ligel evînê sedeqet û tirs jî heye lê îmajê serdest a helbestê îmajê evînê ye.

*Nazgula li ser beden î tu,  
Îcada zêr - maden î tu,  
Ji min xerîbê bêxweyî re  
Yêr û milk û weten î tu.*<sup>181</sup>

Helbestvan bi şibandinên rû îmajê kûr afirandîye, helbestvanê ku yara xwe şibandîye gula li ser beden an jî zêr û zîvan, di heman wextê da yara xwe jî xwe ra weke welat û sitargehekê dîtîye û bi van şibandinan îmajê evînê saz kirîye.

*Nizanim xayîn î, nizanim bi bext î,  
Nizanim oyîn î, nizanim her wext î,  
Nizanim şibhan î, nizanim alçax î,  
Nizanim nuxsan î, nizanim qibrax î,  
Nizanim li erdê yî, nizanim li esman î,  
Nizanim Xwedê yî, nizanim însan î -*

*Ez jî te hez dikim!  
Ya Rebilalem,  
Ya rehm û kerem,  
Ya nêt û merem,  
Ya şert û qesem,  
Ya xîyal û xem -  
Herdema min.*

*Û gurr e , û gurr e, muhbeta min pîrr e,  
Bi ser te de dixure, bê bend e û bihur e,  
Tijî lal û durr e û hur e, û hur e,  
Xendeqan dibirre, di kendalan dizivire,  
Difire, difire.*<sup>182</sup>

---

<sup>180</sup> Ûsiv, h.b., r. 221

<sup>181</sup> Ûsiv, h.b., r. 223

<sup>182</sup> Ûsiv, h.b., r. 229

Helbestvan di benda ewil da li pey wesf û me'neya yarê digere, di mêjîyê helbestvan da ji bo yarê, rastî-derew, xayîntî-sedeqet û qedr-bêqîmetî li nav hev ketine û negihîştine tu derê, di benda duyem da jî helbestvan tevî van pirs û xumamîyan xwe davêje li ber bext û emana hezkirina yarê û dibêje *ya rehm û kerem* yar hemû saman û sermîyanê min e. Hezkirina bêpayan a ku sewa yarê di helbestvan da peyda bûye tu firsendê nade pirs û muxlaqîyan û di helbestê da îmaja evînê çêdike.

*Min hez kir ji Donayê, Rayîsê,  
Muhbeta Gulnazê başqe ye,  
Begem kir qiseta her qîzê,  
Sowbeta Gulnazê başqe ye.*

*Çûm dêrê, mizgeft û kilîseyê,  
Ziyareta Gulnazê başqe ye,  
Min vekir Qûrana medreseyê  
Tewreta Gulnazê başqe ye.<sup>183</sup>*

Dîsa di vir da em leqî risteyên hezkirin û sedeqetê tîn. Hezkirina bêpayan dihêle ku helbestvan ji xeynî “Gulnaz”a ku evîna wî ye, tu kesî nebîne, Fêrîkê Êsiv qelema xwe bi hibra evînê tijî kirîye û wisa îmaja xwe saz kirîye, hevoka *başqe ye* tam di vir da dikeve me’derê û dibe ravekarê vê yekê; dibe ku di vê dinyayê da jinên bedew, bajarên xweş, gotinên biqîmet an jî bîr û bawerî hebin lê ji vana tu tişt nabine kalam û rengê yarê. Helbestvanê ku tu dinyayê jî bidî destekî wî, wê bizivire li destê din li *Gulnazê* bigere, îmaja evînê durist kirîye.

*Sed qîz û bûk li ber min rêz bin, horiya min naz tu yî,  
Nav û dengê min beyt û karêz bin, eşq û hewes tu yî.  
Mêrga min çilk gul û rez bin, reng û rewaz tu yî,  
Li yêr û welatan padişah ez bim, taca min xas tu yî.<sup>184</sup>*

Her çiqas di helbesta Fêrîk da navên jina gelek bin, helbest sewa gelek jinan hatibine nivîsandine û îmajên erotîk pir bin jî, di nava van gişkan da sedeqeteka gelekî qewî xwe li helbestên wî dixê. Her wekî ku di helbesta jor da jî dixûye helbestvan der dibe ku, ew di nava bi sedan jinan da jî, di navûdengbûna xwe da jî û di desthilbûna xwe da jî ji tekane yara xwe hez dike û li pey wê ye. Îmajên evînê di

---

<sup>183</sup> Êsiv, *h.b.*, r. 233

<sup>184</sup> Êsiv, *h.b.*, r. 271

helbesta Fêrîkê Ûsiv da gelekî tîr in, her çiqas ji bo kes û navên cuda hatibin nivîsandinê jî evîneka pak, sedeqeteka qewî û hesretekê tîr xwe li haveyna helbesta wî dixin.

*Cimaeta min ker-kerî,  
Cimaeta min ber-berî,  
Ax, xwezî li çiya, li banî  
Ez bibûyama cobar û kanî:  
Tu bihatayî ji her yêrî  
Bi hesretî û dilxêrî,  
Te li ser vê kaniya qudret  
Li hev du bikira sibexêrî.<sup>185</sup>*

Di risteyên jor da jî tevî îmajê hezkirinê îmajê bêrîkirinê jî desthil e. Peyva *xwezîyê* derî li hesreta rabirdûyê vekirîye. Di vê hesreta rabirdûyê da jî daxwaza rasthatina yarê heye. Di îfadeyên *ax xwezi, tu bihatayî* û *li hev du bikira sibexêrî* da arezû û dilînên helbestkar li ber çav in. Ev îfade di sazûna îmajên hezkirin û bêrîkirinê da desthil in.

*Min pirs bikî, ez tuneme:  
Ez kilê çavê te me,  
Êmîşê devê te me,  
Ez tor û mircanê te me,  
Gustîlka tiliya te me,  
Qeytana guliya te me,  
Hêkela sîngê te me,  
Xala gerdena te me,  
Rextê bedena te me,  
Min pirs bikî - ez tuneme.<sup>186</sup>*

Helbestvan bi bêjeyên her-wextî va îmajê xwe ya evînê ya resen saz kirîye. Ev îfadeyên ku haveynê mehsûlên dengbêjî ne di risteyên helbestvan da bi awayekî îmajîst tesele dibin û dibine malê îmajê ku bîngeha helbestê ye. Helbestvanê ku xwe di her rewşê da weke meseleya ‘eslî ya yara xwe dibîne di heman demê da li ber têkçûnekê digevize, ji ber ku helbestvanê me dibêje *min pirs bikî ez tune me*. Helbestvan xwe bi yarê ra yek-bitûn kirîye û îmajê evînê saz kirîye.

*Ez di wan çavên te yên sût de  
Erş û esmanan dibînim,*

---

<sup>185</sup> Ûsiv, h.b., r. 301

<sup>186</sup> Ûsiv, h.b., r. 362

*Behr û oqyanosan dibînim*  
*Ez di wan çavên te yên sût de.*<sup>187</sup>

Helbest ew huner e ku meriv bi sekneka tesorûfî derî li wateyên kûr û fikirîner veke, helbestvan bi çarînekê îmajeka çak î pak vejandîye û terxanî kelama xwe kirîye. Helbestkar di çavên *sût*<sup>188</sup> ên yara xwe da îfadeyên bêdawî yên weke erş û esman, behr û oqyanos bi kar anîye û ev peyvên ku temsîliyeta wateyên kûr dikin dibe ravekarê hezkirina helbestvan û îmaja evînê bere-bere tesele dibe.

*Nazgula gundan –*  
*Çayîr û çîmenan...*  
*Kula dilê min*  
*Sal û zemanan...*  
*Hesreta dilê'm*  
*Dîn û harkirî,*  
*Tu rojiya min e*  
*Nefîtar kirî...*  
*Nefesa li ber min,*  
*Çiraya çavê min,*  
*Tu dîn û însaf*  
*Û mesebê min...*<sup>189</sup>

Di vê helbestê da bi rêya şibandîne îmaj kemilîne, helbestvan wekî ku di helbestên wî yên din da jî eşkere ye hezkirineka bêpayan radixe li ser kaxiz. Helbestvan yara xwe weke *kula dilê xwe ya sal û zemanan* dîtîye. Her wiha *tu rojiya min e nefîtar kirî* jî fîrçeta di navbera wî û yara wî da destnîşan dike. Dîsa derbirinên weke *nefesa li ber min, çiraya çavê min, dîn û însaf mesebê min* dereceya hezkirina helbestvan eşkereyî xwîneran dike.

### **3.2. Îmajên Sirûştê**

Sirûşt yanê tebî'et ku ji hemû liv û tevgerên jîyanê da xwe dide der û her gava me da desthil e. Mebest ji sirûştê ne tenê keskahî û dîmênên derve ye, di heman demê da ax û av e, ya herî girîng sirûşt ew hewa ye ku em dihilmijin. Yanê ne bes e ku meriv sirûştê bi çîya û deştan va sînordar bike. Sirûşt tenîya sobeya zivistanê bigire heta rêhildana kêzikekê û ji barana nîsanê bigire heta dengê wawinîya ajalan di

---

<sup>187</sup> Ûsiv, *Sûretsûfê*, r. 31

<sup>188</sup> Gewr

<sup>189</sup> Fêrikê Ûsiv, *Êvara Zivistanê*, Weşanên Lîs, Diyarakîr, 2015, r. 103

gelek deran da me bi xwe dide hesandinê, bi kurtasî meriv nikare bejna xwezayê ra perçeyekê bifesilîne û xwe jê bifilitîne.

*“Yek ji temaya kevn î berbelav ya di edebîyat û xasma jî helbestê de hatîye bikaranîn sirûşt e. Sirûşt gelek caran hiştîye ku takekes li hemberî wê têkeve nav heyran û hejmekekarîyekê. Hunermend ango afirînerê ku haveyna berhemên xwe li ser sirûştê stirandîye, ketîye nav hewldana derevekirina bedewî û tekûzîya wê. Ji ber ku mirovatî ji destpêka xwe ve di nav sirûştê de ye û şahîdê hebûna wê ye, ne mimkun e ku ew pê re neketibe nav danûstandinekê bo berdewamî û xweşkirina jîyana xwe. Belkî jî dikare bê gotin ku ev hestên heyran û metelmayîne kir ku hunermend biafirîne. Ji ber ku edebîyat jî yek ji wan qadên mişt hest û derbirîne bû, çenedibû ku nivîskar xwe ji sirûştê bêrî bike.”<sup>190</sup>*

Fêrîkê Ûsivê ku Kawa Nemir wî weke “tebiyetbêj, helbestkarê çar werzan, çiyayan, belekiyên berfan, beyaniyên di pengbûna xwe de mişt bizav û êvarên hênîk û zozanan û deştan, ba, baran, berf û bagerê, yê hemderd bi ewran re”<sup>191</sup> bi nav dike yek ji wan kesên bijare ye ku di helbesta kurdî da weke helbestvanekî sirûştî tê hesibandinê. Ev hesibandineke hestîyarî nîn e, ji ber ku di helbestên wî da hêmayên weke av, ba, baran, gelî, dibûr, ax, zozan, hewa, şev û hwd. gelekî desthil in. Ev yek jî dihêle ku em wî weke sirûştêbêjekî yekta bihesibînin, ne tenê ev hêma ne ya ku Fêrîk dikê tebî’etbêjekî berceste, di heman demê da vebêjekî rûhî û ahengeka gerdûnî heye di şî’era wî de. Em ê ji vir şûn da li ser helbesta wî ya vebêja tebî’etî bisekinin û bi mînakên va nivîsa xwe bidomînin;

*Quling kişîyan, çiya bi xwe hisîyan,  
Geliyêd kûrîn kirine xuşîn,  
Berf hilkişîyan, av dakişîyan,  
Çem xulxulîn, ewr kimkimîn.  
Kulîlk şîn bûn û dil şa bûn,  
Der û çîman giş bûn zozan,  
Kerî rêz bûn, hevraz hêl bûn -  
Şivan, gavan li çiyê bûn mêvan.<sup>192</sup>*

<sup>190</sup> İnan Eroğlu, *Sirûşt û Fêrîkê Ûsiv*, Kovara Wêje û Rexne, j. 8, 2016, r. 144-145

<sup>191</sup> Ûsiv, *h.b.*, (Kawa Nemir, weke pêşgotin; Agirê Hubê, r. 11)

<sup>192</sup> Ûsiv, *Hesretdefter*, r. 58

Yek ji mijar û îmajaya desthil a helbesta Fêrîkê Ûsiv xweza ye, ji ber şert û mercên cografîk û perîyoda heyata xwe Fêrîk bûye yek ji vebêjê herî pastoral di helbesta modern a kurdî da, di helbesta wî da meriv dikare avên sar ên co û kanîyên Erez û Elegez û Qemerdaxan vexwe, guh bide sewta şivanekî ji welatê xwe dût, here bêriyê û beranberdanê, zengila çelekekê û kalîna pêz û şîhîniya hespan bibîze. Sêwirandinên wî yên xurt ên tebi'î îfadeyên qewî ên pastoral wî di vê sehayê da dike xweyîgotin.

Di helbesta jor da şayesandina tabloyekê li dar e, em dikarin tev li vê şayesandinê bin. Kişîna qulingan, xuşîniya gelîyên kûr, xulxulîna çeman û kimkimîna ewran navgînên sazkirina îmajaya sirûştî ne, her wiha şînbûna kulîlkan, rêzbûna kerîyan jî îmajên sereke yên vê tabloya sirûştî ne.

*Pampa min a baş, Pampa min kubar  
Wê pal vedaye li wan quntarên sar,  
Pamp mîna bûkan, bûka xemil lê bend,  
Li dorê çiyayêd me girtine govend.*

*Çiyayêd me bilind, çiyayêd me kubar,  
Jê dixulxulin co û kaniyên sar;  
Ji şimalê mij tê mîna karwanan  
Di ser çiyayê me re diçe aranan.  
Êvarê bi hewes mij gujeguj e,  
Û di nava mijê de Pamp dihênije;  
Pampa min a sar - gulistan Şîraz,  
Min jê baq kirin gulêd xwe yêd xas.<sup>193</sup>*

Ev helbesta ku yek ji helbesta herî meşhûr a Fêrîkê Ûsiv e ji hunerên edebî yên weke teşbih û şexsandinê îstîfade kirîye, bi bangawazîya sirûştî bîngeha îmajaya sirûştî saz kirîye, peyvên weke çîya, quntar, co û kanî, mij, aran û baqkirina gulan atmosferêka tebi'etî terxanî helbesta berbehs dike û îmajaya sirûştê pêk tîne.

*Mîna roviyê dawetê,  
Ba hat cab da tebiyetê,  
Bax hejiya, got, "bimbarek",  
Erdê li xwe dît tivdarek:*

*Û her tişt bû tundurist,  
Ewran li def û zirneyê xist,*

---

<sup>193</sup> Ûsiv, *h.b.*, r. 83

*Birûsk mînanî siwaran  
Pekiya ber bi beyaran.  
Dûman li bûkê bû xêlî  
Û dakete ser gêlî,  
Hingê erdê û esman  
Hatîn û hev ramûsan.*

*Ji şabûnan ro derket,  
Keskesorê girt govend,  
Teyr û teyreda li vira  
Şabûna dil stira.*

*Li pey daweta pirr giran,  
Li her zozan û aran  
Meh derbas bûn, roj ser da –  
Erd xemilî û ber da.<sup>194</sup>*

Her wekî ku di helbesta pêş da jî xûya bû, dîsa hunerên mîna teşbîh, şexsandin û întaqê pişt dane îmajî sirûştî. Ewr, ba, birûsk, dûman, gelî, keskesor û zozan di vê helbestê da hin peyvên sereke ne ku îmajî sirûştê vedijînin. Wekî ku eşkere ye tebî'et di nava guherîneka her-wextî da ye. Biharê gulên ku dibişkivin havînê we'deyê xwe didomînin û payîzê diçilmisin, darên ku li bihar û havînan bi hemû heybeta xwe, xwe gupevedikin di payîzan da diwestin û di zivistanan da we'deyê xwe tamam dikin. Sewa hemû perçe û qadên sirûştê ev rewş weke çerxekê dizivire û hey dizivire, Helbestvan jî barîna baranê bi hunerên edebî û bi telaşeka îmajîst ku tê da sirûşt di hewe, di nava ahengeka çak da ragihandîye xwînerê xwe. Hatina bayî, hejîna baxî, tivdardîtina erdî, lêdana def û zirneyê ya ewran, pekîna birûskê ya mîna sîwaran, ji şabûnan derketina royê, govendgirtina keskesorê û hwd. vê ahenga îmajîst tamam dikin, ev îmajî îmajî sirûştê ye ku di helbesta Fêrîkê Ûsiv da dixulxule û tê.

*Vê êvara dînc û kerr  
Bala min li esmanê gerr,  
Li çar hewarê berda perr,  
Li çiya û baniyên dûr.  
Va kenar in çiya û banî,  
Erş-esmanî xwe kanî,  
Heyv tas şîrê li navê danî,  
Stêr - xişrên hûr.*

---

<sup>194</sup> Ûsiv, h.b., r. 145

*Wisa xweş tê dengê bê,  
Ji mitalan û hubê  
Hijmekarî, tê qey bê  
Saz e yan bilûr.*

*Rast bilûr e diguje,  
Kanî qey bê dikişe,  
Şîr pêl bûye dirije,  
Ka şivanê nûr?<sup>195</sup>*

Sewa ku îmajî sirûştî pêk bê bes nîn e ku peyvên ku bi xwezayê ra têkildar in hebin, divê ev peyvên ku haveyna îmajî sirûştê ne di nava hewleka îmajîst da bimeyên. Dîsa bi heman şiklî hebûna peyvên co û kanî û çîya têra îmajî sirûştê nake. Divê ev peyv xweş li hev bîn û cehdeka estetîk hebe di gotinan da. Lê çîroka peyvên helbestkar heye di metnên wî da.

*Hûn meskenê gul û geran, gelî û çîya,  
Silav ji we re, seba ji we re, gelî û çîya.  
Zehf geriyame li bêlan û qaşên we,  
Ez jî bûme hogir û taydaşê we.  
Min jî serê xwe minanî serê we  
Daye ber ba, birûsk û bagerên we.*

*We li ber piyên min gul û gîha raxistiye,  
Lê qet çendik û çend birûskan li min xistiye,  
Û keniyame, ez keniyame bi dil û can,  
Mîna gul û sosinên we yên tor û mircan.*

*Hûn dê bûne, hûn dê bûnê, ez - dergûş,  
Li hafên we firîme wekî qereqûş,  
Û min daniye li nava konên Kurmancî,  
Bûme bengiyê qîza bikur e tûncî.  
Dota Kurdan hiş ji min biriye, gelî û çîya,  
Min li sîngê we muhbet kiriye, gelî û çîya,  
Avliheyat min ji we vexwariye, gelî û çîya,  
Her sal hûn ê vegirin hêşîn, gelî û çîya,  
Û ez ê jî wekî we bijîm, gelî û çîya?<sup>196</sup>*

Pareka mezin a atmosfer û lokalîteya helbestên Fêrîkê Ûsiv tebî'et e. Di helbestên wî yên ku bi îmajên xerîbî, polîtîk an jî mirinê va mişt in da jî meriv dikare leqî vê yekê were. Helbestvan wekî ku helbestên wî yên din da jî heye di vê helbesta

---

<sup>195</sup> Ûsiv, h.b., r. 238

<sup>196</sup> Ûsiv, h.b., r. 349



xwe da jî îmajaya xwezayê bi banglêkirin û silavdana çîyê va dide destpêkirinê. Kontakta ku di nava çîya û helbestvan da çêbûye weke monologeke jidil derdikeve pêşberî xwîneran, bi gotina *hûn dê bûne, hûn dê bûnê, ez – dergûş* vê yekê piştrast dike, helbestvanê ku gelî û gêdûkan weke meskenê xwe dibîne û wan weke dê dibîne. Bi îfadeyên gul-ger, bêl-qaş, birûsk-bager, gelî-çîya jî helbest dimeyê û weke îmajaya sirûştê xwe dide kifşê.

*Erd êdî gewr bûne,  
Pez êdî stewr bûne,  
Wextê dagêrê ye.  
Kanî nihicîne,  
Teyr û tû xaricîne,  
Berê koçê li rê ye.  
Zaro naçîn çolan,  
Ser delav û golan  
Û navêjin “peşk”ê,  
Qîz û bûk betal bûne,  
Bê xem û xîyal bûne,  
Kîlan nadin meşkê.*

*Hê bihar bû, bihar,  
Kerî dihatin xwar,  
Girminî li çiyê dihat.  
Roj çî zû çûn, firîn,  
Ewran nekîr gurrîn,  
Dengê coyê hilat.*

*Êdî qîz ê neçîn,  
Ax ezîz ê neçîn  
Ser cewik û kaniyan,  
Û bilûra şivên  
Wê xweş neke guvîn  
Li serê çîya û baniyan.<sup>197</sup>*

Sewa îspatkirina îmajaya sirûştê me dikaribû pişkeka piçûk a helbestê jî weke nimûne bida lê sewa ahenga helbestê a bitûnî me helbest hinekî dirêjtir neql kir. Di helbestê da wextborînek li dar e, di heman demê da bêhêvîti û reşbînîyeka nîspî xwe di nava rezikên helbestê dixê. Derbasbûna werza biharê û teselebûna werza payîzê hakimî metnê ye. Pêkan e ku ev werz di wateya mecazî da be jî. Her çiqas ji hêla wateyî va gumana meseleyeka din hebe jî, ji hêla şikl va xizmeta îmajaya sirûştê dike,

---

<sup>197</sup> Ûsiv, *h.b.*, r. 350

lewra peyvên teyr û tû, delav û gol, bihar, kerî, ewr, co, kanî û bilûra şivên tabloya sirûştê temam dîkin û bi wî awayî îmajê sirûştê çêdibe.

- Hey çiyano, çiya, hey çiyano can,  
Gul û şîdanên we bi kû de çûn?  
Kûlîlkêd we lal û mircan,  
Lal û mircanêd we bi kû de çûn?

Qûrtîn diket bet û bazên we,  
Şivan distra li gazên we,  
Pez hêl dikir hevrazên we,  
Xam û xozanêd we bi kû de çûn?

Co û kaniyan dikir xulîn,  
Qîz û bûkêd beng e gulîn  
Derdiketîn kon û kulîn,  
Zom û zozanêd we bi kû de çûn?<sup>198</sup>

Helbestvanê ku bi peyvên sirûştî tevna helbesta xwe honandîye ji hunera îstîfhamê sûd wergirtîye. Wer xûya ye liv û tevdanên ku di demsala biharê da li çiyayan tesele dibû di payîzê da xwe li bêdengîyekê pêçaye û bûye sedema şikestina rûhî ya helbestvan. *Strîna şivanan a li gazan, hêlbûna pêz a li hevrazan, xulxulîna co û kaniyan* tabloya sirûştî temam dîkin û xizmeta îmajê sirûştê dîkin.

Bihar vebû, koç mîlmîlîn, çiyano,  
Dilê min jî kire kalîn, çiyano,  
Da pey kerîyan, li we hilgeriya, çiyano,  
Silav ji we re, sebox ji we re, çiyano.

Ez sî salî li hêlanên we geriyam, çiyano,  
Bi bêhna we, rengîna we biriyam, çiyano  
Dîsa dîsa ji we têr nebûm, çiyano,  
Ji dîndara we zivêr nebûm, çiyano.

Ax, çiyano, min ji çîl kaniyên we av vexwar,  
Xwezî yek ji wan bibûya avilheyat, çiyano,  
Min bijîta şivêta we, çiyano,  
Nemama bi heyr û hesreta we, çiyano.<sup>199</sup>

Ev helbesta ku bi hewleka îmajê sirûştê hatîye nivîsînê ji banglêkirin û pîrspirîsînê jî sûd wergirtîye. Helbet divê haja me bi hesreta rabirdûyê jî hebe ku di helbestê da cihekî mehkem digire. Helbestvan bi me dide zanîne ku bi salan emr li

<sup>198</sup> Ûsiv, h.b., r. 352

<sup>199</sup> Ûsiv, h.b., r. 396

wan çîya, qaş û qûntaran bihurandîye, helbestkar der dibe ku li çîl kanîyên wan çîyayan av vexwarîye û dibêje xwezila yek ji wan kanîyan ji wî ra bibûya ava heyatê. Helbesta ku piştî tê nivîsînê dibe malê hest û qabilîyet û îdraqa xwendevan dibe ku gelek wateyan jî di xwe da bihewîne. Em dikarin di vê helbestê da wateya derengmayîn, werzguherîn û hesretê jî bibînin. Ger em behsa van wateyan bikin; hesta derengîyê hêleka din bi helbestê dide qezençkirinê, ji ber ku gulên ku her salê li çîyayan vedibin û co û kanîyên ku derbiharan ji nû va har dibin û dixulxulin bi navserebûna helbestvan va atmosfereka din derdixe pêş, ji ber ku kalbûna helbestvan dihêle ku di xîyala helbestvan da gul venebin û xweza ji nû va şên û şa nebe, dîsa meriv dikare bi rêzikên *min bijîta şivêta we, çiyano-nemama bi heyr û hesreta we, çiyano bêrikirina ku dinizile bibîne*, helbestkar di wê arezû û daxwazê da ye ku; mîna çîyayan bijîya lê ne ku dûrî wan çîyayan bûya û bi wê hesretê dax bûya. Peyvên ku di helbestê da derbas dibin pêwendîyeka sirûştî berpêş dikin û îmaja sirûştê tamam dibe.

*Bihar e şaîr!  
Qelemê li cem xwe hazir xweyî bike.  
Te hew dît xumam kete guhêran,  
Te hew dît çemên hemle hilşiyar,  
Pêlan pertav kir nolî kihêlan  
Û “siyar”êd spî li ser hilqoşiyar.*

*Te hew dît şepeyê şeqal mehes kir,  
Stû bi zinêr ve bû çalma çîl  
Qulinga çîtê li esmên meqes kir,  
Di gêlî de giriya roviyekî pîr.  
Te hew dî refê reşêleyên dengbêj  
Bi şirîtan ve bûn şeve-şirdan,  
Li ser mazmazka “Dibûrî” dirêj  
Raçiya zincîra kerê şivan.*

*Te hew dît berxa kozan kir nalîn,  
Dûyê pûş, pelaşan li ser gund bû ewr,  
Te hew dît bîrde Gulperiya narîn  
Ji te re kenîya wek binefşa gewr.*

*Û dilê te jî te hew dît jîr-jîr  
Stra nolî teyra torxe  
Ê olecax in, bihar e, şaîr!*

*Qelemê li cem xwe hazir xweyî bike.*<sup>200</sup>

Helbest bi sêwirandineka xurt va li hemberî xwînerê xwe ye, tabloyeka zindî li dar e ku di çavên xwîner da tesele dibe, helbestkar firçeya xwe di qutîka boyaxê da dike û şayesandina xwe ya çê li ser tuvalê pêşîya xwe digerîne û terxanî muxatabên xwe dike. Di fotografa zindî ya ku li hemberî me da liv û tevgerek dikeve guhêrên me'lûm, çem radibin, pêl coş û har dibin, quling esmanê sayî û çarşefî meqes dikin, rovîyekî pîr ahenga xwezayê dadigire û tablo bi vî awayî disêwire û diçe. Dîsa bi heman şiklî bi nalîna berxên li kozan, bilindbina dûyê pûşan va didome. Ev liv û tevgêrên heyata rojane ya biharê bi perçeyên xwezayê va dibine yek û binyada îmajî sirûştê çêdikin.

*Çiyano, hey çiyano,  
Gelî xweşçiyano!*

*Min li ger û geştên we  
Zehfî seyr kiriye,  
Zehfî'l piştên we  
Ken û keser kiriye,  
Gelek gul, pincar  
Ji sîngên we çiniye,  
Gelek avêd sar  
Ji kaniyan veçiniye,  
Hewayaya we ya zeynet  
Min hecam kiriye  
Li ser coyêd cenet  
Ser û çav bi can kiriye.  
Berx ajotîne ser  
Av û deravên we,  
Razame ez li ber  
Sîya zinarên we.*<sup>201</sup>

Hezkirina bêpayan a li hemberî çîyayên Elegezê, dibûrên Pampê, co û kanîyên Qûç û Qemerdaxan, sewta şivanên *aranan*, penêrê sîrikî yên *kerî* û *sûrîyan*, *hecamkirina* hewayaya *sirt* û *beyaran* dihêle ku helbestên xwezayê çêbin ku di xeta îmajîst da ne. Hewla samîmî ya di risteyan da xwe hazingava dide der, bêyî ku derî li dubareyekê veke, perîyoda heyata wî ya li *ger û geştan* derbas bûye wî dike nûner û vebêjekî berceste. Di biharan da li çîya û zozanan liv û tevgereka şîrîn heye, pîranîya

---

<sup>200</sup> Ûsiv, *Sûretsûfê*, r. 26

<sup>201</sup> Ûsiv, *h.b.*, r. 143

helbestên ku bi cehdeka îmajê xwezayê hatine nivîsînê di fesla biharê da diqewimin, wekî ku li me-we jî eyan e helbestvan zehfî caran gul û pincar çînîye, gelek avên sar ji kanîyan veçînîye, hewayê zeynet hecam (hilmijîn, bêhnkirin) kirîye, li ser coyên cenet ser û çavê xwe şuştîye, xwe veşuştîye, berx ajotîne li ber av û deravan û razayê li ber sîya zinarên wan çîyayan. Ev rêzikana bi telaşeka îmajîst tabloya tebi'î pêşkêşî texeyûl û hişmendîya me dike.

### 3.3. Îmajên Xerîbî û Hesretê

Însanê ku bîrê dike, hêrs dibe, hez dike û bi gelek hestên din va dijî di heman demê da bêrîyê jî dike. Însan di demên cuda da ji malbata xwe, evîna xwe, dostê xwe, heval û hezkirîyên xwe dûr dikeve û bîra wan dike. Carna jî ji welatê xwe, axa xwe û erd û bostanê xwe dûr dikeve. Ev rewşa dûrketinê di dilê wan da melankolîzmekê pêk tîne û wan dehfi hestiyarîyekê dike. Piştî wê dûrketinê û melankolîzmê însan xwe davêjin ber bext û gumana nivîsê, rismê, peykerê an jî stranê.

Her çiqas ji klîşeyekê wêdetir ne tu tişt be jî, kurd ji ber konjoktura sîyasî, cografîk û civakî ji erd û welatê xwe dûr ketine û haletî-rûhîyeya wan a dûrketinê teşe daye mehsûlên wan ên edebî û hunerî jî. Ser meseleyê meriv kîjan helbestkarê kurd bixwîne wê rastî deqên xerîbî, sirgûn û hesretê bê, an jî meriv guh bidêre kîjan stranbêjê kurd wê leqî dewsa bêrîkirinê bê, her wiha ji gelek kilamên dengbêjîyê jî mijarên mehkûmî, sirgûnî, serhildanî û dûrîyê dinizile, ev bêrîkirin carna eşkere ye carna jî di hewleka estetîk da veşartî ye. Ev rasthatinên ku berbehs in ne rasthatinên jixweberî ne, bermayîyên jîyanên wan û perîyodên heyatên wan in.

Bav-kalên Fêrîkê Êsiv jî tevî malbata xwe û cînarên xwe yên ermenî ji war û xanên xwe hatine sirgûnkirinê. Bi eslê xwe ji Qersê ne. Piştî şerê cîhanê yê yekemin tevî kurdên Êzdî û Ermenîyan derbasî alîyê Êris bûne û di rê da ji malbata wî gelek kes mirine. Wî çavên xwe di belekîyên Erez û Elegezan da vekirîye, temama heyata wî ji Kurdistanê dûr derbas bûye, ew her demê bûye vebêjê vê xerîbî û hesretê. Vê dûrîyê bi xwe ra polîtîzm û wêtenhezî jî anîye û meriv dikare bi rehetî di helbestên

wî da bi vê yekê bihese. Ev du risteyên jêr şahidê vê yekê û di heman demê da şahidê poetîka û sekna wî ne;

*Bila xwezî Kurdistana min şên bûya,  
Miletê min aza, xwendî û bi zêhn bûya.*

Em ê niha berê xwe bidinê bê ka îmajê xerîbî û hesretê çawa di nava helbestên wî da bi dest û lep dibe.

*Tu çûyî, pismamo, tu çûyî,  
Bi qewlê gotiyan ve, dinyaya “heq”,  
Em hela li kîr û kaş û kamçobûyî  
Mane li vê dinyaya han neheq...  
Di emir de ew qas jî dil û cehd  
Me şuriya hevaltiyê nedikir,  
Lê tim jî, lê tim jî bi hesret  
Min mêla xeysetê te dikir.<sup>202</sup>*

Fêrîkê Ûsiv di vê helbestê da, ku ser xatirê Mîkayêlê Reşîd nivîsîye, der birîye ku bîra xeyset û hevaltîya wî kirîye, hesreta rojên berê, dostanîyên maqûl û têkilîyên jidil ku wê demê di nava wan da qewimîye hesretekê li dar dixê û helbestvan xerqî van mîtale û hestan dike. Di dewama helbestê da bêrîkirineka rojên berê eşkeretir dixûyê.

*Li wî gundê bedew î bilindî  
Em diçûn sersal û eydên hev,  
Û li ser kulavê Kurmancî  
Guh dida me şî'r û beytên hev.*

*Digeriyan em li çil û çiyayên me,  
Kêf dikir me tevî rêncberan,  
Di nava zeyneta şayiyê me  
Ax dikir ji derdê dîlberan.<sup>203</sup>*

Rabirdû qolyeyeka hesretê ye ku di hemû deman da li gerdana me ye. Însan di demên borî da wextên xweş diborîne, hevaltîyên çak, dostanîyên qedîm ava dike, ji ber şert û mercan însan ji cihê xwe, ji hevalên xwe û ji malbata xwe dûr dikeve û di dahatûyê da bîra wan dike. Ev bêrîkirinên tîr di gelek henase û nivîs û destlêdanan da kifş dibin. Dîyar e ku helbestvan bîra rabirdûya xwe, war û mekanên xwe û

<sup>202</sup> Ûsiv, *Êvara Zivistanê*, r. 76

<sup>203</sup> Ûsiv, *h.b.*, r. 76

hevaltîyên xwe yên berê dike. Daxwaza lêvegerîna helbestvan a ber bi zarotîyê, bêrikirina dîdem û qewamên kevnezemanî û zindîkirina tabloya rabirdûyê îmajê hesretê der tîne me' derê.

*Bûkeke berbîhêr dikim cariya te,  
Bi ofîna te re tîm hewara te,  
Dilxem dizarim: Kê dera te diêşe?  
Çavê ewledê xwe jî birêje,  
Bike dû-derman,  
Binhêr, bavo can,  
Çi êmek, êmîş dilê te diçe?  
Ji te ra, ca bibêje, bînim çi kincê?  
Wey li mim! Ez î tima bûm ew qas,  
Wekî te xwelî ji xwe re kir libas?<sup>204</sup>*

Demên nexweşîyan da meriv bêhal dibe, bêmehe dibe û motîvasyona merivî xera dibe. Her wiha ferdekî ji malbata merivî an jî nasek bêhal be dîsa bi heman şiklî tesîrek li ser merivî çêdibe. Wisa tê kifşê ku neçarîya nexweşîya bavê, xwe li helbestkar pêçaye, wefa û çerçirîna helbestkar di rêzikên helbestê da li dar e, atmosfer û hewayê xerab xwe berî nav helbestê daye; helbestkarê ku bûkeka xisletpak datîne ber çokên bavê xwe, bi ofîna bavê ra jî digîhîje hewara wî û bi wê hestîyarîyê deng li bavê xwe dike; *kê dera te diêşe?*. Helbestkar bi arastekirina vê pirsê dixwaze bibe dermanê bavê xwe, lewra ev pirs jî hînbûna derdê kesekî wêdetir wateyeka din jî dihewîne; ez qurbana birîna te bim, tu sewa min biqîmet î, xwezila bila şûna te ez nexweş biketama û hwd. Di dewama helbestê da dîsa bi heman zarînê helbestkar bang li bavê xwe dike; dilê te diçe çi? Kîjan kinc wê te şa bike?... Dawîya helbestê me pê dihesîne ku helbestkar di nava lêgerîn û hewlekê da ye û bavê xwe sipartîye axê; *wey li mim! ez î tima bûm ew qas - wekî te xwelî ji xwe re kir libas?* Helbestkar nerazîbûnekê nîşanî xwe dide û hewla wî ya ku nagîhîje tu derê û neçarîya wî ya ku dax dike dixûyê. Di vê helbestê da wekî ku di gelek helbestên wî da jî ev rewş li dar e çend îmaj di nava hev da dihewin. Wekî îmajê mirinê û îmajê xerîbîyê.

*Niza'm, diçin aş mezinên malê...  
Niza'm, bazarvan diçin bazarê...  
Niza'm, birrên pêz dajon qiracan...*

---

<sup>204</sup> Êsiv, *Sûretsûfê*, r. 61

*Niza 'm, koç dîkin zomeyên Kurmancan...  
Niza 'm, seferliyan dane serê rîyan...  
Niza 'm, difîrin qulingên berriyan, -  
Hiseke hesretî serê vê sibehê  
Min kamço dike ber bi cenûbê.*<sup>205</sup>

Risteyên ku bersivê naxwazin ên bi *niza 'mê* dest pê dîkin meraqeka nîspî dertînine me' derê. Ev perîyoda ku di helbestê da derbas dibe taqabûlî demsala payîzê dike, ji ber ku çûna aşî, ajotina pezî ya qiracan, koç kirina zomeyan, firîna qulingan qewamên fesla payîzê ne, helbestkar jî tevî ku haj bi vê pêvajoyê heye helbesta xwe dehfi raz û nihênîyekê kirîye û helbesta xwe bi hesta xerîbîyê honandîye. Helbestkar di nava xûmamîyan da hesretek a tîr a dilgîvêş berpêşî me dike, rîsma ku di serê xwîner da çêdibe derîyek e bo bêrîkirinekê. Ev bêrîkirina pastoral di heman katê da şayesandineka xurt jî li dar dixê. Dewên îmajê sirûştê yê ku temama helbestê da desthil in haveyna îmajê xerîbîyê ne. Her wiha jîyana kurdan a gundewarî û lokalîte jî çavê xwe li helbestê diqirpîne.

*Ez bi qiseya emir kamço –  
Merem dikim dîsa bijîm:  
Kurdîstana xiloxaço  
Bibînim li ser hev û hêşîn.*

*Ji min re bûne xewn û bêrî  
Dew û dorên Muxurzemîn,  
Tirba Mihemedê Cizîrî,  
Daredirriya li nava Mem û Zîn.*<sup>206</sup>

Di vê helbestê da du îmajên desthil ên weke wetenî û xerîbîyê di nava hev da disitirin û li hev dîkin. Hêmayên weke *Kurdîstan, Mihemedê Cizîrî û Mem û Zînê* di zemîneka wetenî da hatine vegotinê, dîsa risteya *ji min re bûne xewn û bêrî* têra îmajê xerîbîyê dike. Helbestkarê ku “xerîbî” di temama berhemên wî da weke skeletekê disekine her wextê dûrî *ax û topraxa* xwe maye. Ev jî dike ku hêmayên polîtîk û wetenî di helbestên wî da bimeyên. Helbestkarê ku bi sond û merem û arezûyan va de'wa ji nû va jîyînê dike, dixwaze *Kurdîstana xiloxaço* yanê *Kurdîstana* ku ji hêla emperyalan va ji hemû hêlan va hatîye dagirkirinê li ser hev bibîne. Bêrîkirina yeman a ku bi risteya *Ji min re bûne xewn û bêrî* der çûye jî radeya

---

<sup>205</sup> Ûsiv, *Sûretsûfê*, r. 238

<sup>206</sup> Ûsiv, *h.b.*, r. 291



bêrîkirinê nîşanî me dide, daxwaza gihîştina Muxurzemîn, tirba Mihemedê Cizîrî û Mem û Zînê jî meraq, mîtale û arezûya dîtina Kurdistanê ya nivîskar raberî me dike.

*Dixwazim der heq  
Bekirê Esed,  
Zabitê Eyo,  
Şekêyê Teyo,  
Nadoyê Sedo,  
Teyarê Xudo,  
Hemîdê Huso,  
Eslanê Keso  
Wan xeber dim.*

*Ê, ka bi kê re xeber dim?..<sup>207</sup>*

Di perîyodên cuda ên heyata xwe da însan gelek kesên biqîmet nas dike, dostanîyên pak û qedîm çêdike û rabirdûya xwe bi van dostanîyan rengîn dike, Di vê helbestê da îmajên bêrîkirin û tenêtiyê di nava hev da ne. Helbestkar di lêgerînekê da ye û dixwaze bi civata xwe ya qedîm ra xeber bide, lê dûtî an jî nemana civata berê nahêle ku helbestkar bigihîje merema xwe. Helbestkarê ku dixwaze behsa serborî û meseleyên rabirdûyê yên derheqê Bekirê Esed, Zabitê Eyo, Şekêyê Teyo û hwd. bike ji ber dûtî, mirin û bêfirsendiye nikare keysa xwe pê bîne û bêtaqet dimîne. Eşkere xûya ye ku helbestkar bîra hevalên xwe yên berê û civata xwe ya wan çaxan dike û di valahîyekê da ye, ev jî rehên îmajê xerîbî û bêrîkirinê ne.

*Gom bûne, guhêr, ode û tenûr,  
Dawet, dêrindês, dolîdank û pez.  
Ji dûtî ve mîna benzê dê yê nûr  
Kûr kamço dikin dilê min ê tez.*

*Dinya bûye sûka rengan û rindan,  
Îcadên teze, bîznêşê qalim.  
Lê bêriyên biçûktiyê dikelin di min de,  
Ez bi wan bêriyan ve dijîm, dinalim.<sup>208</sup>*

Bi domana demê ra dinya diguhere, bajarbûn û teknoloji pêş dikeve pêwendiyên qewî yên di navbera însanan da sist dibin. Helbestvan jî bal kişandiye ser guherîna zemên û dinyayê, helbet helbestvan guh nade vê guherînê, her çiqas dinya bibe *sûka rengan û rindan* jî helbestvan dewakarê zarotîya xwe ye û hesreta

<sup>207</sup> Ûsiv, *Êvara Zivistanê*, r. 232

<sup>208</sup> Ûsiv, *h.b.*, r. 233

rabirdûyê li gerdena helbestvan alîyaye. Meraq û mîtaleyn zarotîyê, xerîbîya rabirdûyê û guhnedêrîya dema îroyîn a helbestvan di her du risteyên dawîyê da eşkere ne. Pir eyan e ku di helbestê da îmajê bêrîkirinê heye.

*Li wir hêviya wan tenûreke germ,  
Kulavekî nerm, çîrokeke miqerim,  
Çend silq û kartol – li nava tenûra gurr –  
Kanê ew dîdem dema bi sêhr û sir?*

*Heyran û hijmekar ez li hêviyê mam,  
Sal hat bihûrî – nehat ew heyam.*<sup>209</sup>

Ji vê qisetê meriv pê dihesê ku vegera bo rabirdûyê di helbestê da mijara sereke ye. Helbestkar di çêkirina vê risteyê da di heman demê da rismeka sirûştî pêk tîne. Ber dikeve ku meriv behsa westînekê jî bike, di her du risteyên dawîyê da li me eyan dibe ku helbestvan bi eşq û heweseka gelekî mezin li benda rojên berê maye lê merema wî ya *tenûreka germ, kulavekî nerm û çend silq û kartol* naçe sêrî û ew dem her dûr e. Dîsa wekî ku diyar e risteya *kanê ew dîdem dema bi sêhr û sir?* Mifte-risteya îmajê xerîbî-hesretê ye.

*Û niha, wextê ez wa bê sihet  
Dinalim li nava tehlî û tengasiyê –  
Bêriya te kiriye min wisa dilceht,  
Bêriya xemxuriya te ye kinêziyê.  
Ez bi gelekî ve hatim xapandin,  
Dilê te êşand min nezan nezan,  
Lê axir min dît – ya herî amin,  
Ya herî bedew – ew tu yî dîsa.*<sup>210</sup>

Însan carna ber bayên xerab dikeve û qîmeta ya destê xwe nizane, kêlîyên xweş î rengîn merivî xerqî nava xeletîyan dikin û meriv bi har û nezani êrîşî nirxên xwe dike û qedrê hezkirîyên xwe nizane û xeletîyan dike.

Li gorî texmîna me haveyna vê helbestê wefa û xemxurîya jina helbestkar e ku di nava risteyên vê helbestê da zindî dibin, ya ku di *tehlî û tengasî* û rojên zehmet da li helbestkar xwedî derketîye û ji wî ra bûye cih û star.

---

<sup>209</sup> Ûsiv, h.b., r. 321

<sup>210</sup> Ûsiv, h.b., r. 356

Mijara poşmanîyê jî îmajê nispî ya xeribîyê dermale dike, lewra li gorî risteyên vê helbestê helbestvan *bi gelean ve hatîye xapandinê* û bi nezanî dilê yara xwe ya *herî amin* êşandîye. Lê axirî helbestkar pê dihesê ku di hemû deman da tevî hemû xeletîyên wî ya ku ji sedeqeta xwe qet nayê xwarê jina wî ye.

### 3.4. Îmajên Tenêti û Êxtîyarîyê

Mijara tenêtiyê ne tenê di edebîyata dinyayê an jî edebîyata cînanan da, di heman demê da nava edebîyata kurdî da jî her demê şax vedaye. Gelek helbestvanan li gorî şertên heyata xwe, haletî rûhîyeya xwe, li gorî dûrketina ji yara xwe û malbat û nas û dostên xwe, xwe avêtine ber bext û gumana mijara tenêtiyê. Çawa ku meriv dikare di êxtîyarîya xwe da tenê bimîne dibe ku di emrê xwe yê cuwan da jî tenê bimîne, lê periyoda tenêtiya Fêrik bi taybetî xwe dispêre êxtîyarîya wî.

Di helbesta Fêrikê Ûsiv da jî tenê tenêtiyên ku ji firqeta yarê dinizile tune ne, di heman kêliyê da dûrketina ji dostekî bigire heta dûrketina ji warê xwe îmajê tenêtiyê ji axa xwe ber bi esmanan gupevedibe. Di risteyên helbesta Fêrik da cudahî, evîn, huzn, bêrikirin, jan, qeswet û neçarî jî ji xwe ra qada temsîliyê dibînin. Em ê niha bi mînanan îmajê tenêtiyê ya ku bi êxtîyarîyê va pêwendîdarîyeka xurt dihewîne nîşanî we bidin.

*Carinan birçî me, nan tune,  
Carinan tî me, av tune,  
Carinan bê cî me, xan tune,  
Tune dost û yara min,  
Ji te jî nîn bûya – min ê çî bikira –  
Kilama min, çareya min?*<sup>211</sup>

Dema meriv ber bi êxtîyarîyê va diçe gilî, gazind û nerazîbûnên merivî jî zêde dibin. Di nava atmosfereka dilgîvêş da meriv li benda silav û saloxekê dimîne, taqeta çokên merivî namîne û meriv di nava rûhîyeteka xirab da digevize. Li hember gelek rewşên negatîf dîsa ya ku hêvî û enerjîyê dide merivî hesta hezkirin û xwedîderketinê ye.

---

<sup>211</sup> Ûsiv, *Sûretsûfê*, r. 275

Helbestkar dîsa di nav tehlî û tengasî û bêqudumîyê da sedeqet û wefaya yara xwe ya *amin* yanê jina xwe ragihandîye me. Helbestkarê ku dor-dor tî, birçî, bêcih û bêkes dimîne hewara xwe digîhîne jina xwe ya ku wê weke *kilam* û *çare* dibîne. Di risteyên jor da em bi îmajên tenêtiyê û êxtîyarîyê dihesin.

*Pêncî me, belê, êdî pêncî me,  
Tam im, lê hela dîsa nîvcî me.  
Hê min negotine giliyên xwe tam,  
Hê negeriyame ez li Şerq û Şam,  
Min nedîtiye hela berrî û Sibîl  
Azad nebûye hê Kurdistana dîl.*

*Hê tevî hezkiriya xwe ya şemçirax  
Ez negeriyame – li Çiyayê Qemerday.  
Tevî hevalên xwe yên zarokatiyê yên gund  
Min kêf nekiriye hê rojêke rind,  
Neneqîşandiye bi xet û xengel  
Min pezê Beranberdanê yê berkel.*

*Serxweş nebûme tevî şivanan  
Û negeriyame ez tevî wan.  
Hesreta rojêd xwe yên bihurî –  
Qomsî û neyar bûne strî  
Li ser riya me û van heyr û hesretan.  
Belê, hê nehatiye koka kirêtan.*

*Hê tû nekiriye min bi hêrsa sert  
Rûyê telaqreşêd nuxsan e nemerd.  
Pêncî me, belê, êdî pêncî me,  
Tam im, lê hela dîsa nîvcî me.<sup>212</sup>*

Wê bi hêsayî pê were hesînê ku helbesta jor a ku berbehs e di xwe da dewesên îmajên wetenîyê, evînê, êxtîyarîyê, zordestîyê, sirûştê û hwd. dihewîne lê îmajên sereke ku di vir da desthil e helbet îmajên êxtîyarîyê ye, Çima? Ji ber ku helbestvan piştî xwe sipartîyê dîwarê pêncîyê û telaşa derengmanê lê diwarqile; *Pêncî me, belê, êdî pêncî me, tam im, lê hela dîsa nîvcî me.*

Helbestvan tevî ku pê hesîyaye ku gihîştîye temenekê dîsa jî di wê bawerîyê da ye ku hê gelek cih mane ku bigere, gelek bûyer mane ku bijî, gelek tehm mane ku bitehme. Ev risteyên ku dixulxulin û tînen tevî ku telaşa derengmayînê dihewînin di

---

<sup>212</sup> Ûsiv, h.b., r. 327

heman demê da îmajaya extîyarîyê dihewînin. Divê meriv însafa xwe neşewitîne û behsa dewsên wetenîyê jî bike, helbestvanê ku temama heyata xwe ji *ax û topraxa* xwe dûr jîyaye welatê xwe Kurdistan jî ber behsê xistîye; her çiqas ku min xwe dabe dîware êxtîyarîyê jî li hember zordestî û talanê, min hê welatê xwe yanê Kurdistana xwe azad nedîye. Her wiha di helbestê da şopên nerazîbûna li hember xayîn û bêşexsîyetan jî li dar e lê ya ku me eleqedar dike hîsa derengmanê û êxtîyarî ye.

*Çima cênîk spî dibin,  
Ku ne wextê wan e?  
Difikirim, axir cênîk  
Lî nêzikî guhan e.*<sup>213</sup>

Helbest di formên berteng da wateyên kûr dihewîne, mîna vê helbesta jor. Di vê helbesta jor da îmajeka nispî ya êxtîyarîyê heye, helbet cênîk tenê ber bi kalbûnê spî nabin lê weke sembol nîşaneyê kalbûnê ye. Yek ji wateya helbestê jî bihîstina êş û azar û kerb û zehmetîya bûyeran e ku hemû jî ji guhan diçine mêjî û dilê me. Dema meseleyeka xerab biqewime pêşî guh û çav pê dihesin lê dem hene ku hemû şahidîya wan guh dikin, loma jî helbestvan di nava lêgerîn û pirsekê da bersivê jî raberî me dike. Cênîkên ku bêyî ku wextê wan bê spî dibin mertala van çerçîrîn û zêrandinan e. Di vê helbestê da telaşa kaltiyê, tenêti, xembarî di nava hev da disitirin.

*Ax, meriv zêr winda ke,  
Gund û bajêr winda ke,  
Text û tacê şah winda ke,  
Xezîneya padişah winda ke,  
Tek cahiltiya nûr û neder  
Winda neke, nede der.  
Û mîna min bê guman,  
Wek nexweşê bê derman –  
Nenihêre li pala çiyê,  
Li xasxatûna Kurmanciyê.*<sup>214</sup>

Ber bi êxtîyarîyê telaşek li merivî peyda dibe, meriv dikeve lêgerîn û fikaran, rojên berê tîne bîra xwe, hîsa derengmayînê li merivî diale û ruhîyeta merivî li gor vê yekê teşe digire. Helbestvan jî cahiltî (cuwanî) weke cewhera herî heyatî û biqîmet dîtîye û li hev anîye ku meriv di vê dinyayê da ji çi dibe bila bibe tenê bila cahiltîya merivî a *nûr û neder* ji dest neçe, ji ber ku weke li me tevan jî eyan e ya ku careka

<sup>213</sup> Ûsiv, *h.b.*, r. 28

<sup>214</sup> Ûsiv, *Êvara Zivistanê*, r. 165

din bi dest nakeve cuwanî ye, bi cehd û xebat û domana demê ra meriv dikare bibe xwedîyê mal an jî milk û samanê xwe zêde bike lê cuwanî ne bi cehdê ne jî bi mal û milk bi dest nakeve.

Dîsa ber bi dawîya helbestê mijara bêkesîyê serdestîyê bi dest dixê û bask û bawanê helbestê hewekî ber bi xwe va diguherîne, helbestvanê ku *wek nexweşê bê derman* di bêkesîyê da digevize heyrê maye, çaverê ye û tekane emelê wî di neçarîyê da nêrîna pal û quntaran e ku di êxtîyarîyan da li merivî peyda dibe.

*Qey duh bû, me li pişt mala xwe  
Mûyê xwe yê hevaltiyê fikir çehl,  
Îro por li serê te nemane,  
Pismamê min î qafkeçel.  
Gere em kum bidin serê xwe,  
Siwar bibin li avtoyê bi rûmet,  
Qezenc bikin pesnê dor û berê xwe...  
Ax, tu li rebeniya însaniyet!*<sup>215</sup>

Têgeha zemanî ku di risteyên wî da weke hespeka lez e xwe di vê helbestê da jî avêtîye hewara me xwîneran. Zeman tişteki livdar e û bi domana demê ra ji hêla fîzîkî va gelek tiştan ji merivî dibe, weke spîbûn û weşîna por, qurçimokên li ser rû û cendek, daliqîna beden û hwd.

Helbestvan careka din daqûlî bîra xwe ya zaroktîyê dibe û rojên berê yên ligel heval-pismamê xwe ku êdî *qafkeçel* e raberî me dike. Zemanê ku bûye qesasê serê me gelekkan dîsa di vir da bi zulm û çakûcê xwe li hemberî helbestkar e. Zemanê ku taqet li helbestkar birîye di wê hewlê da ye ku îtibara xwe û pesnê civatê hilde.

Di temama helbestê da jî haja me bi îmajê extyarîyê çêdibe, salên ku dane pey hev di helbestkar da telaşek û xerîbîya rabirdûyê pêk tîne û ev jî îmajê berbehs pêşkêşî me dike.

*Ji hal ketime êdî ez,  
Tine ew heyr û hewes,  
Wekî ez xwe bi fortan  
Hilqoşînim li ortan,  
Bibêjim: "Bijî Kurdistan!"*<sup>216</sup>

---

<sup>215</sup> Ûsiv, h.b., r. 88

<sup>216</sup> Ûsiv, h.b., r. 344

Bi gihîştina emrekî va meriv tehma berê ji heyatê hîlnade, têkilîyên di nav însanan bigire heta xwarineka ku tê xwarinê, gereka nav-baxçeyan bigire heta hilberîna hunerî an jî awayekî din, taqeta bedena însan bigire heta sinc, exlaq û psîkolojîya me, gelek tişt xwe radestî guherîneka yeman dîkin.

Ev helbesteka sade û kurt e ku haveyna xwe ji bêtaqetîya kaltîyê û welatparêzîyê distîne, wekî gelek helbestên Fêrîkê Êsiv da jî heye, di vir da jî xwastina lêvegerîna rabirdûyê û de'wa zeftkirina azadîyê li dar e.

Helbestkarê ku di hewla bangekê da ye ji ber bêqudumîya xwe û nemana *heyr û hewesa* xwe nikare dirûşma xwe yanê *bijî Kurdistanê* bilind bike. Sedema bingehîn a vê yekê êxtîyarî ye ku binyada îmajê saz dike.

### 3.5. Îmajên Derengmayînê

Hîsa derengmayînê di wê kêlîyê da derdikeve mehderê ku em bi demê ra dikevine qayîşê, an jî wexta ku em bi zemên ra kapan bavêjin ev pêvajoyê dest pê dike. Helbet zeman her tim di heman tundîyê (sur'et) da naherike, carna gelek zû carna sabît carna jî gelekî hêdî diherike, jixwe însan qayîl nabe ku zeman her tim di heman tundîyê da biherike, sewa cîhana însan a tebi'î, karî-karîyerî an jî manewî divê perîyodên cuda ên tundîya zemên hebin. Tehma hemû deman cuda ye, hemû perîyodên zemên jî di cîhan me da kêlîyên cuda dihêlin. Her dema ku însan li pey xwe dinêre ev hîsa derengmayînê xwe davêje qefesa merivî, ev jî rê li ber eceletî, stres an jî hahankatîyan (lezûbezî) vedike. Piştî demekê meriv ji berê zêdetir li ber neynikan disekine, ji berê bêtir li xwe diwarqile û bi guherînên xwe yê fîzîkî an jî ruhî dihesê. Însan dixwaze karê herî baş pêk bîne û mohra xwe di bin tiştên baş bixe. Lê wexta ku wehde temam dibe haja me pê çêdibe ku zeman ne tiştêkî wisa ne ku em lingê xwe pê ra dirêj kin, axir tam di wê kêlîyê da em pê dihesin ku em dereng mane.

Helbestvan jî wexta ku ew hîsa li wî diale, mîna her însanî dikeve vê telaşê û piştî vê livê muhtevaya helbestê di vê çarçoveyê da dimeyê. Em ê ji vir şûn da behsa meseleya derengmayîna helbestên Fêrîkê Êsiv bikin.

*Cahiltiya min bû xezaleke kûvî,  
Min zefî nekir, baz da ji destê min revî,*

*Û şev û roj çî qas li pey direvim,  
Nagihîjimê; ew qasî jê dûr dikevim.*<sup>217</sup>

Helbestvanê ku ji teşbîh û mubalaxeyeka kêmpayda sûd wergirtîye xortanîya xwe rengê xezaleka kûvî xistîye û îmaja derengmayîn û êxtîyarîyê çêkirîye, zemanê ku mîna dijminekî xedar ê li pey tolê baz dide û tu firsend û emanê nade însan, di dirûvê xezaleka kûvî da derdikeve pêşîya me ku nayê zeftkirinê. Helbestvan bi me dide zanîne ku her çiqas em li pey xortanîya xwe baz bidin jî ewqasî jî em jê dûr dikevin.

*Demên naxwazim ne stêrk û ne peyr,  
Ne ro, ne heyvê,  
Ne jî dixwazim tevî pêxember  
Rûnê ser şîvê.  
Lê feqet,  
Her wext  
Ev qîz-ezîzên hivdeh hejdeh sal  
Tê dixilbilin wekî cewêd zelal,  
Dixwazim mîna kurikê germ eciz  
Xwe bavêjim paşîla wan cewên temiz.  
Lê ku dizanim  
Ne bi dilê wan im  
Ez kûr dinalim.*<sup>218</sup>

Esas di vê helbestê da derengmayîneka teqez ne li dar e, ew ji îdraqa me ra maye, helbestvanê ku çavê wî li mal-milk û firsend-maqamên dinê nîne ketîye pey xem û xîyalên keçên cuwan lê temenê ku li helbestvan bihûrîye emanê nadê ku xwe bavêje paxîla wan qîzên nûgîhaştî. Di heman demê da dilnên şehwetî jî li dar in lê meseleya eslî ku xwe bi temamî eşkere nake îmaja derengmayîn û êxtîyarîyê ye.

*Dizanim 'emir çetin e,  
Dizanim rabûn ketin e,  
Dizanim şayî û derd e,  
Dizanim çehl e û nerd e,  
Dizanim rênga mirazan  
Diçe xwar û hevrazan.  
Dizanim li dinyayê jehr heye,  
Ji kevotkan re mar heye.*

*Dizanim, dizanim, lê feqet,*

---

<sup>217</sup> Ûsiv, *Hesretdefter*, r. 142

<sup>218</sup> Ûsiv, *h.b.*, r. 285



*Birayê min ê xweyî ewled,  
Heta lawê te bê fam  
Bê xîyal û bê xem,  
Heta 'emirnenas e,  
Heta heyr û hewes e,  
Heta dinya gulek e,  
Alem jê re dilek e,  
Heta çiya jî berjêr e...  
Heta xêve, bê guneh,  
Xuşûş li dilikê wî tune.*

*Bi xwedayê xwe kî, tu nebê,  
Nebê, emir çetin e.<sup>219</sup>*

Beqî serê helbestvan haja me bi bêrehmîya zemên çêdibe, helbestvanê ku bi peyva *dizanim* helbesta xwe raberî xwîneran dike di heman demê da hostayê heyamên dûr û emrekî hosta ye lewra jîyîn û tecrubeyên nivîskar di helbestê da tesele dibin. Esas hemû bingeh û merema helbestê di van her du risteyan da veşartî ne; *dizanim* 'emir çetin e,/dizanim rabûn ketin e. Ji ber ku yê ku emrî kevn dike dizane ku birastî jî heyat zehmet e, bi gelek tehlî û tengasîyan va hatîye dorpêçkirinê. Telaşa debarê, sirgûnî, xerîbîya welêt, berxwedana li hemberî heyata sext, zordestî an jî zext û fişarên dijminî dihêle ku helbestvan bêje *dizanim* 'emir çetin e.

Di hemû kêlîyên jîyanê da meriv rastî zehmetîyan tê, belkî jî ya ku heyatê dimeyîne ev tehlî û tengasî ne, li pêş hemû serkeftinan hin astengî hene, nanê rehet ne hêsan e, axir ji ber wê ye ku helbestvan dibêje; *dizanim* rabûn ketin e.

Em wer pê dihesin ku helbestvan emrekî zehmet borandîye û li dû xwe hiştîye lê tecrûbe û arîşeyên heyatê helbestvan kemilandîye û helbestvan heyat ji xwe ra weke dersdarekî dîtîye; *dizanim* li dinyayê jehr heye, ji kevotkan re mar heye... Di temama helbestê da îmajî derengman û êxtîyarîyê vê helbestê dermale dike.

*Lê bextê min, lê 'emrê min derbas kirî  
Li ber min bû kevir û kuçik û strî.<sup>220</sup>*

Heyfpeanîna emr li dar e, heyata ku ji hinekan ra dibe pereyê hûr ji hinekan ra jî dibe heyateka hepsî. Carna ji ber bêderfetîya însanan carna jî ji ber qedirnezaniyê

---

<sup>219</sup> Ûsiv, h.b., r. 292

<sup>220</sup> Ûsiv, h.b., r. 341

heyata însên belasebep xerc dibe diçe. Dema însan pê dihese, lê dinêre ku jê derbas bûye. Paşê haja helbestvan pê çêdibe ku emrê ku derbas bûye li ber wî bûye *kevir û kuçik û strî*. Di van her du risteyan da bi eşkere îmaja derengmayîn û êxtîyarîyê heye ku ev îmaja bi îfadeya *'emrê min derbas kirî dîyar dibe*.

*Axir emrê însan diçe...  
Lê na, bendeyê li ber tevdîrê  
Çûyîna emir nayê bîrê...  
Ew bi nêt û mitalên teze  
Diqebilîne sala teze.*<sup>221</sup>

Di vê dinê da wehdeyê her însanî heye da ku tamam bike û bigihîje dawîya qewlê xwe. Dema ku însan vî wehdeyî diqedîne bêyî ku haja wî bi zemên çêbe wext dibore. Carna însan li pey xwe dinêre ne wext maye ne jî tiştekî berdest ku pê bihewe an jî serfiraz be, wekî helbestvan jî gotî *çûyîna emir nayê bîrê*. Her sala ku tê li merivî asê dibe ligel şahîyekê, hîsa derengmayîn û xemgînîya emrtemamkirinê jî bi xwe ra tîne. Însan mîna her salê bi mereq û meremên nû derbasî sala teze bibe jî her tim keysa merivî lê nayê ku ya dilê xwe bibe sêrî. Axir ji ber wê ye ku însanê ku stûyê xwe daye ber bivirê zemên gelek caran bi ser nakeve û xwe nava wê atmosfera reşbîn û derengmayînê da dibîne. Di temama risteyan da jî meriv dikare leqî vê derengmayînê bê. *Çûyîna emir û qelibîna sala teze* palpiştên tamamker ên îmaja derengmayînê ne ku têra mebesta me dikin.

*Sal çi zû li pey hev tèn guhestin,  
Sal çi zû dizivirin mîna tekeran;  
Min çi sêron xist rûbarê vê dinyayê,  
Min çi qezenç kir ji xwe re?*

...  
*Min tam û taş hiljandin. Ez bi ra û rêz  
Hilkişiyam nerdiwana dikan.  
Lê axir min dît, dikişe ber bi axilê pêz  
Dilê min mîna kêzikan.*<sup>222</sup>

Her çi qas zeman tiştekî neguhêrbar be û ji bo hemû deman di heman tundîyê da biherike jî, ji ber telaşa însan, zêdebûna karan û têkilîyên di nava însanan da, bajarbûn, qelebalixî an jî sebebên wekî van dibine sedem ku meriv zemanê xwe baş eyar neke, haja merivî bi zemên çênebe, ji xwe ra demên pak veneqetîne, li dû xwe

<sup>221</sup> Ûsiv, h.b., r. 357

<sup>222</sup> Ûsiv, h.b., r. 401

tişteki nehêle û ji hilberînîyê dûr bikeve. Ji ber van sedemên ku bi van xalan ra pêwendîdar in sal li dû hev banz didin bêyî ku meriv li berhemên pey xwe û qelîşteken di nav rûyê xwe bihese.

Helbestkarê me yê ku ji hunerên edebî yê weke teşbîh û pirsirsînê sûd wergirtîye tevna helbesta xwe li dor lomeyekê şikilandîye ku muxatabê lomeyê ew bi xwe ye; *min çî sêron xist rûbarê vê dinyayê, -min çî qezenç kir ji xwe re?*

Şik tê da tune ye ku îfadeyên *zû guhestina salan zû, zivirîna salan a mîna tekeran*, sîtema jor a berbehs, hewl û telaşa cuwanîyê, *hilkişîna nerdiwanan* û pêhesîna axirî ku reng û rûçikên hîsîyata westîn û kaltîyê lêdixê îmajê derengmayîn û êxtîyarîyê berpêşî me dike.

### 3.6. Îmajên Wetenîyê

Hezkirin, xwedîderketin û sedeqeta însanan a li hemerî welatê wan weke welatparêzî an jî wetenperwerî tê nasînê. Însan ji ber destpêka hebûna xwe û jîyana xwe li cihekî têne dinê, li wir hîşyar dibin, têr dixwin, dixebitin, hez dikin, şer dikin, serî radikin, dizewicin, tevî kozî û kulfetan dibin û wexta ku wehde temam dibe dimirin. Cihê qewama van hemû meseleyan welat e, helbet ji ber hin şert û mercên ku xwe dispêrine ezberê û hin meseleyên taybet hin însan li welatê xwe di nava qewm û xizmên xwe da nayêne dinê an jî li wir najîn, di vê derê da jî manewîyat zorê dide însan û dîsa însan çaverêye tişteki û cihekî ye. Dûrî, zehmetî û sebebên din ên dîyar an jî nedîyar têrê nakin ku însan xwe ji welatê xwe rizgar ke an jî ji wê afdîyet û realîteyê bifilite. Axirkî her gul xwe dispêre kok û erdekî, her liva berfê xwe li qûntarekê, her belg xwe li darekê, her însan jî xwe li qewmekê datîne, ya rast însan xwe danayîne qewmekê; her qewm xwe li însanekê daydine.

Kurd û welatê wan Kurdistan di hemû serdemên tarîxê da duçarî dagirîyê mane, ev dagirkerî ji hêla dewletên dîyar û rûbadana hin dewletên din va bi awayekî sîstematîk û herdemî ajotîye hetanî ku pêkolîyê li îro jî dike. Bêyî ku em gotinê dirêj bikin me xwest vê rewşa acizker bi hesta wetenperwerîyê va girê din. Wekî hemû endamên civat û welatekê her hunermend, nivîskar, karker û xwendekarî, helbestkar jî bi vê êşa kolonyalîzmê dihesin û li gorî wê teşe digirin û seknekê nîşan didin.

Mîna her helbestvanê kurd Fêrîkê Ûsiv jî li hember vê hicûmê xerca helbesta xwe çêkirîye û helbestên xwe lêkirîye, yek ji xala kartêker ku haveyna vî xercî ji avê diparizîne û dike xerceka eslî xala dûrîyê ye. Fêrîkê Ûsiv di temama emrê xwe da ji Kurdistanê dûr jîyaye wî her tim di xîyalan da Kurdistana xwe ava kirîye û lê jîyaye, her çend jê dûr be jî wî di xîyalên xwe û rastîya xwe da li Kurdistanê bûye, *li Soqaqeke Êl-Cizîrê* bûye, strîya nava cendekê Mem û Zînê bûye, li dergehê Ehmedê Xanî bûye, saza Ehmed û kilama Şeroyê Biro bûye, tu şik tê da tune ye ku xwendekarek bi vê yekê nehese, ji ber ku welatperestîya wî eyan-beyan e, gelekî zelal û radîkal e. Qey Fêrîkê Ûsiv nebûye ku gotîye û lîlandîye; *bila xwezî Kurdistana min şên bûya/miletê min aza, xwendî û bi zêhn bûya..*

*Min ku ew dît – pencê royê lê nedîr,  
Weten, dîsa wê hingê tu hatî bîr.  
Tu hatî bîr û ewledên te efat,  
Ku netirsiyan ji tu oxirmeyan, tu cefayan:  
Xwe dane ber derbên giran, derbên zor  
Û mînanî wê firendeyê hêl bûn jor.<sup>223</sup>*

Derdê dûrîya ji welêt her demê cihekî qewî girtîyê di helbesta Fêrîkê Ûsiv da. Her firsendê da wî xwe avêtîye bext û gumana gundê xwe Pampê ku jê ra niha Sîpan tê gotinê. Sebeba vê xwespartinê temsîlfîyeta Kurdistanê bi xwe ye, Fêrîkê Ûsiv di nava koma qewm û pismaman da, di nava kurmancîyeka am î tam da, di nava wan bilindçîyayên ku reng û rûçikê çîyayên welatê wî lédixist, di nava kalîna pêz, di nava konan, di nava co kanîyan da ew hewayaya bihûştî hecam kirîye, hilmijîye û pê bêhna xwe derxistîye, her çiqas xwe di nava wê ambîyansa Kurdistanî da dîtibe jî gelek caran kederê welêt lê peyda bûye û welat ketîye bîra wî, welatê wî yê ku ewledên wî, xwe di oxira wî da canfîda kirine, welatê ku ji qirkirinan û oxirmeyan derbas bûye û derbas dibe, welatê ku ewledên wî *xwe dane ber derbên giran, derbên zor/û mînanî wê firendeyê hêl bûn jor...*

Ji ziman, riste, telaş û tevna helbestê tê serwextbûnê ku merema helbestê derbirina îmajaya wetenîyê ye, peyvên weten, ewled, oxirme û cefa û mijara ku li dor zordestîyê û bêrîkirina welatî teşe digire zemînê îmajaya welatperestîyê qayîm dike.

---

<sup>223</sup> Ûsiv, *h.b.*, r. 120

*Kurmanciya min xalis, wa di kû re tu hatî?  
Welehîn qet nayê, qet nayê bîr,  
Her hatî mîna ava avilheyatî  
Û mîna roja geş te da nedîr.*<sup>224</sup>

Her însan bi reng û rûçik, qilafetê rû, tevger an jî taybetmendîyên din ji hev cuda dibin, lê gelek caran ev taybetmendîyên berbehs jî wê firsendê nadine merivî ku pê derxe ku ew însan ji kîjan welat û parzemîn û nijadî ye, gelek caran em merivên ji qewmê xwe an jî ji qewmekî rengdîyar ji ber neşibîna qewmê xwe an jî wî qewmê rengdîyar, nas nakin. Di wê pêngavê da faktora zimanî der tê meherê, her însan bi zimanê xwe tê nasînê û ji xwe ra muxatabekî dibîne.

Kurmanciya Fêrîkê Ûsiv ne kurmanciyeka wisa ya her kesî ye, kurmanciya wî samîmî ye, hilgirê zimanê wî sirûşt e, ajal, teyr û tilûr in, kurmanciya wî ya hemû heyberên li xwezayê ne, her kes jê fehm dike û jê dewayê dibîne, kurmanciya wî *xalis* e. Dema ku zimanê kurmançî ku ji bav-kalên wî jê ra maye lê tesele dibe, lê heye ku bibask be û bifire, heyecaneka nedîtî û nebînayî ye ku dibêje *Her hatî mîna ava avilheyatî/û mîna roja geş te da nedîr*. Wê li me zehmet neyê ku îmajaya wetenîyê ku hêza xwe ji zimên hildide di vê helbestê da rehên xwe berî nava risteyan daye, ji ber ku bingeha hemîyetperwerîyê ziman e. Ev zimanê ku helbestvan behsê dike îmajaya wetenîyê sax dike.

*Car carinan têm melûl, dilxor û mirûz im,  
Lawo, kerba binê lingê te radimûsim.  
Şaş nemîne, berxikê min... êh, kî dizane...  
Dinê heye kaşkişika dest însan e:*

*Dibe rojekê Kurdistanê mezin vebe,  
Bavikê te yê hesret di dil de lê tunebe.  
Bila hingê lingê te bi hesreta min  
Bigere li nava ax û topraxa cimaeta min.*<sup>225</sup>

Helbestvanê ku ji risteyên destpêkê li me eyan dike ku derbasî qonaxeka westîn û êxtîyarîyê bûye di heman lehzeyê da ber bi risteyên paş hêvîya welatekî azad di dilê xwe da dihewîne. Helbestkar li ser wê şik û gumanê disekine ku belkî emrê wî têrê neke ku *Kurdistanê mezin* bibîne lê dîsa jî heman azwerî, bawerî û

<sup>224</sup> Ûsiv, *h.b.*, r. 216

<sup>225</sup> Ûsiv, *h.b.*, r. 261

hêvîya ku wê rojekê Kurdistan aza û rizgar bibe di helbestê da dihewe. Ev helbesta ku di gewdeyê xwe da îmajên êxtîyarî-derengmayînê jî disitirîne zêdetir terxanî îmaja wetenîyê bûye ku ji peyvên Kurdistan, ax, toprax û cimaetê eşkere ye.

*Û navê Kurd û Kurdistan mîna mohreke xadimî  
Û bi kubar, dilbaristan, li ser pêşîra xwe danî.*<sup>226</sup>

Mîna gelek helbestên wî di vê helbesta wî da jî ku di bin îmaja wetenîyê da disenife, serbilindî û serfirazîyek li dar e. Helbestkar di gelek helbestên xwe da li ser pîya ye, dirûşman bilind dike, li hemberî zordestîyê nerazîbûnê nîşan dide û nasnameya wî ya edebî hinekî jî li dor vê meseleyê dirûvê xwe digire, wekî ku di her du risteyên jor da jî eşkere ye îmaja wetenîyê dîsa li pêş çavên me ye.

*Min zîn bikira hespekî şîn boz î kihêl,  
Min bajota merd merd li nava Cizîr û êl.*

*Min bidîta bengz û bala Hesên, Mihemed,  
Min hilkira durriya Mem û Zîna rehma.*

*Min seyr bikira li serê Çiyayê Sîpanê Xelat,  
Min seh bikira fûrefûra Çemê Ferat,  
Min pê daniya ser topraxa kulî tebiyet.  
Min wergirta 'ilm û zanistiya dinyayê tam,  
Min fam bikira sêr û îcadên erşê esman.*<sup>227</sup>

Dilîn, daxwaz û hesretek li dor bêrîkirinên netewî meyîyaye li dar e, xwesteka azadîyê ku bi sîwarbûna hespê va temsîliyeta xwe dibîne piştî vê dilînê dike. Helbestkarê ku di temama emrê xwe da li ser dûrîyê hatîye ceribandîna xîyalên xwe berpêşî me kirîye. Helbest di binyada xwe da îmajeka bêrîkirinê ku nehatîye jîyînê jî dihewîne, ji ber ku tevî ku nav û kesên ku berbehs ji hêla helbestvan va nehatîne dîtinê û nasîne jî, helbestkar dixwaze xwe bigîhîne wan kes û deran. Ber gotîne dikeve ku meriv bêje di helbestê da tevî îmaja netewîyê îmaja bêrîkirinê jî heye. Her wiha helbestkar di meraqa ilm û zanistîyê da ye û tevî vê yekê jî dixwaze sir û razên esmên û fezayê jî bibîne, ev yek jî reng-rûçikê helbestê vediguherîne naverokeka fireh.

---

<sup>226</sup> Ûsiv, h.b., r. 303

<sup>227</sup> Ûsiv, h.b., r. 307

Bo qewlê dawî sewa vê helbestê em dikarin bêje û îfadeyên *Cizîr û Êl, Mem û Zîna rehmet, Çiyayê Sîpanê Xelat* û hwd. weke palpiştên îmaja wetenîyê nîşan bidin.

*Îtbar bi Kurdistan im,  
Bi bax im, bi bostan im,  
Meclîs im, dibistan im,  
Ax, ruhdara min, meçe.*

*Ruhdar î tu, destana'm,  
Ax bêhna Kurdistana'm,  
Tê te wekî bax û bostanan,  
Meçe, çareya min, meçe.*<sup>228</sup>

Reng e ku helbestvan di vê helbestê da bi hasasîyeta wetenperwerîyê ji yara xwe ra nivîsîye, ev gumanek e, gumana din jî ew e ku helbestvan di nava hestên qewî û samîmî da wekî ku ji yara xwe ra binivîse, ji welatê xwe ra nivîsîye. Helbesta ku bûye senteza her du îmajên evînê û wetenîyê bi îfadeyên *meçe, ruhdara min, çareya min* şayesandineka wisa çêkirîye ku wekî ku hestên evînîyê li dar in, dîsa di heman katê da îfadeya *Kurdistan im* dikare bi serê xwe nûnertîya îmaja wetenîyê bike.

*Bila xwezî Kurdistana min şên bûya,  
Miletê min aza, xwendî û bi zêhn bûya,  
Dergeh û dîwan bi ziman û zarê min bûya,  
Qewm û millet li her çar hewarên min bûya,  
Bila hingê ayê şevê li min çar bûya,  
Kelefeyekî wêran ji min re cî û star bûya,  
Qerpalekî reş li stûyê min de xwar bûya,  
Bila gêziyeke dergehvanan li destê min bûya,  
Soqaqeke Êl-Cizîrê "posta" min bûya.*<sup>229</sup>

Însan her tim bengîyê tiştên bidestneketî û dûr e, her tişta ku zû bi zû nayê zeftkirinê asteka sêhrî da tê dîtînê. Ev tişt carna navgînek, carna amûreka teknolojîk, carna keç-kurek, carna dereceyek-meqamek, carna jî emelekî polîtîk an jî welatek e. Axir derdê Fêrîkê Ûsiv jî Kurdistan bi xwe bûye; çem û golên wê, deşt û newalên wê, co û kanî û zozanên wê, an jî çiyayên wê ku Fêrîkê Ûsiv li ser wan helbestên xwe lê kiribûn, em dikarin bêjin hemû xeml û xişra wê ya ku di nezera Fêrîkê Ûsiv da *başqe* bû.

---

<sup>228</sup> Ûsiv, *h.b.*, r. 309

<sup>229</sup> Ûsiv, *h.b.*, r. 333

Me di helbestên jor da behsa dûrîya ji welêt a helbestkar kiribû, helbestkar her tim meraq û mîtaleya welatê xwe kirîye, wî tu ferq nexistîye nava Hewlêr û Dîyarbekirê, Dêrsim û Duhokê an jî bajarekî din ê welêt, dereceya gişkî di çavê helbestvan da yek e, bi çavekî bitûnî û hewîner ji welatê xwe nihêrîye.

Eşkere ye ku helbest di nava hestên gur ên welatparêzîyê da hatîye nivîsînê. Tekane daxwaza helbestkar qencîya welatê wî ye. Wî her tim xwestîye ku qewmê wî li derdora wî be û bi zar-zimanê wî yanê zimanê kurdî xeber din. Helbestkar li hemberî vê xwezilîyê karibûye her tiştê xwe feda jî bike, ferq nake ku ew di nava tehlî û tengasîyê da biçerçire, ferq nake ku şev hetanî serê sibehan ax û waxa wî be, ferq nake ku cihê ku lê dijî xirbe û *kelefeyek* be, ferq nake ku qapût û *qerpalekî* kevn î kol li milê wî be an jî *gêziyek* di destê wî da birize li *soqaqeke Êl-Cizîrê*. Dixwaze û dikare wê vîna sext nîşan bide, di dilê wî da jî tekane daxwaz; *bila xwezî Kurdistanana min şên bûya/miletê min aza, xwendî û bi zêhn bûya...*

*Ez bilbil im – bi qal û dax,  
Tu sorgul î, li dinya û bax,  
Li min re venabî, ax,  
Hey merem û qesta min.*

*Qurn û dewr û sal û zeman  
Heyrî bengzê te ez mam,  
Kurd im, li ku yî Kurdistan,  
Wey dîl û bindesta min.<sup>230</sup>*

Di risteyên ewil da di nava ahengekê da ji îfadeyên sirûştî sûd hatîye wergirtinê. Helbestkar xwe weke bilbilekî ku heyr û hijmekarîya sorgulê ye sêwirandîye û mînakeka serkeftî pêk anîye. Her çiqasî di nava ahengekê da îlankirina eşqekê li dar be jî sorgul (Kurdistan) ji bilbilê ra venebûye. Di benda duduyan da hezkirineka gelekî kûr a bi *dewr û salan* a li hemberî Kurdistanê hebe jî axirî helbestkar negihîştîye mebest û merema xwe. Di temama helbestê da firqetek li dar e, bêtaqetîya gihîştina Kurdistanê firsend li helbestkar birîye, helbestkar her di wê lêgerînê da ye û Kurdistanana xwe digere lê wer xûya ye ku negihîştîye mirazê xwe. Helbest ji peyv û derçûnên evînî piştî xwe qayîm kirîye jî îmajî xurt a serdest hezkirin û arezûkirina welêt e yanê îmajî wetenîyê îmajî serdest e.

---

<sup>230</sup> Ûsiv, *h.b.*, r. 335



*Kurd – tifaq,  
Ez tê de bûm baq,  
Çawa gul li nava zembîl:  
Nav bedew,  
Di nav de bedew,  
Paytextê me Êrbîl.<sup>231</sup>*

Çawa ku helbestkar di helbestên xwe yê din da qelema xwe gihandîye vegotinên tifaqî, di vê helbestê da jî daxwaz û dîmena tifaqî a kurdan bi bedewî sêwirandîye. Di vê hewla wî da meriv dikare xwe bigîhîne şîroveyekê wisa ku helbestvan bi hesasîyetekê welathewîner tev gerîyaye, ji ber ku hêz û bedewîya tifaqê weke gulên bedew ên nava zembîlê hatîye nîşandanê û pêwîstîya têgeha yekîtiyê berpêşî me dike. Di risteya *paytextê me Êrbîl* da jî xwedîderketin û aîdiyetek xwe li helbestê dixê û îmajê wetenîyê pêşkêşî me dike.

*Dengê Arif dengê min bûya,  
Rengê Memê rengê min bûya,  
Sazê Ehmed sazê min bûya.  
...  
Ji huba millet serxweş bûma,  
Li ser best û beyar bûma,  
Bê tirs û xof, zor û qeşeng -  
Min bi dijmin re daniya qal û ceng  
Û bo azadbûna Kurdan  
Serî daniya ax û erdan.<sup>232</sup>*

Wê li me xerîb neyê ku yek ji mijara herî giştî û hewîner a helbesta Fêrîkê Ûsiv hezkirina welêt, nerazîbûna zordestîyê ye û me jî li jorê di bin vê mijara berbehs da destnîşan kir ku Fêrîkê Ûsiv di temama heyata xwe da dûrî welêt jîyaye, ji ber vê dûrmanê gelekî hesreta welêt kişandîye, lewma jî helbesta wî li dor vê hesasîyetê reng digire. Dîsa di temama vê helbestê da bi awayekî eşkere em rastî dewesên tekûz ên îmajê wetenîyê tên. Helbestkar bi daxwaz û dilînên xwe yê kûr xwestîye di nava cimaeta xwe da, di dengê hozanên gelê xwe da, di sûretê lehengên welatê xwe da, di hunera milletê xwe da hebe û de'waya wî ew e ku berê wî li welêt be ne ku piştê wî. Helbestkar di her sê risteyên ewil da bi serbilindî behsa hunera milletê xwe kirîye û bêrîkirinên xwe arasteyî me kirine. Di risteyên dawîyê da jî tevî hezkirina bêpayan a niştimanperwerî, bi gelemperî bi derbirînên epîk bi daxwazeka

---

<sup>231</sup> Ûsiv, *h.b.*, r. 336

<sup>232</sup> Ûsiv, *h.b.*, r. 337

canfîdayî hatîye vegotinê. Bi gelemperî temama helbestê bi taybetî jî îfadeyên *min bi dijmin re daniya qal û ceng/û bo azadbûna Kurdan/serî daniya ax û erdan* vegotinên welatperwer û canfîdayî ne û di bin banê îmajê wetenîyê da kom dibin.

*Kurdistan, Kurdistan, Kurdistan,  
Dayîka min, xweyînga min a axretê,  
Yaziya min, min bext û guman  
Bedbextê li ber bexşa ziyaretê.*

*Dilîkê min fîncana ferfûr e:  
Revî me, kûvî me – li xenîman:  
Kurdistan, birîna min kûr e,  
Melhem bike notilanî hekîman.*

*Bi ser min de xeber de, qise bike  
Ji bextêd şairêd xêr nedî,  
Muhbeta dilan li min teze bike  
Bi qîza xwe ya hubbeledî<sup>233</sup>*

Helbestkar di nava monologekê da bi Kurdistana ku şexsandîye ra diaxive û jê merhemet û xwedîderketinê dixwaze. Di risteyên ewil da helbestkar welatê xwe weke dêya xwe, xwe jî weke ewladê wê dîtîye û ji wê xwestîye ku destê xêrê dirêjî wî bike û xwe bi beqî serê wî ji gêrdawê bifilitîne. Peyva *yaziya min* jî peyveka mişt bi hezkirin e ku însan ji bo evîna xwe bi kar tîne, helbestkar di wê peyvê da hezkirina bêpayan a li hemberî welatê xwe nîşan daye.

Di benda duduyan da helbestvan dilê xwe şibandîye fîncaneka ferfûrî ku zû dişkê an jî temsîliyeta derizîn, şikîn an jî têkçûnê dike. Helbestvanê li hemberî vê şikîn, xerîbbûn û kûvîbûnê xwe davêje ber bext û gumana Kurdistana dê û jê dixwaze ku birîna wî ya ku xedar e bi destê wî yê başker bê cebirandinê. Bi vî awayî hewlên welatperwerîyê ku belavî helbestê bûne îmajê wetenîyê saz dikin.

*Êdî dibare,  
Li ser çiyayê Kurdan niha dibare.  
Dibare, wekî zozanan şîn bike...  
Dibare, wekî  
Ger û deştan tijî sorgula bi bêhn bike.  
Dibare, çimkî berî baranê  
Çiya û banî di xwîna Kurdan de sor bûn,*

---

<sup>233</sup> Ûsiv, h.b., r. 383

*Çemêd çivane bi xwîne bor bûn.*<sup>234</sup>

Dinya her wextê di nava şer û pevçûnên giran da livîyaye û sekinîye. Împaratorîyên mezin bi bayê netewperwerîyê şûna xwe dane welatên milî û piçûktir. Di temama dinyayê da her welat ji bo tayînkirina qedera xwe ji şerên xedar û ezmûnên dijwar derbas bûne û xwe gîhandine qonaxekê ku tê da desthil û xweyîgotin bin. Bêyî ku xizmeta klîşeyekê bike û derî mijara me be, hêjayî behskirinê ye ku welatê kurdan jî her tim di nav qirkirin û enfalan da gevizîye û heta îro jî zilm û zordestîya ku di axa kurdan da pêk tê li ber çavan e, mîna her milletî gelek ewledên kurdan jî li ber vê zilmê rabûne û welatê xwe parastine, her çiqasî kurd îro bi temamî rizgar nebîbin jî tu kes nikare înkare bike ku gelek qehremanîyên mezin li xaka kurdan qewimîne.

Helbestkar jî bal kişandîye ser vê meseleyê û bi me daye zanîn ku rewşa xweş û aramdêr a ku li dar e beqî serê hin bedelan e ku kurdan daye. Berîya ku rewş veguhere normalê û *ger û deşt tijî sorgul* bin kurdan ji xwe gelek dane û xwîna xwe kirîye senedê xweşîyên asûdetîyê.

Di helbestê da tevî derbirînên cengî û vegotinên epopeyî îmajê wetenîyê heye, îfadeya sorbûna çiyayan a di xwîna kurdan da jî xala hilbûnê ya vê îmajê ye.

*Me bi mal û milletî nekir şîn û girî,  
Şîna şehîdiya te Merdemêrî.  
Me li roja ava nihêrî,  
Wekî ku emir dide rojeke din,  
Me li toximê şovan nihêrî,  
Wekî ku zeviyên dide gihandin  
Me li serê wan lawan nihêrî  
Ji kîjanan re dibê'n, Barzanî  
Û me bi sebrê girî guherî,  
Me bi hêsiran nekir erzanî.*

*Bila ew millet hêsiran birêje,  
Yê ku nikare birêje xwîne,  
Yê ku çewdera riziyayî davêje,  
Dixwaze genim hilîne li şûnê.*

*Lê me ew qas xwîn di meydanan de rêt,*

---

<sup>234</sup> Ûsiv, *Sûretsûfê*, r. 101

*Wekî em pê de bûne Cegerxwîn,  
Em bûne Hejar, Şivan, Celadet,  
Xoşnav, Xêrûleh, Leylê û Mehmûd.  
Em bûne lawên wan dayikên tê,  
Ku tûr vedide her yek bîst berî,  
Û mîletê me li nava surr û şextê  
Ragihîşte bîst milyon neferî.*

*Bileh, serê me ket, lê em nagirîn,  
Şîna te nakin, bavê cimaetê,  
Em ê mînanî kurîkê dêm birîn  
Bigirîn, bikenin li hember hembêza dê:*

*Dayîka Kurdistan kîngê xwe ragirt,  
Kîngê merema te hate sêrî,  
Hîngê wê li nava şayiya me ya gurr  
Bihele şîna te Merdemêrî.<sup>235</sup>*

Ji bo destnîşankirina îmajê wetenîyê ya vê helbestê bendeka vê helbestê jî têrê fikir lê me xwest aheng û lihevhatina helbestê xera nekin û helbestê bi temamî û yekser bigîhînine we. Helbest li ser mirina Mele Mistefa Barzanî hatîye nivîsînê û meseleya eslî ya helbestê tevî xemgînîyê metanet, qerardarî û xweragirîyê ya li hember şîne ye. Helbestkar radigîhîne ku di pêvajoya mîletbûnê da gelekî xwîna xwe rijandine û xwîn dane rijandin ku pê ra bûne *Xoşnav, Xêrûleh, Leylê û Mehmûd*.

Lûtkeya helbestê benda dawî ye ku tevahîya merem û mebestê dihewîne. Di vê bendê da tê destnîşankirinê ku kîngê Kurdistanê xwe ji neyarê xwe xelas kir û serxwebûna xwe bi dest xist dê wî çaxî di nava wê şên û şahîyê da birîna wan hinekî bicebire û şîna Mele Mistefa Barzanî piçekî kevn be yan na wê her tim teze bimîne şîna wî.

Mebesta nivîsînê ya helbestê, navên navdarên kurd ku di helbestê da kifş in, telaşa arastekirina hesta milî û daxwaz û dilîna azadîyê vê helbestê bi îmajê wetenîyê dimeyîne.

*Wê bicivîne bi top û tifaq  
Hemû wersele û weynaxên xwe,  
Lê de qet bike bendan taq bi taq  
Û rapêç bike av û axa xwe.*

---

<sup>235</sup> Ûsiv, *h.b.*, r. 187-188

*Hingê wê şên bin, bax û bostan  
Dêrsim û Duhok, Hewlêr û Cizîr,  
Û li ber daminê dayîka Kurdistan  
Wê gul din xortên mînanî Wezîr.*<sup>236</sup>

Hêvîya dahatûyeka baş bi hin şertan va girêdayî ye, ji bo gihîştina hin qonaxan divê meriv bixebite, li ber xwe bide û biafirîne. Helbesta ku di bin sîya hewlên epopeyeka nispî da şikl girtîye xwe spartîye hestên welatperwerîyê. Helbestkar bêyî ku ferqekî bixe navberê bi çavekî bitûnî li bajarên welatê xwe û *av û axa xwe* nihêrîye. Tê destnîşankirinê ku heke meriv ji bo warê xwe têbikoşe û lê xwedî derkeve wê welêt ji hemû deman baştir be û *Wezîran* terxanî civatê bike. Di helbestê bi nîşandana bajarên kurdan, nimandina Kurdistanê û mînaka Wezîrê Eşo nîşaneyê îmajê wetenîyê ye.

*Hinek dijîn bi mal, nefer,  
Hinek – xerîb, tenê, wehîd.  
Hinek – xwendî, hinek – nezan ,  
Hinek li gund, hinek li bajêr,  
Hinek li nava kela û zindan,  
Hinek di binê agirê şer.  
Hinek dût in, hinek nêzîk,  
Hinek – li Îran, hinek li Tûran,  
Hinek sond dixwin bi “Êzdî”,  
Hinek – bi “kitêb û Quran”.*

*Lê em gişk jî birayên hev in,  
Temê dê û bavekî eyan,  
Navê bavê me Kurdo ye,  
Navê dayîka me – Kurdistan.*<sup>237</sup>

Ji ber şert û mercên heyatê, şer û cengên xelasnebar û mezinbûna welatê kurdan kurd di axa xwe da lê di nav resmîyeta dewletên cuda da jîyane, bûne mensûbên dîn û mezhebên cuda û heyatên cihêreng. Ev jî dibe sedemeka têra xwe ku kurd ji hêla taybetmendîyên berbehs ji hev dût bijîn, dema ku ji hev dût dijîn di nava wan da cudahîya hin tiştan gelekî tebi’î ye. Helbestkar di nava van hemû cudahîyan da jî bawerî bi yekîtiyeka netewî anîye û xîyalên siberojên azad kirîye ku ev jî dewesên îmajê wetenîyê ne.

---

<sup>236</sup> Ûsiv, h.b., r. 256

<sup>237</sup> Ûsiv, h.b., r. 257

Helbestvan bi mebesteka hewîner û dilînên pêkhêner hestên xwe ber bi helbestê va ajotîye û bal kişandîye ser meseleyê ku her çiqas kurd li welatên cuda da bijîn, mensûbê dîn û mezhebên cuda bin û çîrokên wan ji hev cuda bin jî axirî her kurd Kurdistanekê dihewîne di dilê xwe da. Ev bangawazîya yekîtgir cehdeka welatparêz bi xwe ra tîne û bi vî awayî dibe berdevkê îmajê wetenîyê.

*Li vir dimîne wekî ez  
Defterên xwe bibim bi lez  
Û bixwînim seranser  
Şi'rêd xwe ye kesk û zer  
Der heq Kurdistanê dê,  
Keserêd xwe yêd miletiyê;<sup>238</sup>*

Ji bo hemû helbestên ku tê da banga yekîtiyê û dewis û êşa miletiyê heye, em dikarin kêr-zêde heman şîroveyan bikin. Hemû jî ji nerazîbûna zordestîyê, dijwarî û çetînîyên ku li mişextîyê rû didin û hesreta welatekî azad û yekgirtî heye. Ji bo însanekî hezkirina herî eşkere ew e ku meriv tiştêkî bişibîne *dêya* xwe, helbestvan jî di vî helbestê da ji hunera edebî ya teşbîhê sûd wergirtîye û xwe avêtîye ber bext û hewara *dê*. Dîsa yek ji wan helbestên Fêrîkê Ûsiv ku tê da sewa Kurdistanê xwe *şî'rêd xwe ye kesk û zer* lê kirine berbehs e. Şik tê da tune ye ku dewis û derçûnên weke *şî'rêd xwe ye kesk û zer, der heq Kurdistanê dê û keserêd xwe yêd miletiyê* delîlên têra xwe ne di derbarê îmajê wetenîyê de. Helbestvan bi helwesteka hewceyî aşkirinê Kurdistanê xwe kirîye dewsa *dê* û wisa tev gerîyaye, ev jî dibe palpiştê îmajê wetenîyê.

*Dijminêd alçax bi kirêd kirêt  
Vejandin dezgeh û durişmên welêt –  
Nûr û nifûsa te ya serbest e aza  
Bû antêxa li bin heft kele û koziyan;*

*Derc nekir neyar, ku dereng yan zû,  
Wê ji antêxê rabin pêlasû,  
Şoxêd şivêta Şerefxan, Xanî,  
Şêx Ubeydulah, Mela Barzanî,  
Zahar û Mehmûd, Hecî, Celadêt,  
Leylê – berxika qurbana welêt,  
Cotê Cizrawî, Îsa Berwarî,  
Îbrahîm Delal, Şivan Perwerî,*

<sup>238</sup> Ûsiv, *Êvara Zivistanê*, r. 344

*Yilmaz, Cegerxwîn – qelemkêşê xurt,  
Kendal û Şakiro, Eyşe Şana Kurd;*

*Mizgînê me yê Xanê Çengzêrîn,  
Yê xwedan rûblî, mark û stêrlîng.  
Li ber nûra van gelhezên mezin  
Êl û eşîr wê bi hev du bihesin.  
Wê bi rehm û însaf, bi xem û xîretî  
Şên kin welatê xwe yê ziyaretî.<sup>239</sup>*

Di vê helbestê da bêtir dirûşmeka hêvîdêr heye, hestên netewî ku ji xwe ra ji çar perçeyên welêt nûneran dibîne hewayaya polîtîk dermale dike. Helbestvanê ku balê dikişîne li ser welatekî serbest û aza ku ji hêla dijmin va hatîye texrîbkirinê wê bi Şerefxan, Xanî, Şêx Ubeydulah, Mela Barzanî, Şivan Perwerî, Yilmaz, Cegerxwîn û Şakiroyan va xwe bigîhîne azadîyê. Helbesta ku bi nîgaşên welatawer qewî bûye bi navên navdar ên dîrok, hunera û edebîyata Kurdistanê va îmaja wetenîyê anîye me' derê.

### **3.7. Îmajên Mirinê**

Ev îmaj serdema payîzê ya helbestvanan e. Helbestvan pê dihesin ku êdî naqosên mirinê sewa wan lêdidin. Derengîya ku helbestvan pê dihese, bêtaqetî, hîsa êxtîyarîyê, rev, daxwaza veqerê ya bo zarokatîyê û reşbînî mijarên sereke yên vê serdemê ne. Mijarên kêf, eşq, tebî'eta serxweşker û pêsîrên kezîzeran êdî cihê xwe bo mirinê vediguhezînin. Helbestên ku dengê şalûl û bilbilan jê kêm nedibûn êdî wê ambîyansê sewa dengê qijik û pepûkan dihêlin. Ser meseleyê dibe ku ev helbesta jêr bibe nûnerê îmaja mirinê di helbesta Fêrîkê Êsiv da. Helbestvanê ku emrê xwe terxanî çemekî dike di heman demê da, di wê tirsê da ye ku ew çemê wî bimiçiqe û tu wextê xwe negihîne behrên boş û oqyanosên har, helbestvan tirsê mirinê û telaşa derengmanê gelekî xweş der birîye.

*Ax dibe binice*

---

<sup>239</sup> Êsiv, *h.b.*, r. 333

*Çemê min li van deran  
Û neçe negihîje  
Tu oqyanos û behran*<sup>240</sup>

Meriv dikare gelekî bi rihetî rastî vê îmajê were di helbesta gelek helbestvanan da. Bêkesî, dûrî, tenêtî û sedemên nêz vê pêvajoyê zûtir û bi tesîrtir dikin. Em ê ji vir şûn da bi helbestên ku li dor vê îmajê dimeyên va dewam bikin.

*Mirin heye, ji bo me ye,  
Li cihê bêmirin nagerim,  
Ez ê hildim tembûra xwe,  
Li pey evîntiya dil herim.*

...  
*Ax, ditirsim mîna Mîrmih  
Emrê min here bê xeda,  
Yanga dilê min dixwaze,  
Bîter nebe li tu erdan.*<sup>241</sup>

Helbestvanê ku di risteya ewil da heqîqeta mirinê qebûl dike û haj pê heye ku mirin sewa hemû zindîyan e, di heman katê da xwe berdide nava wê heqîqetê û dil lê heye ku li cihê bêmirin peyda nebe. Helbestvan dixwaze enstrumana xwe ya ku navgîna derbirîna eşqê ye di xizmeta evîna pak da xerc bike. Helbet îmajê mirinê di vê helbestê da bi îmajê evîne va dermale dibe û ji hunera bibîrxistinê (telmîh) jî sûtê werdigire. Di çarîna duduyan da jî ditirse ku ew jî mîna Mîrmih di zehmetîyên dijwar da bigevize, emrê wî di rêyeka sext da badilhewa derbas bibe. Bo axirîyê jî di wê meylê da ye ku bibe xwirê mirineka wisa ku tu wext û zemanê ber bîrê nekeve û li tu erdî zîl nede. Helbet meriv dikare ji hêla psîkolojîk û xeydekê va jî li dawîya vê helbestê binêre. Gelo çî ye ya ku helbestvan wisa bi mirûz û mehdetirş ber bi mirinê va dixişikîne? Gelo çî sedem heye ku helbestvan dixwaze wisa here ku perçeyek xwelî jî ji wî nemîne? Dibe ku ev mesele jî bibe binbeşeka din a vê xebatê lê em dizanin ku îfadeyên mirinê û daxwaza veqetîne ya ji vê dinyayê îmajê mirinê gur dike û berpêşî me dike.

*Dilê min dibe xem,  
Xwe bi xwe ji xwe dipirsim:  
“Ax dibe binice  
Çemê min li van deran*

---

<sup>240</sup> Ûsiv, *Hesretdefter*, r. 112

<sup>241</sup> Ûsiv, *h.b.*, r. 95



*Û neçe negihîje  
Tu oqyanos û behran.*<sup>242</sup>

Me li jorê bi kurtasî behsa vê helbestê kiribû û gotibû ev helbesta ku bi îmajê mirinê va meyîyaye dibe ku nûnertîya îmajê mirinê ya helbesta Fêrîkê Ûsiv bike. Esas di vê helbestê da yekser behsa mirinê nayê kirinê lê bi awayekî sergirtî tirsê mirinê li dar e, jî ber ku çemê însan ber bi mirinê dimiçiqe, reng e ku her helbestvan tirsê mirinê û êxtîyarîya xwe bi awayekî din semolîze bike, ser meseleyê spîbûna por, hilweşîna belgan û vegotinên bi vî awayî... Helbestvan psîkolojî û atmosfera xwe ya wê demê baş raberî me kirîye, dema însan ber bi dawîya emrê xwe tê jî nişkê va pê dihesê ku wehdeyê xwe temam kirîye, di wê kêlîyê da li dû xwe û berhem û hilberînên xwe dinêre, êdî wext nema têrê dike û dikeve nava telaşekê ne jî wan telaşan, dixwaze her tiştî zûzûka xelas bike û xwe bigîhîne qonaxeka jî wan qonaxan ku tê da hukmî nemirîye bike. Axir her tişt di wê hengameyê da rû dide û ev vegotinên derengmanê û mirinê mehsûlên wê pêvajoyê ne. Bo cara axirîyê em dikarin amajê bikin ku miçiqîn an jî nicîna çemî û ew tirsê ku negihîştina çemî bo oqyanos û behran îmajê mirinê saz dike di helbestê da.

*Li nava mal û hal, star û siyan mêvan im ez,  
Li kêşwerê dîne Îsa mêvan im ez,  
Êh, hez dikî dînya Kurd bûya û Kurdistan,  
Axirî û oxirî, yek e, dîsa mêvan im ez.*<sup>243</sup>

Di vê helbestê da îmajên netewî û mirinî di nava hev da dihewin. Helbestvan bi qebûlî û teslîmîyetekê dest bi helbesta xwe dike û wisa jî diqedîne. Xwedîyê risteyan di hemû rewşan da jî behsa mêvanîya xwe ya vê dinyayê yanê mirinê kirîye. Yanê te divê bila dewlemend an jî kesîb, li koçk û serayan an jî li kavil û kelefeyan, li qefesa welatê xwe an jî di paşîla tarawgeh û xurbetîyan, di nava koma qewm û pismaman an jî tik î tenê... Her kijan rewşê da dibe bila bibe heqîqetek heye ku ew jî mirin e. Helbestvan gelekî bi serkeftî bal kişandîye li ser vê neçarîya mirinê û îmajê mirinê bi me daye hesandinê

*Ez hê dikarim, gelî xortan,  
Bi we re rabim gulaşê,  
Şepeyên berfê biqelêşim*

---

<sup>242</sup> Ûsiv, *h.b.*, r. 112

<sup>243</sup> Ûsiv, *Sûretsûfê*, r. 63

*Û nekim tu talaşê.*

*Dest û lepên min merd û mezin  
Dikarin lasan lod bikin,  
Û binivîsin şî'rêd nazik,  
Nexşên zêrîn zod bikin.*

*Lê hûn dikarin bi pirseke xêv  
Dilên qîzan bikirrin,  
Ez nikarim bi hezar şî'r,  
Wekî pê de lal û durr in.<sup>244</sup>*

Dîsa zalimîya zemên û neçarîya êxtîyarîyê bi hemû eşkeretîya xwe va li dar e. Helbestvanê ku xwe enerjîk hîs dike û kapan bi xortan ra diavêje û dikare yên wekî wan ji berîka xwe derxe leqî yemanîya zemên tê û bi vê nevê şûrê xwe bêyî ku bicenge daydine erdê. Helbestvan destnîşan dike ku quweta wî hêj di cih da ye û dikare bi xortan ra gulaşê bigire, bêyî ku telaşeka piçûk jî lê tesele bibe, bide nav çol û çiyayan û berfê biqelişîne, di nava zevî û zîyanan da bi bokeberanîya xwe rênçberî û paletîyê bike û helbet helbestên nazik binîvîse ku pêkolîyê li dem û dewranan bike. Lê telebext ra çî bextekî yeman e ku helbestvan haj pê heye ku merdemêrî, cuwanmerdî û qelemşûrîya wî îro ro nikare li hember nebalixî û xortanîya gencan li ber xwe bide, lewra emr xezîneyeka wisan e ku qîmeta wî nayê hesabê û bêpayan e. Îro ro xortek dikare bi gotineka nekemilî dilê qîzekê zevt ke, ne ku egîdî, zanatî û kelambêjîya helbestvanekî ketî. Bi kurtasî îfadeyên kaltîyê û derengî li dar e ku bingeha îmajî mirinê ye.

*Firiyân çûn ew roj, ew ref, amojîn û zarokatiya zêr,  
Firiyân ew ref jî îşev, dagêr e, dilo, dagêr.<sup>245</sup>*

Tekane tişta ku meriv nikare li hemberî wê ber xwe bide zeman e. Zeman di nezera her kesî da wekî hev e, hin kes wehdeyê ku lê hatîye spartinê baş derbas dîkin û dibine kevirên mayînde yên tarîxê, hinek jî bêyî ku haja wan pê çêbe û destê wan da tiştekek hebe diwarqilin ku qewl û qerar temam bûye û xwe daye ber derîyî. Di pêvajoya temambûna vê wehdeyê da sal û zeman didine pey hev, meriv hew lê dinêre ne zarokatî ne jî xortanî di dest da maye tevî ku însan mîrsekê li pey xwe bihêle. Helbestvan jî di vê helbesta piçûk da balê dikişîne ser wê yekê ku dema ku

<sup>244</sup> Ûsiv, h.b., r. 69

<sup>245</sup> Ûsiv, h.b., r. 77

wehdeyê însan tamam be êdî tu wateya heyatê namîne û xwetevdan badilhewa ye. Teslîmîyet û qebûlîyeta ku di helbestê da li dar e îmajê mirinê terxanî me dike.

*Wê me jî dayne,  
Em ê jî herin,  
Hûn ê bimînin  
Çiyayêd miqerim.*<sup>246</sup>

Helbestvan li hemberî derbasdarîya beşer mayîndebûna tebî'etê ber behsê xistîye, her çiqas mayîndebûneka qebûlbîner a xwezayê hebe jî ya soxî hezar sal berê niha deştên ku em lê dihewin ne wekî vê rewşa xwe bûn, çiyayên ku berê me lê ne û nermebayan bexşî me dikin ne wekî niha bûn, yanê di cîhanê da her tişt merûzî guherîn û nemanê dimîne lê hin tişt li gorî hin tiştan qewîtir û mayîndetir in. Baş e, em werne ser meseleya man û nemana însan, yanê însan diçe, ji ber ku wehdeyê ku lê hatîye spartinê tamam dibe. Helbestvan jî bi nazik-helbestekê meseleya mirinê ber behsê xistîye û îmajê neman û mirinê destnîşan kirîye. Vegotinên *em ê jî herin, hûn ê bimînin* kevîrên sûra îmajê ne.

*Ax ya Rebî, ez rojên ceng  
Bêhteng dibim, diaxim,  
Lê li nava gora tarî û teng  
Ez ê çawa teyax bikim?*<sup>247</sup>

Meriv li gor haletî rûhîyeya xwe tev digere, diaxive, hildiberîne û sekna xwe nîşan dide, wer dixûyê ku atmosfera mirinê ligel kalbûna helbestvan îmajeka wiha derxistîye holê. Helbestvan me pê dihesîne ku di rojên cengê da jî nikare teyax bike û xwe li ambîyanseka berbad a bêumîd dipêçe, îja di cengê da jî rewş wiha be gelo wê di qebra reş da çawa be gelo? Helbestkar xwestîye qala vê atmosfera xerab bike û bi vê tîrsê îmajê mirinê derketîye holê.

*Di ser şaneşîn û şênlikê min re  
Sal ê bifirin nolî sîmiran.  
Û wextekê jî du rênçber wê bîn,  
Xwe bidin ber siya axilê min ê şên:  
–Hey gidî, –bibêjin, –Fêrîkê rehmetî  
Li ser van tam û taşan çî qas zehmet dî.*<sup>248</sup>

---

<sup>246</sup> Ûsiv, h.b., r. 152

<sup>247</sup> Ûsiv, h.b., r. 195

<sup>248</sup> Ûsiv, h.b., r. 217

Helbestkar di vê helbestê da mirina xwe sêwirandîye, Wê sal di ser şaneşîna wî ra mîna sîmiran bifirin û wê wext bê *du xulam û rênçber bîn xwe bidine ber siya axilê wî yê şên* û bibêjin hey dinyayê qeda û bela li te keve *Fêrîkê rehmetî, li ser van tam û taşan çî qas zehmet dî*. Di vê helbestê da helbestkar ketîye wê atmosfera mirinê, di vir da emrê helbestkar çî dibe bila bibe îmajî mirinê eşkere ye.

*Payîza emir ha hucûm dike,  
Derp derp lê dide, bê qudûm dike.  
Em bi heyr û hesreta per û baskan bûn,  
Niha ji lingan jî me mehrûm dike.*<sup>249</sup>

Helbestkarê ku di de'wa per û baskan da bûye îro ji lingan jî mehrûm bûye. Barkem merem û mebesta helbestê têra xwe eşkere ye. Helbestkar nîşan dide ku qewl û qerarê ku xwedê dayê îro diqede û payîza ku serdema dawî ya emrê însanî ye êrîşî wî dike û taqetê lê dibire. Bêyî ku em gotina xwe dirêj kin em dikarin ji vegotinên jor ên berbehs va îmajî mirinê ku bi êxtîyarîyê va dermale bûye destnîşan bikin.

*Ez ku mirim, hûn meytê min çehl kin li pêşa çiya,  
Bila bibin kumeytê min tûmên ket û kunciyên.*

*Bên li ser mexberê min biçêrin berx û kar,  
Berxvan bibêjin ezberên min heyran û hijmekar.*

*Şivanekî kal î helke – dilsaxekî fadil  
Serhatiya min şîrove ke, ji wan re bibêje bi dil:*

*“Ew jî mîna me rênçber bû, birakê me yê mezin,  
Kerî-sûrîyekî biçûk li ber bû, kîs dikir berx û bizin.*

*Me tev li ser kenarekî nan û toraq dixwar,  
Radibû ser zinarekî, dinihêrî li çarniqar;*

*Axiriyê jî çû û bû xwendî, di bajêr de bû şaîr,  
Lê bi ruh ve ma dîsa gundî, maşoqê çol û çayîr;*

*Zehf digeriya li van çol û baniyan, dipesinî feruh,  
Belkî xwedê van çol û baniyan bigihîne ber ruh”*<sup>250</sup>

---

<sup>249</sup> Ûsiv, h.b., r. 332

<sup>250</sup> Ûsiv, Êvara Zivistanê, r. 254

Daxwaz û wesîyeta çehlbûna li pêşa çîyayan a Fêrîkê Ûsiv ji hezkirina *ax-topraxa* wî tê, ji ber wê ye reva wî ya ji bajêr û qelebalixîyê. Weke ku helbestên wî qolyeya poetîkaya wî ne, wî di tebî'etê da xwe hingî bêjî aram hîs dikir û helbestên xwe li zozanên Elegezê, *rast û dûzên* Pampa xwe û li *sirtên Qûç û Qemerdaxan* lê dikir. Ji ber wê ye ku di helbestên xwe da hewara xwe wiha digîhîne;

*Çaxê li axê ez bûm heqî,  
Li min nedin xêr û baqî:  
Bila yar bên hev ramûsin,  
Li ser min bibêjin beytên Feqî.*<sup>251</sup>

Helbestkar di nexweşîya xwe ya dawîyê da xwe nêzî mirinê hîs kirîye û temama helbestên wî yên dawîyê da îmajên êxtîyarî, mirin û hesretê berke-berk tê kifşê. Heqîbûna di axê da tê wateya mirinê. Helbestkar di wê meylê da ye ku piştî mirina xwe telebkarê xêr û bereketê nîn e, bes bila li ser qebra wî hûb û hewes tevî beytên Feqhê Teyran kêr nebin. Helbesta ku ji telmîhê sûd wergirtiye çavê xwe bi îmaja wetenîyê ra qirpandibe jî, îmaja desthil mirin e.

*Min çî qasî dixwest ax, hezar guman,  
Ku wextê mirin li min bibe mêvan,  
Cimaeta min meytê'm şairî  
Çehl bike li serê Çiyayê Dibûrî.*<sup>252</sup>

Helbest bi destlêdanên xwezayê va dermale bûye û şopa îmaja tebî'etê jî tê da dixûyê lê ji ber ku mebesta eslî ya helbestê mirin e, me di vê binbeşê da cih da vê helbestê. Di hemû risteyên helbestê da jî mirina ku berbehs e li dar e, ji ber wê em yeko-yeko behsa hemû risteyan nekin lê bi kurtasî helbestkar dixwaze meytê wî bibe mêvanê axirîyê yên li berpalên çîyayên Elegezê û atmosfera ku li wan çîyayan li dar e piştî mirinê jî berdewam be. Tabloya zindî ku di helbestê da jî heye berdevkê vê mirinê ye di esasê xwe da. Ev jî îmaja mirinê raberî me dike. Helbet tevî îmaja mirinê hezkirineka li hemberî welêt jî li dar e, ji ber ku welatparêzî ji ax û zimên dest pê dike. Fêrîkê Ûsiv weke welatê wî Kurdistan be li Elegezê û li gundê xwe Pampê hez kirîye, ji ber ku ji zimanî bigire hetanî, edet, şîn û şahî, jîyana rojane ku xwe disparte telaşeka Kurdistanî her tişt kurdewar bû. Sedem ew bû ku Fêrîk xwe diavête qefesa Elegezê ku di nezera wî da Kurdistan bi xwe bû. Wekî ku li jorê berbehs bû

<sup>251</sup> Ûsiv, *h.b.*, r. 359

<sup>252</sup> Ûsiv, *h.b.*, r. 360

îmaja mirinê û ya wetenîyê di heman sîtilê da dikelin. Lê me behsa îmaja desthil yanê îmaja mirinê kir.

*Ez kal im, extiyar im, ji hal ketî,  
Dilê min – zareke bêfam û nehs.  
Şev û roj bê hewal, bê tabetî  
Nahêle hêsa bim, rihet bim ez.*<sup>253</sup>

Ev helbest li gorî haletî rûhîyeya ku helbestvan tê da ye şikl girtîye. Însan ber bi êxtîyarîya xwe hesastir, xeydokter û ‘eksîtir dibe. Dema nêzî mirina xwe dibe jî, însan li gorî wê di heyata xwe da, huner û berhemên xwe da şewq vedide. Pareka mezin a qonaxa dawî ya helbestên Fêrîkê Êsiv da îmaja mirinê li dar e, ev helbest jî yek ji wan e, Helbestkar dilê xwe şibandîye zareke bêfam û nehs, gilî û gazincê wî ji bêhal û bêtaqetîya wî heye. Ev pêvajoya nesaxîya ku teqabulî nêz-dîroka mirina wî dike di heman katê da bi vegotinên xwe yên jor va îmaja êxtîyarîyê û mirinê nîşanî me dide.

*Ez ku mirim –*

*Min bi axreteke axreta nûrîn,  
Defîn kin hûn li ser Çiyayê Dibûrî;  
Ku bihatana kerî, bihatana sûrî  
Dora tirba min li Çiyayê Dibûrî –  
Hingê ruhê min – berxvanê berê,  
Hêl bûya ji hesreta xubara qebrê,  
Tevî keriyê pêz ji çiyayê bilind,  
Êvaran bihata belav bûya li nava gund.*<sup>254</sup>

Fêrîkê Êsiv di gelek helbestên xwe da telebkare çehlbûna qûntarên çiyayê gundê xwe bûye ku ev gund ji gundên Kurdistanê cuda nebûne, bi hilm û hewayê bigire heta şîn û şahî û rîtuêlên xwe û jîyana kurdewar va ji gundekî Kurdistanê zêdetir kurd bûye, axir derdê Fêrîkê jî ev bûye ku ji Çiyayê Dibûrî nehewîyaye (dev jê bernedaye).

Dîsa ev helbest yek ji wan helbest-wesîyetnameyan e ku helbestvan dixwaze li Çiyayê Dibûrî were çehlîkirinê, erê, were çehlîkirinê ku ruh û bedena wî dîsa li wê

---

<sup>253</sup> Êsiv, h.b., r. 361

<sup>254</sup> Êsiv, h.b., r. 363

*topraxê jîn be. Ji îfadeyên, axret, defin, tirb, ruh, qebr û hwd. jî kifş dibe ku îmaja mirinê di vê helbestê da hukmê dike.*

### **3.8. Îmajên Qerfî/Mîzahî**

Qerf an jî mîzah ji sedsalan vir va ye di heyata însanan da cih digire, çîrokên fablî ku dersdêr in, laqirdî, metelok û hwd. binê vî zemînî mehkem dikin, di van helbestên qerfî da esse peyamdêrî û dersdarî jî hene, helbet ev peyam û ders her tim sewa hişyarîyê nîn in, carnan jî sewa ragihandina bûyerekê ye. Axir sewa çi dibe bila bibe tê da qerf û ken heye, wekî ku tê zanînê Fêrîkê Ûsiv ne tenê helbest, di heman demê da pîyes, destan û laqirdî jî nivîsîne, ji ber ku sînore xebata me bi helbestan va sînordar bû me laqirdîyên wî nekirine bin banê vê xebatê, lê ji ber ku helbestên wî yên mîzahî jî têra xwe hene, me hewce dît ku beşeka bi navê “Îmajên Qerfî/Mîzahî” jî vekin. Em ê bi mînakên jêr behsa şîrove û analîzên van helbestan bikin.

*Agir girtibû kincê merivekî,  
Ji alava gurr ew dişewitî:  
Mîna dînan zû zû ew dibezî,  
Ha dikir hewar, ha dikir gazî:*

*- Birano, komek, ez dişewitim,  
Ax, bextê we me, ca min xelas kin!  
Lê kesî gaziya wî seh nedikir,  
Ji wê zulma giran xelas nedikir.*

*Û feqîrî li nava wê qal û belayê  
Dixwest bibîne çar û mecalê:  
Ancax çavê wî bi çemê pêşber ket,  
Hat û bi cefayekê ber bi çem bi rê ket.*

*Xwest bi alavê ve xwe di nava avê xe,  
Belkî ruhê xwe yê şêrîn aza bike,  
Lê dewlemend wiha li pey wî kir gazî:*

*-Ca sebir bike, çima wiha bi lez î?  
Bise, cixareya xwe li te vêxim,  
Agirekî wiha ez ê ji kû bi dest bixim?<sup>255</sup>*

Me dîsa ji bo ku atmosfer, peyamdêrî û serwextîya helbestê xera nebe ne qismeka helbestê lê temama helbestê raberî we kir. Mesele wiha rû dide; agir bi

---

<sup>255</sup> Ûsiv, *Hesretdefter*, r. 50

feqîrekî ketîye û feqîr di nava heytehol û hêwirzeyekê da dixwaze xwe xelas ke, dewlemendê ku keysa xwe bi agirê feqîr tîne bêyî ku li hawar û fixana feqîr binêre, dixwaze ji rewşa ku zirarê dide feqîr îstîfde bike, helbesta kafkasê hinekî jî li hember milkdar, kapîtalîst, sermîyan û çîna serdest teşe girtîye, reng e ku mebesta helbestvanî jî ew be ku bi me bide zanînê ku milkedar dijminê gel in û ji rewşa wan a nexweş fehm nakin. Ev gumaneka mehkem e di şî'rê da. Îfadeyên *-ca sebir bike, çima wiha bi lez î?/bise, cixareya xwe li te vêxim,/agirekî wiha ez ê ji kû bi dest bixim?* jî merem û mebesta helbestê der dibin. Helbestvan tevî ku ji hunerên edebî ên weke pirsîrsîn(îstîfham) û şibandînê jî sûd wergirtîye, di helbestê da armanca sereke tevî peyamdêrîyê vejandina îmajê qerfê ye.

*Kalekî extiyar,  
Belengaz, bêçar,  
Piştî dar li piştê,  
Balte li teniştê,  
Ji nava mêşe  
Tê û dibêje:*

*“Di mala min de, ar tune,  
Dirlik tune, dar tune,  
Tenûr sar e, kod rijî,  
Ne dewe, ne doşanî,  
Of, vî piştîyê hanê jî  
Lap ruhê min deranî”*

*Bar avêt bi kezelik,  
Gazî kir, got: “Ya Xaliq,  
Tu ruhê min bistînî,  
Ji vî halî derînî!”*

*Got û negot ev xeber,  
Yek sekînî li hember,  
- Va, hatime, -jê re got  
Ezrahîlê Melkemot.*

*Kalê tirsîya, saw bi ser ket,  
Lê xwe wînda nekîr qet.  
- Hatî?! Belkî, got, Xwedê  
Wiha li hewara te jî bê.  
Min zehmet da te, feqet,  
Tune tiştî zor û zehmet,  
Xeyn ji van qirş û qoncan:  
Min heyrana xwe ke ca,*



*Hilde bide pišta min,  
Veger here careke din.*<sup>256</sup>

Kalemêrekî ketî ku ji rewşa xwe ya tenêfî, êxtîyarî, bêkesî û bêtaqetîyê gilîdar e, di wê kêlîyê da ku dixebite, gilî û gazindê xwe digîhîne xwedê ku ruhê wî bistîne, yekser melkemot li ber wî hazir dibe û dibêje; ove ye ez hatim te xêr e? Paşê de'wa canê wî dike, kalê ku diheyire û saw bi ser dikeve û bi hewleka qerfî li melkemot vedigerîne;

*- Hatî?! Belkî, got, Xwedê  
Wiha li hewara te jî bê.  
Min zehmet da te, feqet,  
Tune tiştî zor û zehmet,  
Xeyn ji van qirş û qoncan:  
Min heyrana xwe ke ca,  
Hilde bide pišta min,  
Veger here careke din.*

Risteyên jor ku para dawî ya helbestê ne mebesta eslî ya helbestê jî der dibin. Kalê ketî ku de'wa mirinê dikir bi hatine ezraîl ra îcar jî de'wa alîkarîyê jê dike û dixwaze ezraîl barê wî bide pišta wî, ev jî destlêdanên îmajê qerfî ne ku sewa mînakekê têra xwe heye.

### **3.9. Îmajên Erotîk**

Ji serdemên kevn heta niha mîna xwarin, vexwarin û hewînê, nêzîkatîya cînsî jî hewcehîyeka însanan e û bi vî awayî însan dibine xwedî mal û zarok û zurîyeta xwe didomînin. Ev liv û tevgera ku weke erotîzm an jî pevgihîştina seksî tê pênasekirin bi qasî dîroka mirovahîyê kevn e. Ev bêjeya erotîzmê xwe di gelek qadan da daye der, weke huner, peyker, stran, film, rism û hwd. Ev têgeha ku di gelek civat, cimaet û miqaman da bi wêrekî nehatîye behskirin û guftugokirinê, îro bi cil'eteka mezin tê behskirin û şuxilandinê. Di edebîyata devkî û nivîskî da jî vê têgehê bi rehetî ji xwe ra cih dîtîye. Li ser meseleyê Dengbêjên weke Şakiro û Reso behsa pêsîran û cotê memikan kirine, Ciwan Haco di strana xwe ya bi navê "sê, sê, sê" da bi eşkere motîfên erotîk raberî guhdêran kirîye. Îro-ro di peykerên gelek peykersazî da dewên seksuel hene, rismên gelek destnîgaran da bangawazîyên seksuel dixûyên,

---

<sup>256</sup> Ûsiv, *h.b.*, r. 98-99

helbestvan Arjen Arî bi navê “Eroutîka” pirtûkeka helbestê nivîsîye ku ev mînak yek ji hewla herî wêrek a edebîyata kurdî ya modern e. Helbet em dikarin behsa dîroka erotîzmê jî bikin lê ji ber ku îmaja erotîzmê binbeşeka piçûk a vê xebatê ye em ê tenê bi helbestan vê têgehê şîrove bikin.

*Memikêd yarê li ser bedenê cotkanî ne,  
Xalêd sûret mîna konê Kurmancî ne.*<sup>257</sup>

Her du riste ji teşbîhê dermale bûne û îmaja erotîzmê pêk anîne, helbestvanê ku memikên yarê şibandine du kanîyan, xalên li ser sûretê yarê jî şibandîye konekî. Di helbestê da daxwaz û dilnên helbestvan bi eşkere dixûyên û têgeha memikê derî li îmajeka eşkere ya erotîzmê vedike.

*Pîrmelekê vê kilamê wê li dora min hesehes e,  
Kaxiz, qelem çî ji min re ne, keçikê sîngê te kaxiz e,  
De ka ez ê bi ramûsan şî'reke xweş lê bihûnim,  
Bila cotê zermemikan wekî du kewan li ser bixwînin.*<sup>258</sup>

Eyan e ku di vê helbestê da helbestkar telebkarê sîngê jinekê ye. Helbestkar di vir da hewcehî bi kaxiz û qelemê nedîtîye û sîngê jinikê weke kaxizekî spî dîtîye û ji teşbîhê sûd wergirtîye û xwestîye bi ramûsan helbestekê li gerdena yarê binivîse ku ev di esasê xwe da dilneka seksîst e. Her wiha pêdeçûna ramûsana yarê ku ji risteya dawîyê dinizile jî derba dawî ya vê îmaja erotîzmê ye.

*Got: - Kerem bike, ca han tehm bike van sêvan!  
Min got: - Nemerd, çima nadî her du lêvan?*

- Sêvan naxwî, hinar hene, hilde bixwe!  
- Çima nadî her du hinarêd sûretê xwe?

*Got: - Dinihêrim li orta te û êmîş tune,  
Hilde loq bike vî loşî – dest avê min e.*

- Hey nanxweşê, zimanxweşê, nankirikê,  
Merd î, bide loqlewaşê wê qirikê.<sup>259</sup>

---

<sup>257</sup> Ûsiv, h.b., r. 67

<sup>258</sup> Ûsiv, h.b., r. 279

<sup>259</sup> Ûsiv, h.b., r. 280

Di helbestê da hewaya dîyalogeka ku ji hêla helbestvanî va hatîye seksîzekirin li pêş e, muxatabê helbestvan jinek e ku sêv û hinar û loqlewaşan pêşkêşî helbestvanî dike lê ji hêla helbestvanî va bi helwesteka seksuel û dilînên erotîk tê pêşwazîkirin. Helbestvan bi daxwazkirina lêv, sûret û qirika jinikê va hewayeka şehwetî li dar dixê û îmajê erotîzmê saz dike.

*“Wekî ez bê, ezîz can,  
Tu yê çî bidî ber mêvan?”  
Wextê tu jî nikarî  
Ji min re bibêjî bi dilbarî:  
“Lêvên şîrîn û şekirî,  
Sîng û berê vekirî.”<sup>260</sup>*

Helbestvan ji muxatabê xwe dipirse ku gelo ez bê tu yê weke mêvanekî çawa min bi’ezimînî û çî pêşkêşî min bikî û bêyî ku li benda bersivekê bimîne monologa xwe didomîne; haja min pê heye ku tu jî nikarî bi dilê xwe ji min ra bibêjî ku ez ê lêvên şîrîn û taxima sîng û berê xwe pêşkêşî te bikim. Helbestvan di nav vê heyfpeanînê da bi bangawazîya xwe ya seksuel îmajê erotîzmê zindî dihêle.

*Ax, min dixwest, ezîza min,  
Û gelekî, û gelekî,  
Ne ku eniya te ramûsim,  
Lê min miraz dikir, wekî*

*Demêke dirêj lêvên min bîn  
Ser lêvên te yên terreteze,  
Çawa çivîk heta sibehê  
Li ser hêlîne dimelise.<sup>261</sup>*

Wekî her tiştî di têkilîyên însanan û erotîzmê da jî qonax hene, heke em destgirtin û hemêzkirin û enîpaçkirinê weke radeya yekem bihesibînin, paçkirina lêv û sîng û memikan jî radeya duyem e, pevghihîştina temamî ya zayendî jî qonaxa dawî ya vê çalakîya erotîzmê ye. Helbestvan jî xwestîye yekser ji qonaxa yekem derbas be û xwe berî lêv û sîngê yarê bike. Dema vê yekê daxwaz dike tîrbûna erotîzmê jî eşkere dike û bi ramûsanekê qayîl nabe û dixwaze hetanî şeveqê vê kiryarê bidomîne. Hewaya erotîk û îfadeyên weke ramûsîn, terreteze, mirazkirina cendek û lêvan û ambîyansa seksuel îmajê erotîzmê saz dikin.

---

<sup>260</sup> Ûsiv, *h.b.*, r. 318

<sup>261</sup> Ûsiv, *Sûretsûfê*, r. 163

### 3.10. Îmajên Zordestî û Dijkolonyal

Kolonyalîzm îşxalkirina hebûna maddî û manevî ya serdestan e ku li ser bindest, jar û bêhêzan dikin. *Kolonyalîzm wek dagirkirin û kontrolkirina welat û malên mirovên din û destêwerdana pergala sîyasî û çandî ya welatekî ye.*<sup>262</sup>. Di temama dîroka mirovatîyê da ev têgeha zindî bûye û heta îro jî em bi vê yekê dihesin.

*Postkolonyal têgêheke dîyalektîk e ku rastîyên dîrokî yên berfireh ên dekolonîzasyonê (decolonizasyon) û serkeftinên dîyar yên desthilatîyê destnîşan dike – di heman demê de rastîyên neteweyan û merivan derdixe pêwendêke emperyalîst ya aborî û carcar hakimîyeta polîtîk.*<sup>263</sup>

Ev îmaj yek ji îmaja herî berbelaw û muxatapbîner e di helbesta Fêrîkê Ûsiv da. Hakî bîra me xurt be di helbestên ku îmaja wetenîyê va hil bûbûn da, me behsa egerên sereke ya hezkirina welêt û nerazîbûna zordestîyê ya Fêrîkê Ûsiv kiribû ku ev jî dûrî bû. Têgeha zordestîyê jî bi qasî têgeha evînê, êxtîyarîyê û erotîzmê kevn e. Ji ber ku di tebî`eta însan da lihevnekirin heye. Di serdemên ewil ên mirovatîyê da baviksalarî û mêrserwerîya mêran a li hemberî jinê bigire heta şerên modern û teknolojîk ku haveyna wan zulm û zorî ye, têgeha zordestîyê hêj berdewam e. Di dîroka şerî da miletên weke Kamboçya, Afrîka, Angola, Filîstîn, Îrlanda, Vîetnam û hwd. de`wa miletbûn û serxwebûnê kirine û gihîştine mirazê xwe û dewletên weke Îngîlîstan, Franse, Osmanî, Îspanya û Rûsyayê jî her tim zordestî kirine û îro-ro jî ji ber hin berjwendîyan çavên wan li erdên xelqê ne. Bêyî ku mijara me zêde polîtîze bibe, me xwest behsa hebûna zordestîyê ya doh û îro bikin.

Ev têgeha zordestîyê bi qasî ku di edebîyata cîhanê da heye ewqasî jî di edebîyata kurdî da heye, di êwra Hawarê da navên weke Celadet Elî Bedirxan, Kamiran Elî Bedirxan, Qedrî Can, Cegerxwîn, Osman Sebrî û Nûredîn Zaza li hemberî talangerîya li welatê xwe sekneka dekolonyal nîşan dan, di edebîyata

---

<sup>262</sup> Zülküf Ergün, *Gotara Dijkolonyal û Wêneyê Serdestîya Tirkan di Kovara Hawarê de, Tîr û Armanc*, Weşanên Peywend, Stenbol, 2014, r. 23

<sup>263</sup> R. Young, *Postcolonialism: An Historical Introduction*, Blackwell, Oxford, 2001, r. 51

modern a kurdî da jî helbestvanên weke Arjen Arî, Mem Ronga, Berken Bereh, Rojen Barnas, Ebdulla Pêşew û hwd. vebêjên vê zordestîyê bûn. Her wiha di gelek çîrokên efsanewî û destanan da jî têgeha zordestîyê û li hemberî wê jî “dijkolonyalîzm” cihekî mehkem digire.

Yek ji mînaka herî qewî ya zordestîyê Kurdistan e ku îro jî marûzî vê zordestîyê dimîne. Di tarîxa Kurdistanê da kurd her tim êşkêşê vê zulm û zorbetîyê bûne, welatê wan hatîye îşxalkirinê, mafên wan ên însanî hatine pêpeskirinê, ji aliyê dewletên dagirker va çand û zimanê wan hatine qedexekirinê û heta îro jî di wê lêgerîna mafên xwe yênsanî, nasnameyî û miletîyê da ne.

Di nava civat û miletekê da jî dengbêj, hunermend, rewşenbîr, sîyasetzan, nivîskar û helbestvanên miletekî li hemberî vê zordestî û kolonyalîzmê sekneka qewî nîşan didin û bi helwestên xwe yênsanî di berhemên xwe da li hemberî vê yekê disekin. Axir Fêrîkê Ûsiv jî yek ji wan helbestvanan e ku di helbestên wî da em leqî vê gotara dekolonyal tîn. Em ê niha lê binêrin bê ka îmajê zordestîyê di helbestên wî da çawa tê pêşîya me.

*Çi'm gur hebûne,  
Dehbeyên dupê,  
Birr kirine birine  
Qersê û Qulpê.  
Esker hebûne,  
Eskerê şulet,  
Li ser hêsûyêd hêşîn  
Lê dane xêbet.  
Carê çend mîstewr  
Standine ji şivên,  
Ji xwe re kirine  
Şiv û firavîn.  
Rêncberê çolê  
Li nava kesir, kerbê,  
Tîbûn li hêsûyan  
Şikêrandiye bi berfê –  
Çimkî co û kaniyên  
Ji hed û hesaban der  
Bûbûn xwîn û xolor,  
Avgiravêd gewr.  
Belê şer dibûn,  
Talan û tajan,*

*Co, kaniyên cenet  
Bi xwîn dikişiyân.  
Dijmin lê dida,  
Dijmin disenî,  
Ehlî li hev dida  
Har û bi bêfamî.<sup>264</sup>*

Me ev helbest bi temamî nenivîsande vê derê lê sewa ku ahenga wê û bitûnîya wê ya wateyî jî xera nebe me pareka piçûk jî hilneda. Helbestvan di vê helbestê da bi îfadeyên ku ji şerî dinizile tuvala xwe dadigire û jê tabloyeka epîk derdixe. Di helbestê da bi qasî ku fehma me têrê dike em pê derdixin ku dijminekî har hebûye ku ji xeynî ax û topraxa millet, çav berdaye mal û milk û pêzê xelqê jî, ku ji risteyên *carê çend mîstewr/Standine ji şivên* ev rastî dîyar dibe. Dijmin an jî bi gotina helbestvên *eskerê şulet* bêyî ku jê ra sekn hebe, bi vê hoveberî û zorbetîyê zirar daye xelqê û xelq xerqî meraq û mîtaleyan kirîye. Ber bi nîveka helbestê tundiya şerî tîrtir bûye. Risteyên *çimkî co û kaniyên/Ji hed û hesaban der/Bûbûn xwîn û xolor û co, kaniyên cenet/bi xwîn dikişiyân./dijmin lê dida,/dijmin disenî,/ehlî li hev dida/har û bi bêfamî* ku dawîya helbestê da cih digirin, dibin delîlên kafî yên îmajê zordestîyê.

*Cizîr û Hewlêr, Meqrûb û Şerga  
Ketin kifara zefîyan û zorgayan  
Zefîyên Ereban, Farisan, Tirkan,  
Kurdistan kirin şova li ber cotan.*

*Cot û cobarê me birin talan,  
Dezgeh, durişme, kaxêt û kilam  
Û hesab kirin em xêv û xulam,  
Beytûbeyaniyên bê nexş û nota.*

*Û sîwar dibin hê li bergîrên Kurdan,  
Ji hev birr dikin eşîrên Kurdan,  
Bedewên Kurdan, şairên Kurdan,  
Û me kifş dikin bi kevn û kotan.<sup>265</sup>*

Kurdistan welatek e ku ji hêla kolonyalîstan va ji hemû alîyan va hatîye dagirkirinê, dijminê ku çav berdaye hemû xêr û berê Kurdistanê di rewşenbîr, hunermend an jî helbestvanên kurd da hesteka postkolonyal peyda dike. Di vê

---

<sup>264</sup> Ûsiv, h.b., r. 148

<sup>265</sup> Ûsiv, h.b., r. 233

helbestê da jî helbestvan balê dikişîne ser ku Kurdistan ji hemû alîyan va ji teref dagirkerên ereb, ecem û roman va hatîye dagirkirinê û xwîn li ber wan gol kirine, ev dagirkirineka wisa ji rêzê jî nebû, ji ber ku dijmin ne tenê dest daye ser erdên kurdan, her wiha xwestîye kurdan bêsl bikin, dest bidin ser hemû hebûn û tunebûna wan a çandî, ilmî û nirxên wan ên neteweyî jî. Li ber gotinê dikeve ku meriv di vir da behs bike ku gelek stran û kilamên kurdan ên ku hatine tirkîzekirinê mînaka herî şênber a vê mijarê ye. Û dijmin kurd weke *bê'merîfet, bêsl û binyad* hesibandine. Helbestvan amaje dike ku ev texrîbat û hilweşandina wan wisa berg û mayînde bûye ku hê jî li bergîrên kurdan sîwar dibin, êl û eşîrên wan ji hev birr û koç dikin, dest daydînine ser hebûn û tunebûna wan a cuwankar û bi helwesteka nijadperest û kirêt kurdan bi cil-berg û dîmenên wan va dinirxînin. Nerazîbûna helbestvan a li hemberî vê zordestî û talanê, helwesta wî ya nîştîmanperwer di vê helbestê da îmajê zordestî û dijkolonyal pêk tîne.

*Tirk darda dike, hebisî dike har,  
Qeyd dike zar û zimanê me,  
Nav û nûçikan li me dike bê ar  
Miletçiyên van qelp î kone.*

...

*Em jî dixwazin bi cureyê xwe bijîn,  
Di welatê xwe da nemînin dîl,  
Serbest bigerin li çiyayêd xwe hêşîn,  
Parî nan bixwin bê kul, kertîl.*

*Sihabêd dinê! Bi çavê rehmê  
Mêze kin li halê milletê Kurd!  
Rênêsanseke nuh vebûya vê demê,  
Me lê hûnaye gumaneke xurt.*

*Belkî batmîş ke bi top û tifaq  
Rênêsansa nuh ber zordestiyan,  
Însaf ragirtî çawa ku beyraq –  
Pê bike hezar saliya sisiyan.<sup>266</sup>*

Di dewra ronesansê da bi bizavên netewî gelek welat ji împeratorîyên mezin veqetîyan dewlet û dezgehên xwe ava kirin û biryara qedera xwe ya dahatûyê bi xwe dan. Yên ku keysa xwe pê anîn û bi sîyaseteka baş û yekîtîyeka xurt tev gerîyan bûne xwedî dewlet, lê milletê kurd ji ber polîtîkayên şaş û rewşa xedar a wê demê negihîşte

<sup>266</sup> Ûsiv, *Êvara Zivistanê*, r. 199-200

mirazê xwe. Helbestvan jî zordestîya tirkan a li ser kurdan ku îro-ro jî bi pihêti berdewam e şermezar kirîye. Helbestvan destnîşan dike ku tirk zimanê kurdan qedexe dike û bêyî ku şermek li rûyê wan tesele bibe bi faşîstane nav û nûçikan li kurdan dike. Helbestvan dixwaze ku milletê wî bi mafên xwe yên herî însanî yanê mîna xwe bijîn, merûzî asîmîlasyonê nebin, li welatê xwe penaber nebin, bi dilê xwe li çil û çîyayên welatê xwe bigerin û bêyî ku tirs û telaşek li wan peyda bibe parîyek nan bixwin. Di risteyê sêyan da bangî welatên yekbûyî û desthil ên cîhanê dike ku êdî werine rehmê û rewşa kurdan a xedar bibînin. Helbestvan balê dikişîne ser ku milletê kurd xwe li hêvî û gumaneka xurt pêçaye û dîsa dixwaze ku ronanseska teze biqewimîya ku kurd tê da bibûna xweyî-gotin. Helbestvan di wê temenîyê da ye ku ronanseska nû biqewime û bi tank û topan ew zordestîya li dinê têk biçe. Vegotinên dij-îşxalî, destdanên demokrasîxwaz û nerazîbûna zulmê va sekneka dijkolonyal nîşan daye îmajê zordestîyê saz kirîye.

*Ey pantirkê har, beter, bêferseng,  
Ey tûr û tortê Cengiz, Têmirleng!  
Bi çi ferq dibin  
Hûn ji pêşiyêd xwe delk e însafrût?*

*Bi wê yekê?  
Wekî tîr û kevan we kiriye barûd...  
Firindeyan dajon hûn li dewsa hespan...  
Bi îzatopan qeyd dîkin destan...*

...  
*Bi talan û tûjan hûn bûne millet,  
Kîsî bedbextiya xelqêd îdalet:  
Wê mêlosa Kurd ji xwe re kir kilam,  
Hostatiya Hurum we kir birc û tam,  
Ji Fireng hilda kûltûr, edebiyat,  
Bi rindêd xelqê bedew kir nuslet.*

...  
*Miletê miqerim, wekî dixwaze  
Bi edetê xwe bistrê, bilîze,  
Bi dîn û dewlet, bi dêm û durfên xwe  
Bijî li ser erdên kal û bavên xwe.<sup>267</sup>*

Dîsa yek ji wan helbestên kerbî yên Fêrîkê Êsiv e. Di sala 1915an da kurdên êzidî tevî ermenîyan hatine nefîkirinê û di wê nefîbûnê da jî gelek însan mirin, ji

---

<sup>267</sup> Êsiv, h.b., r. 201-202



malbata Fêrîkê Ûsiv bi xwe da jî mirî çêbûn. Yanê tevî ku Fêrîkê Ûsiv li Tirkîyeyê an jî Bakurê Kurdistanê nejîya be jî ev êşa kişandîye û her tim pê hesîyaye. Îja di vê helbestê da jî helbestvan bangî tirkan dike û dibêje ey harên barbar hûn bi çi tiştê ji bav-kalên xwe Cengiz û Têmirlengên bêînsaf cuda dibin, qey ferqeka we heye ji pêşîyên we yên zalim. Di risteya duduyan da helbestvan dêhna me dide ser ku tirkan bi şîdeteka ji hed û hesaban der zilm li xakên xelqê reşandine û hukmeka kirêt domandîye. Helbestvan di nîveka helbestê da jî vegotina xwe naguherîne û bi bîra me dixwe ku tirkan bi zilm û zordestîyê û bêbextîya bêedalet xwe gîhandina qonaxa miletbûn û dewletbûnê, kilam û awazên kurdan kirine malê xwe, bi karkerî û hostatîya xelqê va birc û koçk lêkirine, ji milletên rojavayî qûçên kultur û sine'etê hilgirtine û bi jinên xerîb, zurîyet û nislê xwe bedew kirine. Di benda dawî ya helbestê da daxwaz û dilîneka netewî li dar e, helbestvan amaje dike ku kurdên ku qedîm-miletekî vê dinyayê ne dixwazin bi çand û kevneşopîya xwe va hebin, bi statûyekê li ser erdên bav-kalên xwe bi dîn û edetên xwe bijîn. Zordestî û talangerî herî zêde di benda sisêyan a helbestê da kifş dibe lê pişkên mayî yên helbestê jî bi netewperwerî û dijkolonyalîzmê va mişt e. Wekî ku di temama helbestê da jî kifş e îmajê zordestîyê hukmî helbestê dike.

*Ruhê'm heliyaye nava kilama we,  
Ey Torin-Tirkno!  
Çima Kurdistan we kir kambax e,  
Lo însafberkno!  
We Kurdistan bir, kilam jî pê re,  
Û kilama xwe pê perwede kir.<sup>268</sup>*

Helbestvan bangî netewa tirk dike; Ey tirkên bêwijdan gelo sedem çi bû ku we Kurdistan kire gola xwînê û qûç li ser qûçekê nehişt. Di risteyên dawî yên helbestê da hebûna kolonyalîzmê zehf eşkere li me' derê ye, ji ber ku helbestvan bangî tirkan dike ku wan Kurdistan talan kirin, kilam -qesta helbestvan mîrateya estetîk a netewî ye- jî pê ra birin û pê kilama xwe cebirandin. Nerazîbûna dizîya xêr û berên ser-erdî û bin-erdî ya welatê kurdan ku ji hêla tirkan va hatîye yaxmekirine meseleya eslî jî nîşan dide. Ev nerazîbûn îmajê zordestîyê û dijkolonyal raberî me dike.

---

<sup>268</sup> Ûsiv, *h.b.*, r. 313

### 3.11. Îmajên Polîtîk û Azadîyê

Ev îmaj hingî bêjî zêde ye di helbesta modern a kurdî da, ji ber ku kurd tu wextê di welatê xwe da bi dilê xwe aza û serdest nejîyane ev îmaj jî weke tiştêkî efsûnî û dûrîdest hatîye têgihîştinê, her helbestvanê kurd berhema xwe kê-m-zêde bi vê îmajê têr kirîye. Bindestîya kurdan û talangerîya dijminên wan firsend daye ku kurd vê motîfê zêde bi kar bînin û di berhemên wan da hil bibin. Di heman demê da ev motîf pir bi serkeftî jî hatîye bikaranînê, helbestvanên kurd bi sêwirandinên xurt û şayesandinên tekûz serederîya vê mijarê kirine. Her çiqas bask û bawanê mijara helbesta kurdî berfireh be jî mijara herî desthil ev îmaj e. Helbestvanên êwra Hawarê bigire heta qonaxa Tîrêjê, ji helbestvanên êwra Kafkasyayê ku ji Şikoyê Hesên, Mikaîlê Reşîd û Fêrîkê Êsivan pêk dihat, ji wir bigire heta helbestvanên weke Rênas Jîyan, Fatma Savci û Gulîzerê û heta helbesta piştî 2000an ev îmaj têra xwe revacê da bûye. Em ê jî niha dêhna xwe bidine îmajên polîtîk û azadîyê ya helbesta Fêrîkê Êsiv.

*Lê bi xwîna xwe Kurd hê av didin  
Dara azayiyê li ber dinya û alem,  
Ku bi qelbê qenc bidin gihandin  
Kurdîstana xwe – sêveke saxlem.*<sup>269</sup>

Helbestvan bi me dide zanîna ku kurd qewmekî fedakar e û sewa azadîya xwe hê jî li ber welatên dagirker li ber xwe didin û dixwazin xwe bigîhînin azadîya xwe û bi sidqê qenc dixwazin dara azadîyê ku çandine mêweyên azadîyê bide wan. Gîhandin û mezinkirina dara azadîyê û xwestina hilberîna vê darê îmajê azadîyê derxistîye holê.

*Kurd xerîbdost e,  
Kurd ji miletan ew qasî hez kiriye,  
Wekî navê wan  
Bi hewes û heyran  
Di ser zar û dilê Kurdan de dijîn,  
Gotîye Îngilîz,  
Romo û Receb,  
Kurê xwe yê ezîz  
Bi nav kiriye Ecem,  
Bi nav kiriye Ereb,*

---

<sup>269</sup> Êsiv, *Sûretsûfê*, r. 83

*Ûris û German.  
Û hela Çerkez,  
Cahûd, Emîran.*

*Kurd xerîbdost e,  
Her millet û merd  
Di ser zar û dilê kurdan de dijîn,  
Lê hene nemerda,  
Ku naxwazin Kurd  
Li erdan jî bijîn.<sup>270</sup>*

Tevî ku bi îmajaya netewî bi motîfên azadîyê dermale bibe jî, ev helbest zêdetir xwe dispêre îmajeka polîtîk, ji ber ku helbestvan dîyar dike ku kurd ewqasî qewmekî dost û cînarhewîner e ku navên weke Romo, Ereb, Ecem, Çerkez, Ûris û hwd. li zarên xwe kirine û hebûna wan qebûl kirine, di rojên teng da pişt dane wan û firaqetîyê da li ba wan bûne, li şîn û şahîya qewm û cînanan bûne, lê were bibîne keda ku kurdan sewa qewmên cînar daye badilhewa çûye û nemerdan nexwastine kurd bigîhîjine miradê xwe û bibin miletekî serbixwe. Vegotinên nerazîbûnê yên li hemberî helwesta dijminane ya cînarên kurdan îmajeka polîtîk li dar xistîye.

*Yêd ku wek pantirkên bêş û bêter  
Extiyarbir nakin me xap û xayîn.  
Zilma Helepceyê, zilma der  
Nakin bo milletê bêxweyî.*

*Û mîna Sedam bi gef û gurr  
Kaw nabe kes li diyari dinyayê,  
Ku hene tank û balafir,  
Sîleh û sincadên kîmyayê.<sup>271</sup>*

Kurd di seranserê tarîxa cîhanê da ji ber daxwazên xwe yên azadîyê û mafên xwe yên însanî leqî gelek qetlîam û tevkujîyan hatine ku, Helebçe, Gelîyê Zîlan û Dêrsim hin ji wan ên mezin in, qirkirinên weke Roboskî, Cizîr, Dîgor û hwd. jî li gorî qetlîamên jor ên berbehs hin qetlîamên piçûk ên din in. Helbestkar di wê daxwazê da ye ku welatê wan ê ku ji hêla neteweyên din va hatîye dagirkirinê rizgar bibe. Peyvên tank, balafir, sîleh, pantirk, Helepce û Sedam polîtîzasyonêka eşkere li risteyên helbestê dixê û îmajeka polîtîk pêk tê.

---

<sup>270</sup> Ûsiv, *h.b.*, r. 84

<sup>271</sup> Ûsiv, *Êvara Zivistanê*, r. 282

## ENCAM

Em lê warqilîn ku helbesta Fêrîkê Ûsiv sewa xebatên cihêreng gelekî guncav e û heta niha ji xeynî çend nivîsar û danasînan tu xebateka cidî li ser nehatîye kirinê. Helbet ev sedemên piçûk tenê kafi nebû ku meriv li ser Fêrîkê Ûsiv bixebite, bêyî ku bibe pesn, zimanê wî yê fesîh, ferhenga wî ya zindî, qalibşikên û ezberbelav, poetîkaya wî ya fireh, fehm û feraseta wî ya hewîner, mîrasa wî ya zimên ku ji nifşên pey wî û gelekên din ra maye û hostatîya wî ya di îmajan da roleka baş gêraye û em arasteyî vê biryarê kirine. Di helbesta Fêrîkê Ûsiv da metaforên xurt, qalibşikênîyeka balkêş û îmajên mehkem li dar in, vê yekê jî firsend dida me ku em îmajên helbesta Fêrîkê Ûsiv lê bikolin, analîz bikin û pê derxin bê ka îmaj di helbesta wî da bi çi rengî pêk tê.

Rabirdûyeka helbesta kurdî ya qewî heye û piştî salên dûr-dirêj hêdî hêdî bi metafor, teknîk, qalib, zanistî û hebûna helbesta modern a asofireh hesîya û nîmetên vê pêhesînê xwar û hingî bêjî di vê qadê da ji îmajan sûd wergirt. Helbestvanên kurd tevî ku di helbestên xwe da mexseda xwe rasterast dibêjin, di heman demê da serî li îmajan didin û ji hunerên edebî jî sûdê werdigirin û helbestên xwe bi sêwirandinên kûr, metafor û dûmenên xîyalî dimeyînin û îlhamê digirin. Helbesta Fêrîkê jî li ser van esasan teşe digire.

Fêrîkê Ûsiv yek ji wan kesan e ku helbesta kurdî ji qalibên berteng rizgar kirîye û bi lîrîzm û feraseta xwe ya îmajîst helbesta kurdî gîhandîye asoyên dûr ên helbestê. Ûsiv di helbesta xwe da orjînalîte hewandîye û bûye berdevkê lîrîzmeka gur. Teşbîh, îstîfare, teşxîs, tecahula arîf, îstîfham, mubalaxe, nîda hin ji wan hunerên edebî ne ku di pêkhatina helbesta wî da dixûyên. Di helbesta wî da îmaj û hêlên serdest ev in; heyata çolwarîyê, destlêdanên olî, motîfên kulturî, hestên mîletîyê, tebî'et, dijkolonyalîzm, êşên civakî, tarîx, êxtîyarî û mirin, hesreta rabirdûyê û hezkirina welatî, dûrî û negihêjî, erotîzm, sirgûn û zordestî... Ev îmajên berbehs di helbesta wî da temsîliyeteke gelekî qewî digirin. Heyata wî ya ku li gund û çolê bihûrîye keys dayê ku bibe vebêjekî yekta yê sirûştê. Ji ber ku zarotî û piranîya emre Fêrîkê Ûsiv di nav tebî'etê da derbas bûye û ev jî rê li ber vedike ku ew bibe helbestvanekî yekta ê sirûştêj, Fêrîkê edebîyata kurdî da weke helbestkarê xwezayê

tê zanînê, peyvên dibûr, qûntar, zozan, çîya, pişt, kanî, çem, guhêr û hwd. di helbesta wî da desthil in. Di helbesta wî da îmaja wetenîyê jî gelekî desthil e, nedîtina wî ya Kurdistanê û xerîbîya welêt hiştîye ku ev îmaj di helbesta wî da gelekî tîr û serkeftî be, peyvên kurd, Kurdistan, welat, dayîk, pêşmerge û navên şervan, hunermend û navdarên kurd di helbesta wî ya polîtîk da tesele dibin û rengê wetenîyê li vê yekê dixê, meseleya qebûlnekirina zordestîyê û dijkolonyalîzm du meseleyên hevpar ên helbesta wî ne ku em di temama berhemên wî da leqî vê tiştê tênê. Wî her tim zordestîya li ser kurdan a ku ji hêla dijminên kurdan va tê kirinê, rexne kirîye û li hember vê yekê sekneka mehkem nîşan daye. Mirin jî yek ji wan îmajan e ku di helbesta wî da em lê rast tên, bi taybetî nexweşî û tenêtiya salên axirîyê rêjeya îmaja mirin û tenêtiye bilind kirîye. Dîsa erotîzm yek ji wan îmajan e ku di helbesta wî da dixûyê û me bi mînakên va nîşan daye û analîza wan kirîye. Di vê xebatê da em gihîştine van encaman;

- 1- Fêrîkê Ûsiv haj bi edebîyata cîhanê hebûye û wergerên wî vê yekê dipeyitîne.
- 2- Îmajên resen ên ku di helbesta wî da tesele dibin bi me dide nîşandanê ku Fêrîk li gor heyama xwe haj bi îmajê û zanist û teknîka helbestê hebûye.
- 3- Fêrîkê Ûsiv îmajên helbesta xwe bi hesasîyeta orjînalîteyê saz kirine.
- 4- Di helbesta Fêrîkê Ûsiv da îmajên sereke îmajên evîn, wetenî û sirûştê ne.
- 5- Îmajên evîn, wetenî, derengmayîn, qerfî û sirûştê bêtir di pirtûka wî ya bi navê *Hesretdefterê* da, îmajên xerîbîyê di *Êvara Zivistanê* da, îmajên erotîk di *Sûretsûfe* û *Hesretdefterê* da, îmajên polîtîk û azadîyê û yên zordestîyê di *Êvara Zivistanê* û *Sûretsûfeyê* da, îmajên tenêti û extîyarîyê bêtir di *Sûretsûfe* û *Êvara Zivistanê* da û îmajên mirinê jî bêtir di *Sûretsûfeyê* da hene.
- 6- Di helbesta wî da devoka serhedê, dîyaframeka çoleme û muzîkalîyeka qewî heye.
- 7- Helbestên wî bi ferhengêka fireh va hatine nivîsandinê.
- 8- Fêrîkê Ûsiv kevîrekî heyatî danîye sûra helbesta modern a kurdî û sewa xebatên cihêreng guncav e.

Di vê xebatê da me îmaj û helbest da nasandinê û nîşan da ku îmaj di helbestê da çawa pêk tê, me behsa wê yekê kir ku helbestvan û teorîsyenên edebîyata dinyayê li ser têgeha îmajê çî gotine. Bêyî ku xîzmeta tekrarekê bike û bibe nivîseka dirêj a acizker em dikarin weke kurtasî bêjin ku Fêrîkê Ûsiv di lêkirina helbestên xwe da dêhna xwe dayê ku hunerên edebî bi kar bîne û sewa şayîkbûn, estetîkbûn û mayîndebûna helbesta xwe zor dayê ku ji îmajên orjînal sêd werbigire. Ji bo Fêrîkê Ûsiv helbest bûye sitargehek ku bikaribe lê bihewe û xwînerên xwe tê da bihewîne.

## ÇAVKANÎ

- Acar, Zafer: *Genç Şaire Açık Mektuplar*, yazarın kendi yayını, İstanbul, 2015
- Acun, Roger: *Îmaj di Helbesta Kurdî ya Modern de*, weşanên J&J, Dîyarbekir, 2018
- Aksan, Doğan: *Şiir Dili ve Türk Şiir Dili*, Engin Yayınları, Ankara, 2006
- Aktaş, Şerif: *Edebiyatta Üslup ve Problemleri*, Akçağ Yayınları, Ankara, 1993
- Alan, Remezan: *Bendname*, Avesta, Stenbol, 2009
- Altıok, Metin: *Şiirin İlk Atlası*, Yapı Kredi Yayınları, İstanbul, 2004
- Aragon: *Çağımızın Sanatı*, Gerçek Yayınevi, (Çeviren: Bertan Onaran), İstanbul, 1966
- Aristoteles: *Poetika*, Say Yayınları, (Eski Yunancadan Çeviren: Furkan Akderin), İstanbul, 2013
- Ayhan, Ece: *Dip Yazılar*, Yapı Kredi Yayınları, İstanbul, 1996
- Boyîk, Eskerê: *Nûra Elegezê-Çend Dîdem ji Edebyeta Kurdên Ermenistanê*, Weşanên Dengê Êzîdiyan, Oldenburg, 2004
- Boyîk, Eskerê: *Çanda Kurdên Sovêtê*, Weşanên Peywend, Çapa Duyem, 2019
- Burnett, Ron: *İmgeler Nasıl Düşünür?*, Metis Yayınları, (Çeviren: Güçsal Pusar), İstanbul, 3. Basım, 2018
- Bülbül, Melik: *İmgesel İletişim*, Çizgi Kitapevi, Konya, 2017
- Cengiz, Metin: *İmge Nedir*, Şiirden Yayıncılık, Ankara, 2014
- Çetin, Melek: *Cumhuriyet Dönemi Türk Şiirinde Gül İmgesi*, Fatih Sultan Mehmet Vakıf Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü, Yüksek Lisans Tezi, İstanbul, 2013
- Çetin, Nurullah: *Şiir Çözümleme Yöntemi*, Öncü Kitap Yayınevi, İstanbul, 2011
- Çolak, Veysel: *Şiir Nedir ve Nasıl Yazılır*, İkaros Yayınları, İstanbul, 2016
- Eagleton, Tery: *Şiir Nasıl Okunur*, Agora Kitaplığı, (Çeviren: Kaya Genç), İstanbul, 2011
- Elegez, Rizgar: *Di Helbesta Fêrikê Êsiv de Mekan: Destpêkek ji bo Helbesta Fêrikê Êsiv*, Kovara Wêje û Rexne, j.5, 2015
- Eliot, Thomas Stearns: *Edebiyat Üzerine Düşünceler*, Kültür Turizm Bakanlığı Yayınları, (Çeviren: Sevim Kantarcıoğlu), Ankara, 1983

- Ergün, Zülküf: *Gotara Dijkolonyal û Wêneyê Serdestîya Tirkan di Kovara Hawarê de, Tîr û Armanc*, Weşanên Peywend, Stenbol, 2014
- Ergün, Zülküf: *Nerî û Helbest-Nerîta Neteweyî di Helbesta Nû ya Kurdî de (1880-1970)*, Weşanên Nûbihar, Stenbol, 2017
- Eroğlu, Ebubekir: *Modern Türk Şiirinin Doğası*, Yapı Kredi Yayınları, İstanbul, 2018
- Eroğlu, İnan: *Siruşt û Fêrikê Ûsiv*, Kovara Wêje û Rexne, j. 8, 2016
- Güntan, Ahmet: *İyot*, Yapı Kredi Yayınları, İstanbul, 2006
- Hesen, Şikoyê: *Payîz û Ba*, Weşanên Avesta, Stenbol, 2008
- İlhan, Atilla: *İkinci Yeni Savaşı*, Türkiye İş Bankası Kültür Yayınları, İstanbul, 2004
- İnce, Özdemir: *Şiir ve Gerçeklik*, Türkiye İş Bankası Kültür Yayınları, İstanbul, 1. Basım, Ekim, 2001
- Kan, Güneş: *Îmaja Ermenî di Romanên Kurdî yên Sovyetê da*, Weşanên Peywend, Stenbol, 2019
- Karabulut, Mustafa: *İmge Kavramı ve Necip Fazıl Kısakürek'in Şiirlerinde İmge*, Turkish Studies-International Periodical For Languages Literature and History of Turkish or Turkic, Volume:10/4, p.603-618, Ankara, Winter 2015
- Karabulut, Mustafa: *İmge ve Cumhuriyet Dönemi Türk Şiirinde Su İmgesi*, Journal of Turkish Language and Literature, Volume:1, Issue:2, Autumn, 2015
- Koçak, Orhan: *İmgenin Halleri*, Metis Yayınları, İstanbul, 1995
- Kurt, Mustafa: *Çağdaş Türk Şiirinde Modernizmin İmgeleri*, Çolpan Kitap, Ankara, 2018
- Küçüköner, Mustafa: *İmge ve Bellek İlişkisine Bir Bakış*, Atatürk Üniversitesi Güzel Sanatlar Fakültesi dergisi, Sayı:12, 2005
- Luis Borges, Jorge: *Şu Şiir İşçiliği*, Charles Eliot Norton Konferansları (1967-1968), De Ki Basım Yayın, (Çeviren: Mukadder Erkan), Ankara, 2006
- Marin, Louis: *İmgenin İktidarları*, Dost Kitapevi, (Çeviren: Muna Cedden), Ankara, 2013
- Mayakovski, Vladimir: *Şiir Nasıl Yapılır*, (Rusçadan Çeviren: Alper Çeker), Altıkırkbeş Yayın, İstanbul, 2016
- Nadirî, Wezîrê: *Nûbar*, Weşanên Nûbihar, Stenbol, 2016



Özcan, Tarık: *Şiir Sanatında İmajın Yeri ve Bunun Cemal Süreya'nın Şiir Dünyasına Uygulanması*, Fırat Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi, Ocak, 2013

Özdenören, Rasim: *Yazı, İmge ve Gerçeklik*, İz Yayıncılık, İstanbul, 2011

Reşîd, Mîkaêlê: *We'de-Pencere-Mitale*, Weşanxaneya Belkî, Enqere, 2019

Rifat, Mehmet: *Gösterge Avcıları*, Yapı Kredi Yayınları, İstanbul, 1997

Robins, Kevin: *İmaj*, Ayrinti Yayınları, (Çeviren: Nurçay Türkoğlu), İstanbul, 2013

Sartre, Jean Paul: *İmgelem*, İthaki Yayınları, (Çeviren: Alp Tümertekin), İstanbul, 2009

Sayın, Zeynep: *İmgenin Pornografisi*, Metis Yayınları, İstanbul, Aralık, 2015

Sezer, Sennur: *Şiir Gündemi*, İnsancıl Yayınları, İstanbul, 2016

Süreya, Cemal: *Papirüs'ten Başyazılar*, Yapı Kredi Yayınları, İstanbul, 2015

Şakar, Cemal: *İmge Gerçeklik ve Kültür*, İz Yayıncılık, İstanbul, 2017

Uç, Himmet: *Ahmet Kutsi Tecer'in Şiirlerinde İmajlar*, Elektronik Sosyal Bilimler Dergisi, Bahar-sayı:12, 2015

Ûsiv, Fêrikê: *Êvara Zivistanê*, Lîs, Enqere, 2015

Ûsiv, Fêrikê: *Hesretdefter*, Lîs, Enqere, 2011

Ûsiv, Fêrikê: *Sûretsûfe*, Lîs, Enqere, 2012

Todorov, Tzveton: *Yazın Kuramı*, Yapı Kredi Yayınları, (Çeviren: Mehmet Rıfat-Sema Rıfat), İstanbul, 1995

Wellek, René -Warren, Austin: *Edebiyat Teorisi*, (Çeviren: Ö. Faruk Huyugüzel), İstanbul, Eylül, 2013

Xelîl, Têmûrê: *Ew Ji Cîhanê Bi Xeyd Çû*, Kovara Nûbihar, j. 126, 2014

Yivli, Oktay: *Ahmet Hâşim'in Poetikası*, Tohum Dergisi, İstanbul, Şubat-Mart sayısı, 2002

Young, Robert: *Postcolonialism: An Historical Introduction*, Blackwell, Oxford, 2001

<https://krd.riataza.com/2015/10/28/diroka-kilameke-welatperweriye-bi-nave-lexin-birano-lexin-2/>

[http://bnk.institutkurde.org/catalogue/detail.php?pirtuk=1394&r\\_detail=f%C3%A4r%C3%A4k](http://bnk.institutkurde.org/catalogue/detail.php?pirtuk=1394&r_detail=f%C3%A4r%C3%A4k)

[http://www.rojnameyakurdistan.com/ku/makale/Poet%3%AEkaya\\_Cih%3%AE di Hawara\\_D%3%AEcley%3%AA de](http://www.rojnameyakurdistan.com/ku/makale/Poet%3%AEkaya_Cih%3%AE_di_Hawara_D%3%AEcley%3%AA_de)

Vîdeoya belgefilma Jîyana Fêrîkê Ûsiv, Kurdistan Tv, (Arşiva Taybet)

## PÊVEK



**Wêneyê yekem:** *Mal-mûzeyaya Fêrîkê Ûsiv-Gundê Pampê (Navê niha: Sîpan) Rewan-Ermenistan-Îlon-2017-fotograf: Mem Artemêt*



**Wêneyê duyem:** *Ji dûr va Gundê Pampê-Îlon-2017-fotograf: Mem Artemêt*



**Wêneyê sêyem:** *Ji nêz va Gundê Pampê- Îlon-2017-fotograf: Mem Artemêt*



**Wêneyê çarem:** Nevîyê birayê Fêrikê Ûsiv di odeyeka mal-mûzeyaya Fêrikê Ûsiv da (navê neviyê birayê wî jî Fêrik e)-Gundê Pampê-Îlon-2017-fotograf: Mem Artemêt



**Wêneyê pêncem:** Qebriştana mala Ûsivê Îvo-Gundê Pampê-Îlon-2017-fotograf: Mem Artemêt



**Wêneyê şeşem:** Zaroyên mala Ûsiv li gund dilîzin-Gundê Pampê-Îlon-2017-fotograf: Mem Artemêt



**Wêneyê heftem:** *Dibûrên Pampê-Îlon-2017-fotograf: Mem Artemêt*





**Wêneyê heştem:** *Dibûrên Gundê Pampê ku Fêrikê Ûsiv bengîyê wan bû û li ser wan şî'r lédikirin-Îlon-2017-fotograf: Mem Artemêt*



**Wêneyê nehem:** *Berêvareka Gundê Pampê-Îlon-2017-fotograf: Mem Artemêt*



**Wêneyê dehem:** Mem Artemêt li ber mal-muzeya Fêrikê Ûsiv-Îlon-2017-fotograf: Fêrik Hemoyan



*Wêneyê yanzdehem: Mem Artemêt li ser tirba Fêrikê Ûsiv-Îlon-2017-fotograf: Fêrik Hemoyan*